# Dîdara du dildaran

Gelawêj Ewrîn

# Dîdara du dildaran

Gelawêj Ewrîn

# Dîdara du dildaran

**Gelawêj Ewrîn**

***Ev pirtûk ji aliyê rojnameya Newaya Jin vê hatiya amede kirin.***

ISBN: **978-3-945326-09-1**
**Eylül 2015**

**Herausberger:**
**Mezopotamien Verlag und Vertriebs GmbH**
**Gladbacher Str. 407 B**
**41460 Neuss/Deutschland**
**Tel.: +49 213 14069093**
**Fax: + 49 213 14029562**
**www.pirtuk.info**

***Vê pitûkê diyarî hemû şehîdên sala 2012'an dikim ku pêşengiya şerê şoreşgerî yê gel kirin!***

# PÊŞGOTİN

"Pirsgirêka nasnameyê" yek ji wan pirsgirêkên bingehîn ê serdema moderne ku mirovahî pê re rû bi rû maye û gelek caran jî di rewşekî ku nayê çareserkirin de dimîne. Gelan herdem li beranberî vê rewşê weke pêwîstiyeke polîtîk û siyasî hewil dane bi awayekî hebûna xwe biparêzin. Yek ji wan gelan jî gelê Kurd e ku dergûşek bûye ji civakbûnê re. Bênasnameyi li Kurdistanê tenê bi gel û welatekî re bi sînor nemaye. Di Kurdistanê de mirovahî bê nasname hiştine. Ji ber vê rastiya dîrokî û ewçend kûre ku ev pirsgirêk weke girêkeke kor lê hatiye.

Xweber nebûye ku Ehmedê Xanî çavkaniya çareser nekirina pirsa Kurd ji vê dibîne ku bi dirêjahiya sedê salan rêberek ji nav Kurdan derneketiye. Gazinca ji vê rastiyê zanayiyeke. Ewqas girînge ku kesên rêber, nûnertiya wê serdema civaka xwe dikin û dibin nasnameya wê serdemê. Rêber APO ev şerma dîrokî ji holê rakiriye. Ji wê ye ku kariye ji bo gelê Kurd bibe nasnameya hemû serdeman. Nûnertiya rabihorî, îro û siberoja Kurdê azad kiriye. Ji ber vê Rêbertiyê ye ku pisgirêka nasnameyê êdî li cem Kurdan nemaye.

Ger rêber nûnertiya yekbûna parçeyan dikin, pirtik û parçe jî di kesên qehreman de sembolîze dibe. Dema gel, qehremanên xwe dikin sembol, wan bi coşeke mezin di dil de dihewînin û bilind û berz dibînin, ya rast nav li xwe dikin û watedar dikin. Kesên weke Kawayê Hesinkar, Rustemê Zal, Dewrêşê Evdî û bi hezaran qehre-

manên din, heqîqeta dîrokî a gelê Kurd vedibêjin. Ev xelek bi qehremanên weke Heqî, Mezlûm, Egîd û Zîlanê û hêjî di refê tevgera azadîxwaz de bi hezaran kes, qahîm bi vê xelekê girtine. “Mirovên li ser vî axî çawa ku di berbanga mirovahiyê de jiyan bi destê xwe neqişandine, îro jî heman yekê dikin.”

Tekoşeriya PKK’ê keda destaneke ewçend bi cewhere. Rêheval Êrîş û Andok di himbêza vê destanê de mezin bûn û di refên pêş de cih girtin. Êrîş û Andok ji du ciwanan wêdetir, navê gelekî ne. Wateya nav ne tesadufek madeyê ye ne jî çarenûseke ruh e. Belkû wateya di vîna azad de hisên di dil û afirêneriya di mêjî de ye. Êrîş û Andok bi vê heqîqeta xwe ku; “Tu çiqasî yê gelekî bî, divê tu ewqas jî yê xwe bî!” careke din ji pirsên me re bûne bersiv. Ango li kêleka ku ji gelê Kurd û mirovahiyê re bi qezenc bûne, di heman demê de xwe jî afirandine.

Herçend qehremanên me yên mezin bi vî awayî bersivê didine lêpirsînên me lê hêjî em li pey bersivê digerin. Li cihê ku em li bersivan digerin çîroka wan ji me re dibe çavkaniya herî girîng ji bo peyda kirina bersiva pirsan. Divê Em rûyê xwe bi rêya ku ew tê de bihorîne, bisûn, guh bidin gotinên wan, bibin şahidê tiştên ku wan dîtine û nas kirine. Divê em bibin dengê êşên wan, bibin hevalê hezkirinên wan û kerb û kîna wan himbêz bikin. Bi kurtasî divê em bi wan re jiyan bikin. Ji ber ku ew di vê serpêhatiyê de;

Du, yek kirine
Lez bêpîvan kirine
Astengî bê wate kirine
Di an û kêliyê de rabirdû û pêşeroj jiyan kirine
Kerba gelekî
Di peyvekî de
Û kêfxweşiya gelekî
Di devbikeniyekî de bi cih kirine

Noş dermana (Êksîra) nemirtiyê vexwarine û di dawî de karîne bibin heqîqeta rêxistinbûyi û çalakbûyi.

Vêca dor ya meye...

***Tabûra Nemiran A Şehîd Zîlan***

# Du Rûbarên Herikîn Zeriyayê

Zeriya her ew gerdûne ku her kes dixwaze li kêlekê bimeşe, serî dayne ser lêmiştên jê xeyîdî û derdê wê guhdar bike. Zeriya her ew rastiye ku mirvovan di pêlên xwe yê har û serkêş de dihewîne û paşê mirov bi carekî dibe bayek tenik li ser bedena vê pêla heqîqî. Ew heqîqete Zeriya ku tu her li pey bibezî, te dibe û dibe. Carekî tu pê dihesî ku tu jî bûyî dilopek ji baranê ku di ser de têyî xarê. Zeriya bêdawiye ji bo wê jî tijeye ji hêvî, hezkirin û hestên bêdawî. Kê dil bide zeriyayê ew jî weke wê şîn, bêdawî û qeşeng dibe. Ger mirov rûbar be û ber bi zeriyayê ve were, deriyê hez û bi hevrebûnê ti caran li ser te nagire û te dike mêvanê rengê xwe yê zelal û bi efsûnî. Zeriya her rûbarekê, her rengekê û her evînekê nake mêavanê dilê xwe. Tiştên bêdawî û dilfireh di gerdûnê de nemir in. Li gel zeriyayê mirin ne bi dawî bûne, destpêk e…

Nemirtî di cewherê gerdûna me de heye. Mirovhaî ji bo ku sirrên gerdûnê kişif bikin, ewqasî di lêgera heqîqetê de ne. Gerdûn ew zeriyaye ku te li pey xwe, bi pêlên xwe, te ber bi xwe ve dikişîne...

Ew yek û komekin, belav bibûn li gerdûnê weke bi milyonan pirtikan. Û dibe jî pirtikên bêdawî bin ku em hêjî li pey sira wan in. Ew yek û komek in ji ber ku heqîqetin. Ew pirtikên bêdawîne ji ber ku di her misqaleke vê gerdûnê de azadî veşartiye. Û weke Rêber

APO jî dibêje; “armanca gerdûnê azadiye û ber bi wê ve dibeze!” weke her pirtikeke vê gerdûnê Êrîş û Andok jî ber bi azadiyê ve beziyan. Weke her pirtikekê ji bo hebin, bê tevger neman û her meşiyan. Çawa ku hemû pirtik ji bo armancekê di liv û tevgerê de ne, ew jî bêrawestan ketin ser rêya bêdawîtî û nemirtiyê. Armanca cêwiyan heqîqet bû. Ew cêwiyek ji pirek pirtikên cêwî ne!

Tu li pey diçî, bi çavên xwe dibî şahidê êş û berxwedaniya şepolan. Ya rast şer dikin li hember hemû zehmetiyên jiyanê. Bi baran, ba û peravan re şer dikin. Şerê jiyanê didin, bi hevre êşê dikşînin. bi hevre cejna gihiştina bi heqîqetê pîroz dikin. Ji bo hev dimirin, jiyan dikin û di dawî de bi hevre tama nemirtiyê ditemijin…

Û Êrîş û Andok, du rûbarên ku ber bi vê zeriyayê ve diherikin. Yek ji wan evîndarane ku dil dane zeriyayê, heqîqetê. Erê we rast bihîst, yekin, dema digihêjin zeriyaê. Di zeriyayê de ez û tu tineye. ji bo wê jî mirov qet şaş namîne dema gelek kes li wêneyên wan temaşe dikin, wer difikirin ku yek kesin. Ya rast tabloya wêneyên wan îfadeya bi hevre bûna zeriya û rûbaran, zeriya û baranê, zeriya û bayê ye. Wan di tabloya wêneyên xwe de jî li kêleka hemû pirrengiyan, li hev kirine û di dawî de rengek neqişandine. Çawa ku zeriya her şîne li kêleka hemû rengên din!

Di wêneyên wan de yêkîtiya fikir û raman heye. Yek xeyal di ezmanê wêneyê wan de xûya dike. di wêneyê wan de rêyek heye ku tê de derbas dibin. wêneyên zindî ku qet kevin nabin, weke ku ne wêneye û ne jî dîmene, zindî li ber çavan jiyan dike. çi heyecanek di dil de serî radike! Di wan wêneyan de nirxên ku dizên malê bi hezarê salan ji me dizîne û talan kirine, li me vedigerînin û me vedixwînin. Di wêneyên wan de rengê azadiyê hatiye neqişandin. di wêneyê wan de dengê heqîqetê tê ber guhê mirov û bê hemdê mirov navê heqîqetê li ser lêvan diherike. Ji ber ku ev tablo û wêne, wêneyê nemirtiyê ye. Wêneyên zeriyayek bêdawî û nemir…

Xeyalên wan jî cêwî bûn ji ber ku di dawiya heman xeyalên pîroz de gihêştin hev û meşiyan. Hêviyên wan cêwî bûn ji ber ku herdû bi hevre li baskê hêviyan siwar bûn, firiyan û ber bi daxwazên xwe ve çûn. Cêwiyên serkeftinekî bûn ji ber ku dema pişt dabûn Zagros û Andokan, bi hêviya serkeftinê destê xwe ji bilindahiya wan re he-

jandibûn û dûr ketibûn. Cêwiyên jiyanekî bûn ji ber ku bi hevre ji bo azadiya vê jiyanê şer dikirin. Ew wêneyek di sînga aveke zelal de bûn ku bi hevre dikeniyan, bi jiyanê re dikeniyan.

Cêwiyên nemirtiyê bûn. Bê hev nedibûn. Bi hevre ew jiyan nemir dikirin. Bi hev re gihayê nemirtiyê xwaribûn û siya mirina sedê salan li ser Andok û Zagrosan bi aliyekî ve dabûn. Bi hilma nemirtiyê bablîsok li welatê neyaran rakiribûn û ew tar û mar kiribûn. Erê! tenê bi hilmekî tofan ji wan rakiribûn. Çawa ku zeriya tofanî dibû… û kor kirin çavê mirinê,  rûbarên ku di zeriyaê de bûne taseke ava sar ji şewata dilê Kurdan re!

# Xeyalên Zaroktiyê

Dilê zarokên hejar! Dikim di dilê wan de hêlîn çêkim û bibim mêhvanê xeyalên wan. Bi heyrana we me, ka carekî vegerin û rondikên li ser hinarokên xwe bi pişta destê qelişî bidin aliyekî, bila çavên we yên reşbelekî û awirên tije gotin bibînim. Dizanim awirên we êşek di xwe de hewandiye, bêdeng û melûle weke dengê bilûra li ser lêva şivanek evîndar. Dizanim awirên we zehmetiyên negotî di kortika çavên we de veşartiye ew jî gelekî bi kûrahî, ji nişkave çîkekî dixe dil, bêhnê diçikîne û qet te nezanî çawa û çima wer bû. Dilêêê, Dilooooo awirên çavên bi girî gelekî bi nazenînî vê zorahiyê vedibêje.

Awirên zarokek hejar! ew zarok li ber dîwarekî rûniştiye, fanoreyek sorî kevin û peritî li xwe kiriye û naneke hişk di destan de, hewil dide bi didanên xwe yên biçûk ku yên pêşî du kit ji wan kême, heta ku hinekî zikê xwe yê birçî têr bike, pêre mijûl dibe. Êdî westiyaye ji wê rewşê. Di vê navberê de dengê dayika wî tê, “kurê min were malê, êdî derenge!” çawa wê gotinê dibihîze, hema bi lez bi wan gavên biçûk heta jê tê dibeze û xwe li deriyê malê yê texte dide û dikeve hundir. Dema dikeve hundir herkes şaş û matmayî wî mêze dikin, weke ku dixwaze tiştekî ji wan re bêje. Dema ew jî dibîne hemû şaş û maşo lê dinêrin, hinekî şerim dike û lastikiyê kevne di

lingê xwe de ku kitek sor û kitek şîn bû bi aliyekî ve davêje û dibeze di koşa diya xwe de rûdinê. Dayika wî destê xwe li serê wî digerîne, bi desmala ku li ser milê wî ve sincaq kiriye, pozê wî paqij dike. ew jî bi destê xwe hewil dide di bin wê zexta li ser pozê xwe yê biçûk de derbikeve û serê xwe dizivirîne aliyekî din. Dayika wî axînekî dikşîne,  hêdîka destê xwe li ser porên wî yên reş û narîn ve dibe û tîne, di ber xwe de hinek ayetên Quranê dixwine û herî dawî dengê wê derdikeve, “ez bi gorî, xwedê karê misilmana tev çêke, yê me jî têde!” Ew qet nizane dayê behsa çi dike. lê êdî fêrî wan duayên dayika xwe bûye. Serê xwe radike û di bin çavan de li dayika xwe dinêre, tifa xwe dadiqurtîne û dibêje; “dayê tê îşev kîjan çîrokê min re bêjî? Te şevê din çîroka gur û berxikan nêvî de hişt.”

•Na kurê min, te xew kir, haya te jê nebû min heta dawiyê got û sêva sor jî ber Çîçekê ket! Ji ber ku ew heta dawiyê şiyar bû.

Di bin çavan de li xwîşka xwe Çîçekê dinêre weke ku jê re bêje, sêva sor îşev ya mine. Hema cihê xwe di koşa diya xwe de xweş dike û li benda çîrokek nû, li çavên dayika xwe temaşe dike. Dayik dîsa keserek kûr ji dil dikşîne û dest bi çîrokê dike;

“Sal 1986 bû, ji ber zilm û zextên dewleta zalim a Tirk ji Hezoyê koçberî navçeya Amed, Farqînê dibin. di warê aborî de bi zehmetî debara xwe ya rojane dikirin. Ji xwe jendermeyên Tirk bavê malê bêpirs û îfade rojê çend caran bi darê zorê ji malê derdixistin û dibirin qereqolê û heta ku ji hal bikeve lêdidan û berdidan. Bavê perîşan ber bi êvarê dîsa vedigeriya malê û li ber çavên beloqî ên zarokên xwe ku şaş û matmayî bavê xwe temaşe dikirin, hema bêdeng xwe disparte lihêf û doşeka xwe ya pînekirî û heta sibê bi xwe nedihesiya.

Şeveke ji wan şevan dema bav tê malê dibîne dengê qêrîn û nalenalê ji mala wan tê, hema bi lez dikeve hundir lê çend jinên ku li ber derî sekinîne nahêlin ew biçe jor, jinek ku laçika xwe ya gulgulî dora devê xwe girêdaye hêdîka jê re dibêje; “xwedê kurek daye te, îşev here mala me bimîne heta sibê”. Ji ber wê gotinê hema bêje êşa xwe ya ji şikencê ji bîra dike û bi lez di tariya şevê de ji wir dûr dikeve. Gotina jina cîran weke bayekî di guhê wî de fûriniyê dike “xwedê kurek daye te!”. “lo lawo tu jî bixêr hatî, lê dizanim tê her rojekî gazincan ji me bikî ku; “çima we ez anîme dinê”. hinekî di cihê xwe de disekine, “rast dibêje!” li ber çirûskên ronahiyê ku ji pencereyên malan dikin dilê tarîtiyê bi-

qelişînin, bi zehmetî gavên xwe lez lez davêje û hema ji xwe re diçe. Ling wî ber bi kuve dibe, yan jî xeyal wî bi kîjan alî ve dibe, qet nizane, tenê dizane bê vîna xwe dimeşe û pêşde diçe. Serê wî gelek tevlîhev bûye. Nizane bi halê xwe bikene yan bigirî. Ya baş buxçika xemên xwe bavêje pişta xwe û bi xwe re bigerîne, belkî di rêyekî de rastî hekîmekî were û çare jê re bibîne…”

Dema dayê vê gotinê dibêje, girî di qirikê de girê dimîne û bi goşeya laçika xwe rondikên li ser hinarokên xwe paqij dike û li rûyê kurê xwe temaşe dike. “Remezan” çavên xwe daniye ser hev û mijangên wî yên dirêj rûçikên wî tije kiriye. Hema bi îşaret ji Çîçekê re dibêje ku cihê wî dayne…

Remezan serê sibê zû bi qelebalxtiya xwîşk û birayên xwe ji xewê divecinîqe. “dadê Qudret hat, dadê Qudret hat!” vê gotinê dibihîze nabihîze, hêşta xew di çavan de, direve derve. Xew nedîtiye, dadê Qudret hatiye û misoger ji wan re mewûj û hêjîr aniye. Dadê Qudret dayika diya wane, qet nebe heftiyê carekî tê mala wan û hema çi tiştî li mala xwe bibîne yan li ber destê wê bikeve, radike û ji neviyên xwe re tîne. Jinek li ser xwe û jêhatiye. Her çiqas li ber êş û derdê dinê qermiçokên li ser rûyên wê zêde jî bibin, lê qet tiştek ji wê bedewiya bejin û balê wenda nekiriye. Êşa cegerê ew nexistiye berovajî derd û kulan ew li ser piyan hiştiye û bihêztir bûye. Li ber singa wê jî du kevok firiyane û tevlî karwanên şehîdan bûne. Dema Remezan û neviyên wê yên din pirsa herdu xalên xwe jê dikin, ji bo ku neviyên wê nizanibin ku digrî hema bi nîvkenekî lêvên xwe gez dike û dibêje; “ew jî weke hezaran zarê xelkê!”

Dapîra wan wê şevê li mala wan dimîne. Dema xewê herkes li ser vê yekê ku kê li kêleka dadê Qudret razê, bi hevre şer dikin. Remezan yê herî biçûke, lewra qet pêwîstî nabîne ku bi kesî re şer bike, Ji ber ku bixwe baş dizane ku cihê wî tam li kêleka dadê ye. Her kes cihê xwe li ser banê malê radixin û amadekariyê xewê dikin. Dema xwe dirêj dikin, çavên herkesî ji zêdebûna singa ezmanan ji stêrkan şaş dimîne. Ji wan re wer tê ku îşev stêrk gelekî zêde bûne. Ji xwe biçûk û mezin, hemû xwedî stêrkekî ne. Dibe ku yên mezin behs nekin lê sirra stêrka xwe di dilê xwe de dihêlin. Remezan gelekî biçûke, 3-4 saliye, Lê wî jî dil daye ezmanan û ji xwe re stêrkek hil-

bijartiye. Dema li stêrka xwe dinêre di nava heyecan û şaşmayinê de diçe û tê, bi destê xwe yê biçûk bi milê fîstanê dadê Qudret digire û bi wê zimanê xwe yê şirîn dibêje; "dadê, dadê stêlka min mêzeke, îşev pil mejin bûye, mêzekê, mêzekê, çawa dibiliqe!" dadê Qudret wan tiliyên biçûk digire nav desten xwe û maç dike û dibêje;

•Kurê min! Ew ji te re mizginiyekî tîne. Gelo dixwaze mizginiya çi bide te?

•Nizanim dadê! Û dema baş li ezmanan temaşe dike, stêrkek ber bi stêrka wî ve tê.

Gelekî bi heyecan dibe û hema radibe ser xwe û li ser doşeka dapîra xwe, xwe hildide û li erdê dide. Weke ku ew stêrk ber bi wî ve tê. Dadê Qudret şaş dimîne û radibe nav cihên xwe de rûdinê û dibêje; "lawo çibû ji te, xêre?" lê Remezan qet nizane di cihê xwe de bisekine, herkes serê xwe di bin lihêfa xwe de derdixe û li wî temaşe dikin. Di milekê de dikenin û di milekê de jî şaş dimînin ji van tevgerên Remezanê biçûk. Dadê Qudret wî dîsa tîne nav cihan de bi cih dike û lihêfa wî davêje ser û bi ken jê re dibêje;

•Tu zanî ev stêrka bext û nesîbê teye. Cêwiyê çarenûsa teye!"

•Ê başe çima nayê gel min?

•Hêşta nû bûye, wê rojekî were …!

Û ew şev bû ku Zagrosan ji çiyayê Andok re miziginiyek dianî. Remezan wê şevê niqutîbû dilê wî yê biçûk. Bayê Andokan rûçikên wî dinazîne û dike maçekî li wan mijangên reş bide. Çavên xwe digire û xwe dispêre destê wê bayê. Dil dibêje ev ba ji wî re gotinek aniye ku gelekî dişibe mizginiya stêrka wî. Dibe ku heman qasidin û heman peyamê jê re tînin. Ji wê şevê ve êdî xwe bi tenê his nedikir. Gotina dadê Qudretê rast bû, êdî hertim li kêleka wî cêwiyek wî hebû ku qet nedixwestin ji hev veqetin. Erê ew şev, şeva li dayikbûna "Cengîz" bû û wext sala 1988…

Xwedawendên Zagrosan li pey hev rêz girtibûn û dikirin vî lawikî bi nazdarî li ser destê xwe bigerînin û bilind bikin. Da ku serê wî beriya her kesî bigihêje bilindahiya bejna Zagrosan û beriya her kesî ava teberik ya ku xwe ji bejna Çarçêla berdide jêr vexwe.

Dayika wî bi caran di bêdengiya şevê de xwe avêtibû ber bextê xwedawendan ji bo ku jê re lawikekî bibexşînin û xwedawendan jî

dilê wê nehêlabûn û mirada jina ciwan hasil kiribûn. Ew emaneteke serbilind û asî di quntara çiyayên pîroz de, kesek bi hêsanî nedigihêştê. Çavşîna ji stûyê Gola Satê vekiribûn û li ser eniya wî de berdabûn. Da ku kes vî lawikî çavînî neke. Erê lawo, te ava berfa Zagrosan vexwaribû. Ji wê bû ku tu ewqas bedew bûyî. Dibêjin Zuleyxayên li ser textên jor rûniştine, dema Yusif li ber wan de dibihore ji dîtina bedewiya wî destê xwe dibirin lê qet pênahesin. Kes nizane van xwedawendan çend Yûsifên weke wî li ber singa xwe mezin kirine. Kes nizane, şahidê wan tenê ew çiyayên serberzin. Yên ku dil dane wan çiyayan û bûne evîndar tenê dikarin ji van siran hayedar bibin.

* * *

Sala ku Cengîz li dayik dibe, hema li kêleka wan wêdetirî sînoran bi hezaran zarokên weke wî hêj di pêçeka xwe de ji bêhna sêvên jehrkirî, serê xwe daydinin ser singê dayika xwe û devê wan di memikê dayika wan de hişk dibe, bi vî awayî hêj tama jiyanê nezanîne, bi mirinê re aşina dibin. Li aliyê din ê sînorên lêkirî û derewîn Helepçe dişewitî û li vî milî jî Zagrosan barana hewarê dikir jê re bigihîne. Cengîz bi wan çavên xwe yê gurover û rûçikên çûr ji xwe re li hêrs û kîna Zagrosan temaşe dikir. Dilê wî yê biçûk hêj di famkirina rastiyê de zehmetî dikişand. Lê di dilan de her êşek hebû ku dema mezin bû, ev êş baş nas kir. Ji wê rojê ve bû ku bayê tolhildana ku ji Zagrosan dihat û xwe li landika wî dialand û ew bûyer bi dizîka di guhê wî de dixwand, da ku neyar pênehesin. Beriya ku dayika wî navê wî di guhê wî de bixwîne, jê re behsa serpêhatiyên bi êş yên vî welatî dikir.

Di her bihosteke vî welatî de, li ser her kevir, gul, dar û zinarekî xwîna sor bi cih maye. Hêjî şopa lingê hespên dagirkeran li ser axa vî welatî bi cih maye. Hêj dewsa potînên mêtîngerên welatên ku tav jê naçe ava, li ser sînga vê axê maye. Hêj tirsa hilweşîn û wêraniyê di kunên dîwarên vî welatî de bi cih maye. Hêj dengê sêwiyên di dergûşa xwe de bi tenê mayî, ji nav newalên kûr û bêser û binî de dernakeve. Hêj morîkên bi ser landikên wan ve dardakirî, ji xwe re diheje û şîna xwediyê xwe dike. hêj rengê rondikan li ser qermiçokên

rûçikên dayikên êş kişandî, vedibêje serpêhatiyên vî welatî.

Kurdistan welatek tije ji van serpêhatiyên negotî. Gelek bahoz lê qewimîne lê hêjî weke dara çinarê li berxwe dide. Gelek xwîn rijandiye lê gulên sor bi serbilindî di singa xwe de şîn daye. Gelek caran dagir û ji hev parçe kirine û belav kirine lê her weke xwe bêsînore dilê mirovên wê. Tirsa mirinê di keziyên jinên berxwedêr de ku xwe ji zinaran avêtine, di avên mezin de bi rûde çûye. Kelehên bilind hilweşiyane lê dîsa kevirên berxwedaniyê bi ser hev de dane, ji rika neyaran. Û rondikên dayikên vî welatî dilop dilop bûye derya û îro zilma mêtîngeran tê de dixeniqe.

Dayika Cengîz çavên wî tije girî bibû û bi dengekî nizim wuha jê re dilorand;

Laye laye kurê min,
Îşev razê dilê min,
Bila xew ji çavên te nereve çavê min,
Welat di bin destê leşker û cendermeyan
Talan dikin gund û mezrayan
Bavê te çû hewara şervanan
Şehîd hene li jor baniyan
Li Cîlo û Çarçêlan
Razê kurê min razê Cengîzê min
Îro dora wane sibê dora teye şervanê min…

Cengîz bi xew re çûbû. Dayika wî hêdîka destê xwe li bin serê wî dikşîne û li ber ronahiya fanûsê li rûçikên sipî temaşe dike. porên zêrîn xwe li ser eniyê ve berdaye û bedewiya wî hezar carî zêdetir kiriye. Ji xwe re wuha dibêje; “ya xaliqê min te ev mexlûq çend bedew afirandiye!”. Qet dil nade çavên xwe li ser rake. Lê pêwîste rabe û gelek karên wê hene. Laçikek sipî bi aramî davêje ser rûyê wî û hêdîka dûr dikeve…

* * *

Li ser wan rojan ve 4 sal derbas bûye, Cengîz jî lawikek çar salî, gelekî dûr ji Remezan li bajarê Geverê, bê xeber ji hev û çarenûsa ku li benda wan bû...

Êdî Remezan mezin bûye, heft saliye û dem hatiye ku biçe dibis-

tanê. Rojeke payîzê serê sibê dema bi zarokan re ji xwe re dileyîzin, ji dûr ve du kesên ku qet cilên wan nedişibiya mêrên gund ber bi mala wan ve tên. Cilên li ser wan û çentikên di destê wan de ji dûrve gazî dikir ku ew ne ji vî gundî ne. Xerîbin. Hema ji tirsa direve malê û gazî dayika xwe dike. Xwe li pişt fîstanê dayika xwe vedişêre. Weke ku ew der cihê herî bi ewleye ji bo wî. Ji tirsan, dengê gupe gupa dilê xwe dibihîze. Ew kesên xerîb nêz dibin û silav didin. Ji wan yek destê xwe dirêjî wî dike lê Remezan hema serê xwe li dayê fîstanê dayika xwe dialîne û nahêle ku ew kes destê xwe bide serê wî. Ji xwêdanê bûye av. Bixwe jî nizane çima ewqas ditirse. Bi dizîka li ber fîstanê dayika xwe li wan herdûyan mêze dike. Hinek tiştan ji dayika wî re dibêjin lê qet tiştekî ji wan fam nake. Gelo ev bi çi zimanî diaxivin? Diyare ku dayika wî jî zêde tiştekî ji wan fêm nake. Bi Tirkiyeke şikestî ji wan re dibêje; “temam, babasi evde degil, gelse ben ona söyliyeceğim!”. Bi van gotinan ew herdû li wir dûr dikevin. Remezan çawa dibîne ku ew diçin nefeseke kûr dikşîne û hema li pey dayika xwe direve û dixwaze bizane ka ew kê bûn û çi dixwestin. Ew wer difirkire ku dîsa hinek hatine û wê bavê wî bibin. dema ji dayika xwe dipirse, dayika wî dibêje; “kurê min ew mamosteyê te bûn, pêwîste bavê te sibê te bibe dibistanê û navê te qeyd bike!”.

Wê şevê qet xew nekete çavên wî. Xwe di nav livînên xwe de virde wêde dikir. Hema bi banga dîkê sibê radibe û diçe ser avê û dest û rûyê xwe dişo. Hesteke gelekî ecêb jiyan dike. Hem bi heyecane û hem jî ditirse. Lê herî zêde tirsek mezin di dilê wî de ye ku wê paşê bi derbasbûna salan re maf bide wê tirsa destpêkê. Wê cara yekê fêrî alfebaya Tirkbûnê bibûya. Ji ber ku herkesî jê re digot tê bibî mirovê mezin, dilê wan nedişkand û dixwest hestên xwe yê destpêkê hinekî bêdeng bike. Baş dizanîbû ku ew hest ticaran sar nabin. Ti kesî nediwêrî jê re rastiyê bêje, tenê ew hestên zelal ên zarokatiyê, her roj li ber guhê wî rastî jê re dûbare dikir. Tenê hestên wî derew nedikirin.  Lê ji bo ku dilê malbatê xweş bike, neçar bû wan hest û nakokiyên xwe veşêre. Ya rast serê her sibeyan bêdilê xwe ber bi dibistana asîmîlasyonê ve diçû. Bi caran di rêka hatin û çûyîna dibistanê de poşman dibû. Lê ev jî baş dizanibû, ger neçe dibistanê jî, wê herkesê jê re bêje; “te nexwendiye, tu nezanî û tûyê nebî mirovê mezin”. Êdî ji van gotinan westiyabû.

Hema di wan salan de bûyerek qewimî ku wê Remezanê biçûk ticaran ew ji bîr nekira. Berê neditirsiya lê êdî newêribû bi tenê derketa derve. Ji ber ku di welatek wusa de dijiya ku weke her zarokekî nedikarî şevê û heta bi roj jî derbikeve derve. Ewlekariya canê kesî nebû. Di navbera salên 92 û 95 an de şerê li Kurdistanê gihiştibû asta herî jor. Zilm û zoriya dagirkeran bê hed û hesab bû. Şevekî Remzanê biçûk û malbata wî ji dengê guleyan qet ranezan. Dibêjin ku li dora navçeyê Heval bi leşkeran re şer dikin. Ev pevçûn bi rojan berdewam dike. Remezan ew hemû nas dikirin. Xeber hat ku rêheval Hadî, Feremez, Nazmî û Wedat şehîd bûne. Lê dehakên birçiyê xwîna Kurdan tenê bi vê yekê têr nebibûn. Pêwîst bû kîna xwe ya li hember wan bi awayekî vala bikin. Ew ji mirovbûna xwe derketibûn. Ji bo wan kuştina Kurdan weke ku taseke ava sar berdin ser hinavên xwe, ewqas hêsan û xweş bû!

Mêjiyê serê hevalan yek bi yek derdixin û paşê di nava tavê de sor dikin. Ango mêjiyê wan qelandibûn. Ev bûyer di jiyana Remezanê biçûk de weke birînekî ku qet wê baş nebe, ji xwe re her roj hundirê wî dixwar. Piştî wê bûyerê êdî weke berê xwarin di qirikê de nediçû xarê. Dema li ser sufreyê rûdinişt weke ku serê wan hevalan li pêş wî danîne, dilê wî nediçû xwarinê. Kes pênedizaniya bê ka çima Remezan ew çend bê îştiha bûye. Di nava ewçend derd û êşên kûr de êdî bav û dayika wî jî xwe ji bîr dikirin ku bi rewşa kurê xwe bihesin. Piştî wê bûyerê di xewê de qîr dikir, dayika wî çend caran ew bire ser şêx û seyîdan û nivişt jê re çêkirin. Li ser dua xwendin lê şêx û melayan jî nezanîn derdê vî lawikî.

Ya rast ji bo Remezan qelandina mêjiyê hevalan dihate wê wateyê ku ev dijmin dixwaze fikir, mêjî û ruhê azad li ser vî axî biqelîne û ji holê rabike. Di milekî de di dibistanên xwe de mêjiyê zarokên Kurdan bi perwerdeya xwe dişûştin û Kurdbûna wan bi wan didane ji bîr kirin. Di milê din de jî di şer de mêjiyê zarokên Kurdan bi fîzîkî diqelandin. di navbera van herdû siyasetan de ti cudahî nebû. Herdû jî îfadeya hişmendiya îmha û înkarê bû. Tenê kirasê wan hatibû guhertin! Yek mamosteyê baş bû ku destê xwe li ser serê wan digerand, yek jî leşkerek bêrehim û dilkevir bû ku mirov dikuşt. Yekê bi pembo serê te jê dikir û yê din jî bi kêrê!...

Jor…

Ew li taxa Fevzî Çakmakê rûdiniştin, taxeke li bajarê Farqînê. Hertim di demsala havînê de piraniya malbat û cîranên wan ji bo ser erdê xwe kar bikin diçûn gundên xwe û hinekan jî ji neçarî berê xwe didan metrepolan da ku bi heqdestiyeke kêm be jî debara mala xwe bikin. Dema betlaneya dibistanê bû. ji bo Remezan firsendek herî baş bû ji bo ku hevalên taxê li dora xwe kom bike û bi wan re biaxive. dema diaxivî hemû hevalên wî devê wan vekirî dima û tenê ji xwe re li wî temaşe dikirin. Wexta diaxive di wê navberê de hevalekî wî pirsa du keçapên ku li taxa wan jiyan dikirin, dike. Remezan hema tiliya xwe ya îşaretê dibe ber devê xwe û ji hevalê xwe dixwaze ku hinekî dengê xwe kêm bike.  Ne ew hevalê wî û ne jî kesên din fêm dikin ka mesele çiye. Ji bo wê jî weke her car hemû bi çavên bendewar li Remezan temaşe dikin ku bersiva pirsên ku di serê wan de çêbûye bide. Hinek li derdora xwe mêze dike, bawer dike ku kesek tine, dibêje. “ew heval çûne Jor!”. Bi vê gotinê re hevalek wan ku temenê wî ji hemiyan kêmtir bû. gelekî ji xwe bawer, herdû destê xwe dide navtenga xwe û ji Remezan dipirse; “kuro! Tu behsa metrepolan dikî, haaahaaahaaa… îjar tu çima hêdî dibêjî, yên me hemû çûne wir!” Mihemed ku hinekî mesele fam kiriye, biriyên xwe tevlîhev dike û bi rûtirşî dizivire û dibêje; “lawo te dîsa fam nekir, hinekî wê qafê xwe yê mezin bikar bîne, dibe baştir bibe” û herkes bi hevre dikenin…

Dema berê xwe da çiyayên Andok, peyva “Jor” ji bo wî ewqas watedar bibû, weke ku ew gotin jê re baskekî ji qasidokên payîzan çêbike lê siwar dibe û ew jî weke wan herdû keçapan pişta xwe dide heybeta bejna çiyan. Hêj negihêştibû wir, bêhemdê wî ev rêzik li ser lêvan diherikî:

•Hestên tolhildanê min ber bi te ve dikşîne, çiyayên min! Bêhna min diçike û êdî ber bi te ve têm, têm ku bi çeka teya pîroz tola hezarê salan ji çavsorên dîroka bi qehir bigirim. Û ber bi te ve têm buharekî beriya neyar bigihêjin rendewiya kemîna tine û xilasiya me. Kîna min ya ji wan ez ber bi Rêzanbûnê ve anîm! Ez têniyê hevaltiyek rast bûm. Hatim da ku ava hevaltiyê weke ava kewserê li ser hinavên xwe de berdim…

* * *

Sal dibihorin û Cengîz her roj mezintir û xweşiktir dibe. Her kes bi tiliyan wî nîşanî hevûdû didin. Hinek keçên meheleya wan bi zanebûn di sûkê de rêka xwe dizivirînin, tenê ji bo li ber wî de derbas bibin û lê temaşe bikin. Belkî dil birevînin. Lê Cengîz herçend vê yekê baş fam dike, qet xwe serve nabe, ji ber ku hinekî jî şermokeye, hema rêka xwe diguherîne û bi lez xwe digihîne malê. Tenê dizane dema ku li ber dikaneke ku çend metreyan nêzî mala wane ve derbas dibe, dilê wî hema bêhemdê wî gupe gupê dike û rengê wî soro moro dibe. keça cîranê wan li kêleka bavê xwe li pişt qaseyê rûniştiye û serê xwe xistiye ber xwe û bi tiştekî re mijûl dibe. Her cara ku di ber dikanê ve derbas dibe, xwedê xwedêya wî ye ku keçik serê xwe rake û carekî jî bibe awirên wan bi hevre asê bimîne. Bi xwe jî nedizanî ev çi rewşe û wê ber bi ku ve biçe. Gelo wê ev yek çi binav bikira? ji zarokatiya xwe heya niha vê keçê dinase lê qet newêrîbûye rojekî tiştên dilê xwe jê re bêje. Ji bo wê jî hema wusa hiştibû û qet nav lê nekiribû. Dibe ku wusa difikirî ger nav lê bêkira, êdî bêwate û sar bibe. Gelek tiştên din jî hebûn ku bibe sedem ew bi guman nêzî vê hestê xwe bibe.

Di wan deman de hem dilê wî dikeliya û hem jî germahiya tekoşîn û serhildanê tevahiya welat dikeland. Peyvên weke, serhildan, şer, kuştin, şehadet rojekî tineye ku nebihîze. Ew jî weke Remezan navê xwe li dibistana dagirkeran bê dilê xwe qeyd kiriye. Wê çawa fêrî zimanê wan bibe. Bi dizîka vê pirsê ji xwe dike; “bi rastî çima dersên me ne bi Kurdîne?!”. Ji neçarî ber bi dibistanên asîmîlasyonan ve gav davêje. Dema bi xwe dihese, dibîne ku êdî Kurdî pir kêm diaxive. Carnan dema bi dayika xwe re bi Kurdî diaxive, dayika wî jê re dibêje; “kurê min hema tu neaxivî baştire, te hetka Kurdî bir!”. Ev gotina dayika wî gelekî zora wî diçe. Hema rûyê xwe tirş dike û derdikeve derve. Dayika wî jî li pey gazî dike û bi henekî dibêje; “ma kurê min, çima tu diqehirî, te Kurdî ji bîr kiriye ê!”…

Ji mal derdikeve û bi lez ber bi mala Egîd ve diçe. Ew û Egîd zarokên yek taxê ne. zarokên yek malbatê ne. kurapê hev in. Hema hinekî dilê wî bigirta diçû gel Egîd yan jî hevalekî xwe yê din. dîwarên mala wan yeke. Ji xwe hebûna wê dîwarê jî ji bo wan pir girîng nîne.

Ji ber ku rojê çend caran xwe li ser wê dîwarê ve davêjin û wusa diçin mala hev. Êdî kevirên di singa dîwar de jî ji destê wan zarê dike û kêm maye hilweşe. Û her carê jî dayikên wan neçar dimînin ji wan re bêjin: "ma kurê min deriyê vê malê heye, hûn çima bi ser dîwar ve tên û diçin?" herdû weke ku qet behsa wan nayê kirin, li hev mêze dikin û pişta xwe didin diya xwe û dîsa diçin ku li cihek din nedebitiyan bikin! Xwezî xweziya wane ku rojekî bavê wan bê û bêje ku emê dîwarê di vê navberê de rabikin. Bêguman tiştek wusa nedibû. Tenê ew xeyalên wan yê zarokatiyê bû. Dibe ku ew taaa ji wê demê ve peyva sînoran nas kiribin. Lê hertim henekê xwe pê dikin û rojê çend caran bê ku ti astengiyan nas bikin, wan sînoran derbas dikin. Ruhê azad di mirovan de bi sînorên lêkirî û dîwarên çend metreyî ve nayê dîl girtin, dibe ku rojekî ji vê ezmûna zehmet bibihorin, belkî jî proveya wê dikirin.

Herdû li kêleka hev ber bi saha Cengo ve dimeşin. Saheyek gelekî mezin bû ku li pêşberî mala Cengîz wan bû. ji ber ku Cengîz pir ji topanê hez dikir û hemû hevalên xwe li wir kom dikir, herkesî ji wir re ew nav danîbûn. Cengîz li Egîd mezintire, bejna wî jî jê dirêjtire. Hertim di nav hevalên xwe yên di taxê de gelekî berbiçave. Herdem bi gavên xwe yên dirêj li pêş dimeşe û di hemû leyîstokan de bi taybet di leyîstoka fûtbollê de yê herî li pêşe û taxima ku hertim bi ser dikevin, taxima wî ye. Ti caran ji bo xwe binkeftinê napejirîne heta di leyîstokan de. bi kesên di taxima xwe re yek bi yek diaxive da ku herî baş bileyîzin. Wê ti caran binkeftî ji wê sahê derneketiba. Gelekî ji fûtbolê hez dike, sibê heya êvarê bilîze jî têr nabe. Pir caran ji ber fûtbolê lingê xwe birîndar dike lê newêre ji dayika xwe re bêje ji ber ku dizane dayika wî jê re bêje ku careke din neçe topanê!

* * *

Rojên dawiye ji bo Cengîz. Wusa jê re tê ku Gever xatirê xwe jê dixwaze. Piştî ewqas sal, cara yekê ye ku hesteke bi vî rengî jiyan dike. di sûkên Geverê de bi gavên dirêj bê ku zêde li pêşiya xwe binêre, ji xwe re dimeşe û ewqas di nava fikir û xeyalan de xeniqiye ku haya wî ji wî nîne. Carnan kesên nas dema di ber de derbas dibin, silavan didinê û dixwazin pê re serê sohbetekî vekin, qet bi xwe na-

hese. Carekî dema bi xwe dihese û li pişt xwe mêze dike, hevalekî wî bi ken dibêje; "xwedê Cengîz aşiq bûye, êdî me jî nabîne!". Di vê rewşê de hinekî şerm dike û dixwaze lêborîna xwe bixwaze lê êdî dereng bûye û hevalê wî pir ji wî dûr ketiye. Dîsa meşa xwe berdewam dike. Pir tişt di serê wî de derbas dibin. Doh li gelek cihan operasyon çêbibûn, qet dilê wî ne rihete. Gelo tiştek bi hevalan hatiye?

Di vê navberê de maşînên leşkeran ku ji operasyonan vedigerin, têne pêşiya wî. Ji acizbûnan destê xwe xistiye berîka xwe û hinek tiştan di bin simêlan de dibêje. Çavên xwe qet li ser wan maşînan ranake. Ne yek, ne dudu. Bi sedan maşînên zirxî li nav bajêr de dibihorin. Di wê kêliyê de dilê wî pir teng dibe. Weke ku biriya tiştekî an jî kesekî kiriye. Ber bi êvarê ye, bavek nanê germ li ser destan, ji bo ku destê wî neşwite rojnameya wê rojê jî daniye bin û bi lez ber bi mala xwe ve diçe. Dayikek hêj dinya tarî nebûye, dixwaze gihayên ku ji dikana serê sûkê kiriye, bi lez bibe malê û şîvê çêke. Zarokên li kolanan tevî ku ji serma poz û destê wan sor jî bûye lê dil nadin leyîstoka Heftkevir berdin lê çawa awirên dayika xwe ji pencerê ve dibînin, bê dilê xwe dest ji leyîstoka xwe berdidin û diçin malê. Êdî her kes hêdî hêdî ber bi malên xwe ve diçin…

Bi carekî çavên wî di bilindahiya Zagrosan de asê dimîne. Rojê ji bo cara dawî serê xwe daniye ser singa Zagrosê, xwe bi rengê sor xemilandiye ji bo axir car. hemû ezman jî pêre sor girêdane. Rengê sor nîşana xatirxwestinê ye. Cengîz ji mêjve fêrî vê zagona xwezayê bibû. Bê ku bi xwe bihese, sietan li wir temaşe dike. di dilê wî de ev gotin derbas dibin; "şev û roja wan nemaye, kêliyekî jî çavên xwe nadin ser hev û nobedarên şev û roja mene." Dema carekî çavên xwe dide ser hev, rondikên wî hema ji xwe re li ser rûyê wî ve têne xarê. Axînekî kûr dikşîne hinavê û derûdora xwe mêze dike, kolan hinekî tenha bûye, dengê xwe hinekî bilind dike û wuha dibêje; "li benda min bin, ez têm hevalno!".

Wê şevê xew ji çavan reviyaye. Di nava livînên xwe de natebite, aramiya canê wî tine. Dayika wî ku kurê xwe baş nas dikir, his kir ku serê Cengîzê wê bi tiştekî re mijûle ku asûde ranazê. Ber bi wî ve diçe, li kêlekê rûdinê û lihêfa wî li ser seran dide aliyekî. Cengîz bi qestî çavên xwe girtiye, weke ku xew kiriye lê dayika wî hema bi

hinarokên wî ve digire, serê xwe serde berdide û maçekî bi dilê xwe li rûyê wî dide. “kurê min, te xêre, dîsa çi bûye?” bi milê xwe yê rastê hewil dide rûyê xwe ji dayika xwe veşêre û bi dengek nizim dibêje; “tişt nebûye dayê, hinekî serê min dêşe” dayika wî destan jê bernade, destê wî dide aliyekî û dibêje; “ez kurê xwe nas dikim, hema ji xwe re wusa bi fikar nabe, ma ne tu hertiştê xwe ji min re dibêjî, xêre hinekan cihê min girtine? Hinekî jî ji neçarî radibe û rûdinê, herdû destê dayika xwe digire û li nav çavên wî yên mezin û bedew mêze dike û dibêje; “na dayê ma kê cihê te ji min re tije bike? Ya rast êdî Gever ji min re teng tê. Bêhna min diçikîne. Ez dixwazim biçim!” dayika wî rûyê xwe dizivirîne aliyekî û bi dengeke nizim dibêje; “dîsa ev mijar, ez dizanim tu tiştekî bixî serê xwe, heta tu pêk neyînî, rihet nabî.” Bi lez radibe û li ser piyan li nav çavên reş ên kurê xwe dinêre, axînekî dikşîne, goşeya laçika xwe digire û li dora serê xwe digerîne. Serê xwe ditewîne û li gulên neqişandî ên spîçolkî li ser laçikê temşe dike û bi dengek hêdî weke ku bi wan gulan re xeber bide, dibêje; “tuyê dawiya dawî ya xwe bikî, tu dizanî lawo!” Bi vê gotinê hema ber bi deriyê odê ve diçe û xwe davêje derve. Cengîz lihêfa xwe dide aliyekî, li ser textê xwe rûdinê, serê xwe ditewîne, di bin simbêlan de ji xwe re dikene. Dizivire çûyîna bi lez ya dayika xwe dişopîne ku hewil dide hema ji wir dûr bikeve. Hinekî bi tiliyên destê xwe dileyîze û kûr kûr diponije…

Êdî rêka xwe dîtiye. Êdî ti tiştekî bi evîna çiyan re naguherîne. Êdî ew jî dixwaze bibe parçeyek ji vê heqîqetê. Êdî ew jî dixwaze bibe milîtanekî rojê. Dê kê pêşiya wî bigire ji vê sietê şûnve? Ne dayik û bavê wî, ne malên dinê û zewq û berqên modernîteya kapîtalîst çavên wî dixapîne û ne jî evînên sexte û derewîn ku weke benîştan li ser zimanê her kesî digere, lingê wî girê dide. Evîna keça cîran jî gelekî li ser dilê wî giranî dikir, ew jî di goşeyeke dilê evîndar de ragirtibû. Çîroka bûkên axê ew bêhtir dikşand. Radibe diçe ber derî, çavên wî dunyayê gelekî xweş dibîne. Ji rengê şevê mest û xumarîn dibe. Li stêrka xwe temaşe dike, şaş dimîne. Di ber xwe de dibêje; “hevalek ji stêrka min re çêbûye. Allahallah ev çiye?” tûka di qirika xwe dadiqurtîne û çavên xwe li ezmanan didize, li dawiya rêya ku maşîn bi lez jê derbas dibin û ronahiya wan di tariya şevê de wenda dibe, temaşe dike. Weke ku bi salane ev hest bi wî re jiyan

dike û îro van hestan zêdetir xwe li dilê wî pêçane. Bê hemdê wî ev gotin ji devan derdikeve; “gelo kesek li Jor li benda mine?!” ev ji ku derket, çima wusa difikirî? bi xwe jî nedizanî. Tenê dizane hestek ne diyar lê gelek xweş wî ber bi Jor ve dikşîne. Di wê kêliyê de hema dixwaze bifire. Ewqas stêrk di sufreya ezmanan de kom bûne ku spî berfa Zagrosan ji wî ve xuya dike. lê temaşe dike û dengê dilê xwe guhdar dike:

•Me ji bîr nekir we navê mirinê li ser eniya me nivîsî. We bi me da bawer kirin ku em her bi dîroka şaş jiyan bikin. Em di tevnê bênasnametî û jixwe biyanîbûna we de hatin hûnandin. Lê vê bizanin wê av biherike û bestera xwe bibîne. Di vê herikînê de gelek tişt hene. Carnan har û serkêşe, çi li ber hebe, bi xwe re dibe. carnan jî bêdeng û hêmine, lê ew jî bi xwe re hinek tiştan dibe û diherikîne.

Û carnan ev av gelekî kûr û hêdî ye, dibe ku qet dil nede ti tiştekî bi xwe re bibe. Lê masiyên di nav avê de ji xwe re jiyanek ava kirine, jiyana wan bi vê avê ve girêdayî ye. jiyan, bi qasî leza herikîna avê, bi hêz û vîna wan ve jî girêdayî ye. Ev tevger bi dilopekî bû derya, em masiyên di wê deryayê de, lez û hêza me, leza deryayê ye.

Ez gotinekî bikim heta dawî ezê li ser wê gotina xwe bimînim. Êdî ezê jî bibim dilopek ji deryaya bêdawî a vê rastiyê. Ger tu masiyek bî, tu di deryayê de bî dunyayeke, tu ji derve bî dunyayek dine. di navebera wan de cêwaziya jiyan û mirinê heye, ewqas! Ez bi golek biçûk qayîl nabim û rêya zeriyayê digirim pêş xwe û diçim bigihêjimê. Piştî golê, ez di zeriyayê de tenê dilopekim.

Min keştiyên li pişt xwe hemû şewitandin û ber bi peravên rastiyan ve diçim. Ezê navê pergala xwedayên zalim bi wan keştiyan re bişewitînim û xweliya wan berdim deryayê. Ezê êşên xwe jî di şepolên ku bilind û nizim dibin de bikim hêz û li ser wan rûnêm û ber bi peravê ve biçim. Ezê evîn û hezkirinên bêwate û hevaltiyên sexte ku hebûna min di mij û moranê de dihêle, bidim aliyekî û tevlî evîna mezin a azadiyê bibim. Tevlî karwanê rêhevaltiya rast û têr bibim. Û bibim vîn, bibim biryar û bibim bawerî û girêdan.

Û Remezan şevekî dil dabû dilê Cengîz û li benda hatina wî ev gotin li ser lêvan diherikî;

êdî ez jî Andokim,

êdî ez jî çalakvanekim,
êdî şervanekim,
şervanê parastina jina dayikim,
êdî çalakvanê şervanê herî mezin, Rêber APO me,
ku şerê hemû xwedayên bêmaske dike.
êdî şervanim, şervanê gelek mêtîngerkirî,
hezarê salan ew talan kirin, nirx dizîn, ji xwe re birin,
êdî şervanim, şervanê lihevhatina nirxên cewherî
ew reh û koka mine, dike zuha bike modernîteya kapîtalîst
êdî şervanim, êdî ez jî Gêrîlla me,
Û ez gêrîllayê xeyalên zarokatiya xwe me
êdî navê min jî Andoke, ez şervanim, ez gêrîlla me…!

Ji bo bibim ezê ez pêwîste kêlî bi kêlî, gav bi gav şer bikim. Û dermanê van hemiyan çiya, gêrîlla û perwerde ye. Ezê bi van ji te birevim, dûr bikevim ey xwedayên derewîn û har. Êdî ez dûr ji te dibim ez! Dûr ji te dibim wate! Bizane looo ji bo ji te birevim, ketim û rabûm lê qet li erdê rezîlaneya te bi cih nebûm, heta taqet di çokê min de hebû ji sînorên te derketim û beziyam bê navber.

Êdî gihiştim coş, heyecan, vîn û hêza gêrîlla. Li ser piya me, dimeşim ber bi heqîqetê ve. êdî bi çiyan ve hildikişim, ne bê taqetim. Êdî şervanê azadiyê me ne koleyê te û êdî fêrî zanista xwebûnê dibim, qet guhê xwe nadim zanista te ya çor û bê wate. Ji bo jiyan bikim, şer dikim, ew jî şerek mezin û çetîn ku bi jiyaneke rast misoger e. Nirxên azadiyê di şerê jiyanê de veşartiye, her ku ji bo wan şer bikim, dengê dilê xwe dibihîzim û ji xwe re vê dibêjim, nebe ev deng, dengê azadiyê be û em ewqas nêzî hev… dengê nefesa wî tê min! Êdî ew di min de ye. Ez ji xwe derdikevim, “ez” li dawî dimîne. Êdî ez emin! Em jî hemû mirovahîne…

# Hevalên rêçekî

Êdî wê Remezan û Cengîz ava çiyayekî vexwen. Dibe ku qet rojekî hevûdû nebînin jî lê çiyayê wan hevbeşe. Di heman şîverêyan de bi caran meşiyane, bê ku hev bibînin. Di perwerdeyan de heman nêrîn û raman parve kirine, heman hest jiyan kirine, bê ku pêhesîyabin. Di şeva nobedariya xwe de heman setêrk ji bo xwe hilbijartine û dema stêrkek şemitiye ji sufreya ezmanan û ber bi wan ve hatiye, dilê wan bi hevre lê daye, weke ku ev peyev di heman kêliyê de li ser lêvên wan biherike; “gelo vê carê ji bo kê şemitî?” bêyî ku haya wan ji hev hebe. Li ber heman şilêrê ve derbas bûne û bi xwêdana xwe ew av dane, bê ku bizanin heman westanbûnê parve dikin.

Bi caran ji heman kaniyê dilopek av li ser lêvên qelişî ve berdidin û xwe di eynika wê de temaşe dikin, bê ku rojekî hevdû bibînin û bizanin ku dilê wan li ber kaniyê bi hevre bêhna xwe stendiye. Bi caran ji bo bîranîna hevalên ku rojekî av ji wan kaniyan vexwarine, xwe li ser çîmena dor kaniyê dirêj kirine û têra dilê xwe av vexwarine, tenê bi şûnpê û bêhna xwêdana hevalekî hevûdû nas kirine. Tenê zanîne ew jî weke wan hevaleke. Û dirêj dibe diçe bi sedan û heta hezaran kêliyên ku van herdû hevalan bi hevre heman kêlî jiyan kirine. Ji ber ku baş dizanin li gel mirovên li van çiyan tiştek bi navê sînoran tineye. Ne sînorên lêkirî li ser erdê hiştine û ne jî sînorên ruh, dil û mêjî. Çawa di zarokatiya xwe de ji kêlên tixûbên li ser axa xwe, ji xwe re malmalokên ji herrî bi destê xwe yê biçûk çêdikirin, niha jî di her bêhin vedanekî de li ser wan kêlan rûdinên û henekên xwe bi aqilê kesên ku ew kêl li wir danîne, dikin. bi caran li ser wan kêlan rûniştine û leyîstokên zarokatiyê ketiye bîra wan û ji xwe re

têra xwe keniyane.

Erê! bi hevre keniyane lê ne li gel hev bûne tenê ji dûr ve dilê wan bi hev re keniya ye. Dibêjin mirovên li van çiyan her kêlî û her katjimêrê bi hevre û ji bo hev jiyan dikin. Carnan hinek heval hene, qet bi hev re nemane, qet hevûdû nas nakin lê di kêliya ku hev dibînin, weke ku bi salane hev nas dikin, hevdû himbêz dikin û ji hev hez dikin. Ango hevaltî di kêliya ku tu hevalekî bibînî, pêş nakeve. Ev hevaltî di her tiştên van çiyan de veşartiye. Yan jî mirov bêje her tiştê van çiyan bi wan re hevaltiyê dikin, dibe ku rastir jî be. Ev rêhevaltî bi qasî ku di parvekirina yek kozikê de kûr û biwateye di heman demê de di merasîmeke kurt a destdayînê de jî kûr û watedare. Ti caran weke wê kêliyê jî kurt û demkin nîne. Ango di hevaltiya Gerîlla de wextê kurt û dirêj tineye. Hevaltî ew an û kêliye ku cih, dem û wextan nas nake.

Dibe ku îro ez yan tu li cihekî yan jî demekî bi tenê bimînin lê dûr ji me, bi sedan heval hene ku me difikirin û bi me re ne. Tu jî her wusayî, rojane bi sedan heval têne bîra te û wê demê tu qet xwe bi tenê his nakî. Dilê te ti caran teng nabe. Ya rast tu bi wan re dibî tu û ew jî bi tere dibin ew! Gelo we qet bi tava heyvê re hevaltî kiriye? Gelo şevên we di bin vê bedewiya gerdûnê de bihoriye, bê ku hûn bi xwe bihesin? Misoger her gêrîlayek bîranînek wê bi tava heyvê re heye. Tava heyvê ti caran ji mirovan re kevin nabe, dema wê derbas nabe, hertim weke roja destpêkê ye. Tava heyvê dibe şahidê hemû veqetîn, dîdar û hevdîtinên di serê her buhar û payîzekî de. Dibe şahidê ken û henekên wan, girî û êşên wan. Dibe şahidê hezkirin û bêrîkirinên wan. Û tava heyvê razdareke ji wan re. Wan guhdar dike, bê ku biweste. Di hemû meşan de bi wan re rêwîtiyê dike, bê ku gazincan bike û berê xwe ji wan vegerîne. Dibe ku carnan ji ber ku tava wê li ser wan naçe û deşîfre dibin, jê aciz dibin lê ew qet nagire dilê xwe û dibe ku bi xwe jî maf bide wan.

Dema her gêrîllayek li ser her şîverêyekî dimeşe, weke ku hemû di eynî demê de bi sedan hevalan re dimeşe. Carnan du-sê kes bûne û carnan jî bi grûpên mezin re li ser wan rêyan bi hevre meşiyane. Her darek bîranînekî ji wan re zindî dike, çend caran û bi çend kesan re li bin siya wan daran rûniştine. Carnan xew kirine, carnan perwerde dîtine, carnan xwe ji dijmin vaşartine, carnan kemîn danîne

pêşiya dijmin, carnan li bin dareke mêyveyan rûniştine, tî û birçî jî bûne lê derfet nedîtine dest bavêjinê û fêkiyekî jê biqetînin. Ya rast her gerîllayekî ev tişt kêm û zêde jiyan kirine, qet nebe ji hevalên xwe bihîstine. Weke ku şehîdê mamoste, Ferzad Kemanger dibêje; “bi carekî were vî milî çiyan, wê demê tê bizanî ez çi dibêjim!”

# Stêrkên Cêwî

Ew şervanê demên cuda bûn. Stêrka cêwîtiya xeyalên zarokatiya xwe di paşila xwe de veşartibûn û bê ku destûr bidin ji ezmanê singa wan bişemite û bikeve xarê, ew bi xwe re heya çiyayên azad anîbûn. Ew stêrk şevçirayek bû di tarîtiyê de, li xeyalên xwe siwar kiribûn û weke xelatekî ji dilê rojê re pêşkêş kiribûn. Ev xelat tovên hezkirinek zelal û sade bû ji rojê re. Ji çavek şîn hez kirin di berdêlê de gazincên xwe ji deryayê re nekirin, ji bo evîna şîn. Ji rûçikek esmer hez kirin di berdêlê de gilî ji ti rojavayî re nebirin, ji bo evîna li piştasoyan. Ji jiyanê hez kirin qet rojekî behsa diltengiyan nekirin, ti sî nedane ser wateya jiyanê. hez dikirin, dikeniyan, qet bêdengiya şevê rojekî guhê xwe ji kenê wan re negirt. Hez kirin, meşiyan, qet dilê erdê dil neda bixeyîde. Hez kirin, bûne evîndar, rojekî dilê evîna xwe neazirandin, ji xwe dûr nexistin. Ew mirovên çiyayî bûn ji çiya ber bi çiya ve hatibûn. Lingê wan qet rojekî li ser betonên înkarê negeriyabû. Ew zarokên rojê bûn, qet rojekî tîrêjên azadiyê ji ruhê xwe kêm nekiribûn. Li ber dengê sirûda serbestiyê, dilê wan lêdida. Erê dil sirûda xwe bijartibûn û di serçopiya cenga pîroz de lêdida, gup, gup, gup…

* * *

Navê xwe kiribû Andok. Dema te ew nav bibihîsta, te hema dizanî

ew jî zarokê çiyayê Andok e û roja ku Erdal Andok beriya biçe, cara dawî destê xwe li ser bedena sûrên Amedê ve kişandiye û gotinên xwe li ser bilindahiya Minareya Çarling bi cih hiştiye. Wêneyên wî li ser sûran bi cih maye û Rêzan ber bi xwe ve dikşîne ku şaş û bi heyranî bêje; "aaaaa! rêwiyek di ber me de bihorî." Heta wê demê navê wî Rêzan bû. gelekî ji vî navî hez dikir. Dema hevalên wî jê re bigotana Rêzan! ji kêfxweşiyan di çermê xwe de hil nedihat! Min carekî jê pirsî; "çima du navên te hene?" digot; "Andok navê hevalane û Rêzan jî navê mine!"

•Ango dema tu gazî xwe dikî, tu hêdîka dibêjî Rêêzaaaaan, Rêêzaaaaan… Ne wusa?

Dikeniya û digot; "li herêma me navê Rêzan pir tê bikaranîn. Ji kesê ku rê nas bike re dibêjin Rêzan. Ji bo wê jî ev nav gelekî bala min kişandiye. Ev navê dile, dil!" navê dil! Û gelo navê dilê cêwiyê wî çibû?

Dema ji dûr ve tê, komek heval rûniştine û bi hatina wî re herkes bi carekî dizivirin û li wî mêze dikin. Çanteyek li piştê, cilên partîzaniyê nû li bejna xwe kiriye. Bejna wî ya bilind û her ku kêmekî nêz dibe, rûyê wî yê bi ken bala her kesî dikşîne. Tê û yeko yeko hemû hevalan bi germî himbêz dike û li ser kevirekî li kêleka hevalan rûdinê. Heval bixêr hatina wî dikin. Û hevalek hema jê dipirse; "heval tu ji ku têyî, navê te çiye?" ji ber ku ji rêyek dûr hatiye, xwêdan ji eniyê tê xarê û bi mendîleke spî ku ji berîka xwe derdixîne, rûyê xwe paqij dike û bersiv dide; "heval navê min Êrîşe, ez ji Xakûrkê têm!" hevalek jin ku diyare ji hemû hevalan ciwantire, çavên xwe mûç dike û ji heval Êrîş re dibêje; "heval tu ji Geverê yî? axaftinên te dişibe Geveriyan!" . hemû heval dikenin û ew jî bi kenê xwe yê ku bala her kesî dikşand, têra dilê xwe dikene…

Ewqas zû bi hevalan re germ dibe û bi wan re dibe yek ku herkes wer dihesibîne ku bi salane vî hevalî nas dikin. Dema li kêleka hevalan biba, xerîbî nedikşand. Dema min cara destpêkê li çiyan dît, navê wî AWENT bû, ev nav pir bala min kişand. Min jê pirs kir ka wateya vî navî çiye? Wuha bersiv dabû min; "Awent, ava ku li bin sîbera darê de diherike ye!" Û weke navê xwe bû. Av, sî û dar. Sê tiştên ku qet mirov nikare ji Êrîş dûr bigire. Pir îsrar dikir ku navê wî her Êrîş Awent Gever bimîne. Ji ber ku ew di navê xwe de veşar-

tîbû. Dilê wî weke avê zelal bû, her kesî di zelaliya eynika dilê wî de xwe didît û zelaliya di çavan de. Çavên wî weke ku tîrêjên rojê li singa avê bide û bibiriqîne bû. Û çawa ku av nasekine, bêrawestane, ew jî qet rojekî nesekinî. Kes nedigihişte lez wî, çawa ku kes nagihêje leza avê.

Bê wî nedibû, çawa ku mirov bê avê nikare bijî! Û sîdara di navê de veşartî, ew dara jiyanê bû. Weke darek ciwan her roja ku te ew ditît, bejin dida û bilindtir dibû. Kenê li ser lêvên wî weke gulxunçeyên nû bişkivî her bi tere dikeniya û dixwest demek ji ya din zûtir dema wî were û gul bide. Lêvên wî weke gulxunçeyê her bi ken bû. Ma kê dikare pêşiya vebûna gula vê darê bigire? Û dara ku hertim bi berheme, ti salî hezkiriyên xwe destvala ji cem xwe venagerîne. Her ew dare ku her kes parekî jê distînin, bê ku bi dawî bibe. Bê ku gazincan bike. Heta jê hebe berhemên xwe bi dost û hevalên xwe re parve dike. Qet hevalên xwe bi tenê nahêle. Û siya darê. Gelek evîndar di bin sîbera hevaltiya wî de rûdiniştin û star digirtin. Sîbera hevaltiya wî ne ji bo kesekî yan jî hinekan bû, ji bo hemû rêhevalan sîbera dilê xwe parve dikir. Bê ku ti cudahiyekî têxe navbera hevalên xwe bi herkesî re pir germ û rihet bû. Erê Awent navê dil bû, dilê wî çiba navê wî jî ew bû.

* * *

Çav eynika dilane. Dil digot rojekî, Li ser berfê dimeşiya, Êdî xatirê xwe xwestibû û pişta xwe dabû me û diçû. Ji bo cara dawî vegeriyabû û gotibû; “li benda silavên min bimînin!” Çanteyek bi rengê qehve li piştê û çeka xwe jî dabû destê xwe. Li ser berfê dimeşiya, dengê kurte kurta berfê dihate guhê wî. Lingê xwe kûrtir di sînga berfê de diçikand. Di ber xwe de dikeniya, bi aqilê Tirkên ku digotin; Kurd ji dengê vê kurte kurtê hatine. Haaaa haaaa haaaa… xurinî ji çiyan tê, guliyên daran di bin berfê de dicirifin. Ev dengê êdî nebe dengê înkara min. Baş pêlê dikim û difetisînim vî dengî di kûrahiya zivistanek sar û dirêj de. dikir dengê melûdiya azadiyê ji wî dengî derbixîne. Min dît gelekî bi lez diçe û ez pê re nagihêjim. Ya rast nedizanî ez li pişt ve têm. Min jê re negotibû, ezê jî bi te re werim. Dema dengê min bihîst, hema zivirî û çavên xwe biçûk kir

û xwest bizane ez kême. Ez keniyam û bi lez ber bi wî ve beziyam. Ew jî keniya lê hêjî şaş û matmayî mabû; “te xêre tê çibikî?

•Heval Andok, ez jî bi tere têm. Weke ku qet tiştek nebûye, min bi lez meşa xwe bi wî re berdewam kir. Ewqas lez dikim, gavên min li pêş gavên wî dikevin, û ew hêjî matmayî:

•Rastî tu ciddiyî vê berfê tuyê çawa bêyî?

•Ma tu çawa diçî, ez jî wusa!

•Tu dizanî ez diçime ku?

•Na lê tenê dixwazim bi te re werim.

•Haaahaaa… Tu wê çiyayê bilind li hember me dibînî? Destê xwe dirêj kir û ew çiyayê bilind ku ji berfê spî dikir, nîşanî min kir.

•Erê tu biçî ber perên ezmanan jî, ezê bi te re bêm. Carekî di cihê xwe de sekinî. Ez jî bi wî re gavekî li pêş sekinîm. Min got; “çibû, çima tu sekinî?” zivirî û raste rast li nav çavên min mêze kir. Rengê çavên wî û çanteya li piştê wek hev bûn, te digot qeyê wênekêşekî bi zanebûn rengê qehwe ji bo herdûyan bikar aniye. Çavên wî gelekî dibiriqîn. Porên perîşan ji kêfa dilê xwe re li ser eniyê ve hatibûn xarê û lêvên wî tebesûmek biçûk resimandibû ser rûçikan.

Di çavên wî yên roşen de du stêrk hebûn. Ne şev jî bû, di vê ronahiya rojê û li ser vê berfa spî ev çi stêrke? nikarim xwe bigirim, hema tûka xwe daduqurtînim û destê xwe ji serma dixim bin çenkên xwe û jê re dibêjim; “Dikarim pirsekî li te bikim?” vê carê wer ji min re tê ku şewqa çavên wî hemû sîmayên min pêçandiye. Ronahiya awirên wî rûyê min dorpêç kiriye. Serê xwe bi aliyekî ve xar dike û bi nîvkenekî li benda pirsa min dimîne. “di çavên te de du stêrk hene, ew kêne?” çavên xwe carekî dide ser hev û vedike. Weke ku dilasûde be, ka ew li wirin yan na! Jixwe bawer destekî dibe navtenga xwe û dibêje; “ew cêwiyê mine, ji zarokatiyê ve bi min re heye, pîrka min hertim digot, ew nîvê teye, dema te ew dît tûyê kamil bî” dema vê gotinê dibihîzim, dibêjim qeyê tiştek ji dilê min qetiya. Bê hemdê min destê min diçe ser dilê min, pêdigirm, ditirsim xwe ji singa min bavêje derve! Jê dipirsim;

“Qet te merax nekiriye ka ew kêye?”

•Jixwe ji wêye ku di vê berfê de ketime ser rê û diçim.

•Yanî ev leza te ji bo ku tu biçî bibînî ye, Ez jî nikarim bi te re bêm?

•Ez vê rêkê bi tena xwe biçim, belkû baştir bibe, ne wusa?
•Lê te wusa got meraxa min ji te zêdetir bû.
•Haaaahaaa… başe, soz be, dema min dît, ezê ji te re jî bibêjim.
•Erê tu dixwazî wusa bikî ku ez bi te re neyêm.
•Em dizanin ku dilê te li gel meye. Ji bîr neke ji bo me binivîse haaa!
•Tu heta nebêjî ew kêye û tê biçî gel kê, ez tiştekî nanivîsim. Na na! Tu zanî ezê binivîsim Andok nehişt ez bi wî re li ser berfê bimeşim. Dema min ev got, ewqas bi dengek bilind keniya ku nekarî xwe li ser xwe bigire û hema li ser wê berfê rûnişt. Li jêr ve bi çavên xwe yên mesûm û zarokane li min mêze dikir, weke ku ji min re bêje, "bihêle heval, bihêle ez biçim, derenge, dem dibihore, divê em bigihêjin rendewiya serkeftinê." Lê min jî dixwest li kêleka wî li ser berfê bimeşim. hema gotina dapîra wî kete bîra min. Min dil neda di hestên wî de zêdegaviyan bikim. Hinekî ji xwe aciz bûm lê min hewil da qet neyînim ser rûyê xwe. Ji bo ku pênehese, ez hema keniyam û min got;
•Weh weh, sûûûûsssss! hêdîka bikene, niha ji dengê kenê te aşûtê di ser me de bê xarê!
Dest bi meşê kir û destê xwe rakir, îşareta serkeftinê çêkir. Ji bo cara dawî li ser milê rastê ve vegeriya û bi min re keniya. Min jî got; "başe lê ewqas zû…
Hêşta gotina min di devê min de bû, min dît wek bayê di ber min de bihorî û wenda bû. di wê boranê de li derdora xwe dinêrim û li wî digerim. Tiştek xûya nake. Şaş û matmayî li ser berfê sekinîme, ji dûr ve dengek tê, hevalek ji mêj ve gazî min dike lê ez bi xwe nehesiyame. Ez zivirîm bi serê xwe min bi wê hevalê da fam kirin ku; "başe! Ez niha têm". Dema ew heval çû, ez jî weke zarokên ku nû ji piyan dimeşin, hêdî hêdî gavên xwe davêjim û li pişt wê hevalê, ber bi kampê ve diçim.
Qet nizanim kengê û çawa heta wir hatime. Dîsa vedigerim û ji dûr ve li Andok digerim. Ew ji mêjve çûye. Stêrka xwe dîtiye û bi hevre çûne. Nîvê wî yê din Êrîşe. êdî kamil bûne. Stêrka xwe di goşeyek dilê xwe de anîbûn û wê nîşanî hev bidana. Çawa du zarok dema demekî ji hev dûr dikevin lê çawa ku digihêjin hev, kê çi dabe wan hema tînin û nîşanî hev dikin, wan jî bi salan di wê hesretê ku

wê rojekî behsa stêrka xwe ji hevûdû re bikin, ew di paşila xwe de gerim û zindî hiştibûn, ji bo qet sar nebe. Her di himbêza wan de dibiriqî stêrka wan. Ji wê bû ku dema te li rûyê wan mêze dikir, nûr ji rûyê wan dibariya. Û bi rastî min di çavên wan de du stêrk dît. Her ew gotina Andok di mêjiyê min de mabû; "ew cêwiyê çarenûsa mine!" Andok rojekî ev gotin ji min re gotibû, çûbû û paşê min qet ew nedîtibû. Ji bo wî bibînim li pey nîvê wî yê din digeriyam. Li Êrîş digeriyam. Gelo di çavên wî de jî heman stêrk hebûn? Û li pey digerim şevekî ku stêrkan sînga ezman dagir kiribûn, li çavan digeriyam… Çav eynika dilane. Dil digot rojekî;

Îşev hestên min, di quncika dilê min de dilepitin, xwe li sînga min didin, dikin ku derkevin. Ji min re dibêje tiştekî bêje û xwe kir neke di lepên xemsariyê de. Dibe ku ev awirên Andoke ku min ber bi te ve tîne heval! Ew awir giliya li min dike ku bêje Her çiqas ji wan re dibêjim ku nikarim. Nehêjame. Ew di hestên min yên feqîrokî de cih nagirin. Lê dîsa li pey min tê li ser berfê!

Erê heval hest ew şeve ku tu nikarî jê re bibêjî nebe roj. hest ew roje ku tu nikarî jê re bibêjî nebe şev.

Hest ew barane ku tu nikarî pêşiya dilopên wê bigirî. hest ew gule tu nikarî jê re bibêjî; "nebişkive!" hest ew azadiye tu nikarî di kulmên xwe de ragirî. Hest ew masiye ger tenê kêliyekî ji deryayê dûr be, wê serê xwe dayne ser tenişta peravên deryayê û di xema wê de biperpite, biperpite û di dawî de ruh li ber biçe. Û hestên min weke ku hemû gerdûn li pişt xwe girtibin, hatine şerê min. Ev şeva payîzê, ev heyva çend rojkî û ev stêrkên ku car û bar li pişt pelên ewrên reş, şewqa xwe didin lûtkeyên çiyan, min asûde nahêlin. Nahêlin îşev, tenê îşev dilê min li ser janên xwe aram bigire û kulên wan heval û hogiran di bêdengiya dîrokê de were veşartin. Dibêjin ma kê vebêje van serpêhatiyan? Ma kê behsa wan qehremanan bike? Ma ne em fêr bibûn, dîrok di roja me ya îro de veşartiye! Ê başe em îro vebêjin û serê heqîqetan negirin. Erê hûn rast dibêjin. Lê hûnê jî bi hewara min ve werin dema ku min kêm got. Ji ber ku hûn jî şahidê wan roj û şevan bûn. We jî didît hevaltiya heqîqetê. Ji ber ku ez her kesî nabînim lê hûn her êvaran mêhvanê dilê hezaran dildarên weke minin.

Hûn şahidê du pakrewanên Amedî û Geverî bûn. Hûn şeva dawî bi wan re bûn dema awirên wan bi we re asê mabû û silavên dawî ji

me re bi rêdikirin. Çawa ku soz dabûn! Erê hûn û hemû bedewiyên pîroz yên vê gerdûnê! Hûn qasidên wan bûn di şeva dawî de. We di neqeba wan û Giravekî de peyambertî dikir. Hûn bibûn masî û tije gotin li ser perikên we dildavêtin. Hêviya vehiya dawî bûn ji çavkaniya heqîqetê, ji bo ku li gel wan êdî gotin bi dawî bibû. Dem dema ji xwe derketinê bû û derketin, firiyan û ber bi welatê we ve hatin, ber bi rastiya xwe ya ji bîr kirî ve...

# Kêliyek bi wan re…

Roja ku çavên Erîş şîngiriya Harûn û Tayhanan dikir û şeva wî bê hedar derbas bibû, pêhesiya bûm ku ti dilek bi qasî dilê wî dilsoz û bi kîn nîne û wê biçiya serî ev dilsoztî û kerba wî ya hezarê salan. Qet ji bîr nakim şeva ku qet raneza û dil ji bo wan herdû rêhevalan heta berbangê hildipitî. Ew halê wî dişibiya şeva ku Andok li ber sûrên Amedê heta sibê ji bo rêwiyek nenas xew neketibû çavan. Gelo çend şevan hûn bi hevre ji bo cangoriyên li ber dilê we firiyan û çûn, ranezabûn? Gelo çend caran tayê spî kete porên we û we sîmayê xemgîn di bin rêdîna dirêj de veşart û qet me ferq nekir. Gelo çend şevan çavên we di mangeşevê de sêwî ma û em di xewa giran de bê-xeber man? rondikek ji bo hezaran niqutî ser balgiyê şevê û wê ti caran şopa wê wenda nebûya…

Dîlana Zêrînê dîlaneke tabybet bi herêma Geverê ye. Ji bo wê jî hemû hevalan nedizanîn. Di moralan de dema yek heba ku ew dîlan bizaniya, wê qet newestiya û heta hetayî di wê dîlanê de bima. Min dît gelekî ji wê dîlanê hez dikir, ez jî hema çûm û min got ku ez jî dixwazim fêr bibim. Gelekî kêfxweş bû û bi eşqek mezin ew dîlan şanî min dikir. Êdî ez westiya jî bûm lê qet dest ji min bernedida. Digot pêwîste tu fêr bibî. Ya rast herî zêde gavên wî yên dirêj ez di-westandim. Di wê dîlanê de xwe ji bîr dikir, weke ku di ezmanan de li ser ewran difire, baz dida û tu jî li pey xwe dikşand. Bi destê te di-

girt û tu li her deverî digerand. Tu li kêleka wî li ser ewran bûyî, parzemîn hemû di bin lingê te de bûn. dişibiya xewnên ku me di zarokatiya xwe de didîtin. Weke ku bêje; "were, were, em bi hevre bifirin, bilind bifirin ka em mêze bikin pişt wan ewran çi heye?" di vê dîlanê de westandin nebû, ger te hinekî xwe sist bikira tûyê ji jor ve biketiya xarê. Ya baş tu şidyayî destê wî bigirî, bila te bi xeyalên xwe re heta ku dixwaze bibe. Û Andok herdem henekê xwe bi me dikir ku hûn nizanin bilîzin, ji xwe ji bo me jî mesele tenê ne leyîstin bû, em bibûn du zarok û difiriyan. Lê Andok mamosteyê govendê bû. Gelekî bi esnek bû. Dema dikete serçopiyê te dixwest hema tu ji xwe re li wî binêrî. Kes di çepkêya Amedê de nedigihêşte wî. Ger me şaş jî bikira şiva wî di destan de wê li lingê me bida!

Ger tu neketa serçopiya dîlanên me, qet ji dilê me nedihat ku em destê hev bigrin û dîlanekî bigerînin û ger Êrîş destê me negirta û em di dîlana Zêrînê de bi bask nekirana, ti caran ji dilê me nedihat ku em bê wî gavekî xwe çimkin pêş û paş. Ger tu Çepkê nelîzî û Êrîş Zêrîne negerîne, hemû govendên partîzaniyê weke ku li me xeyîdî bin, çokê me ranake serhildanê…

Êrîş gelekî şerim dikir stranan bêje, dema carnan xwarin çêkira, yan jî dar ji bo sobê bişkanda, yan jî dema nobedar bûya û mirov bi dizîka bihata dengê wî guhdar kiriba, mirov qet poşman nedibû. Di moralan de herkesî stranek digot û wî nedigot. Hertim li ser wê nîqaşên wî bi hevalan re derdiket. Rojekî strana şehîd Serhed ya "Ez Kurdistanim" hêdîka di ber xwe de miz miz kiribû û min dengê wî bihîst, çi şansek bû. Ez çiqasî kêfxweş bûm, ji ber ku êdî wî nedikarî xwe ji destê min xelas bikira, ma ne wê rojên morala bihata û wê her rojekî bigota…

Piştî te jî heval, ez gelekî fikirîm ka gelo ew kîjan stran bû ku te digot, lê qet nedihate bîra min. Heta ku rojekî min xewna xwe de dît tu di nava komekî de rûniştî û wê stranê dibêjî û min jî bêxeberê te bi te re digot. Dema ez sibehê rabûm, dîsa min ji bîr kiribû ka te kîjan stran digot. Ez gelekî li ber xwe ketim ku çawa min strana ku Êrîş gelekî jê hez dike, ji bîr kiriye. Çawa ez vê yekê difikirîm, min dît hevalek li kêleka min di ber xwe de vê stranê miz miz dike, ji nişkave dengê te weke bayekî di ber guhê min de derbas bû. Êdî min nekarî pêşiya hestên xwe bigirim di nava kelegiriyekî de min ev stran

bi dengekî bilind ji bo te got. Û Andok xezîneya stranan bû. hema te kîjan stran destpê bikira wê bi te re berdewam bikira. Dilê kesî li xwe nedihişt. Dengê zelal ê şehîd Sefkan ew dibir heta Sultan Babayê û Axvanosan. Hewara qirikê, hestên wî diqilqilandin û xeyalên xwe tevlî herikîna Mûnzûr û Xarçîkê dikir û bi wan re xwe li bedena zozanên Heyderan dipêça û ew jî dibû kite keziyek ji bedewiya wan û hihate xarê. Ji wan stranan qêrîna sedan jinên ku xwe ji lûtkeya Îksorê ve berdidan xarê ji bo ku destên qirêj bi bedenên pîr û pak ve nezeliqe.

Dengê dilnişîn ê şehîd Mizgîn ew dibir heta ber Sîpanê xelatê. Disekinî li bilindahiya bejna çiyan temaşe dikir û Xecê û Siyabend dianî bîra xwe. Çend evînên nêvî mayî di quntarên van çiyan de veşartîne? Çend evîndar mirazên wan di çavên wan de maye, gelo? Çend Siyabendan gelo xwe di van zinaran de ji bo Xecê avêtine xarê? Çend Xecêyan gelo hesp bezandine di mêrgên bê ser û binî de ji bo hewara xwe bibin ji der û cîranan re û qet pêre negihiştine û her dereng mane…

Gerdûn ji gerê biwestiya û êdî neziviriya, ew nedisekinîn û her dizivirîn. Av ji herikandinê têr ba û rawestiya, ew nedisekinîn, her diherikîn û kelemên li pêş xwe digirtin û bi xwe re dibirin. Baran ji barînê biwestiya û bisekiniya, ewê her bibariyan û bexçeyên hevaltiyê av bidana. Derya rojekî vekşiya û di kûrahiya xwe de bimiçiqiya, ewê her mezin bibana û ber bi sînorên bêdawîbûna azadiyê ve bibeziyana. Ger hemû av ji pêsîra kaniyan hilkişiyana, ewê her zêde bûna di singa her kevir û zinarekî de. Dayika wan peyva kedê berê her tiştî fêrî wan kiribû, ji wê bû nedizanîn rawestan, westandin çiye. Dema dayika wan ew li pişta xwe ve girêdidan û ji vî karî dibeziyan wî karî, wê demê fêrî hunera herikînê bibûn. Dema ku çawa çavên wan bi gelawêja berbangê re dialiqî û ji nav cihê xwe difiriyan derve, wê demê fêr bibûn heta roj li ezmanan hebe, qet nesekinin. Dema her êvaran tevlî çalakiyan dibûn û heta sibê li serê her taxê nobedariya xewa welatiyan dikşandin, wê demê fêr bibûn ku xew mirine û xewa şevê li xwe heram kirin. Û kes nedigihêşta leza wan.

Dema em sibê radibûn, Êrîş çaydana reş daniye ser, dar şikandine, her der avreşanî kiriye, taştê amade kiriye û li benda me rûniştiye. Hertim çend gavan li pêş me bû. hesret mabû di dilê me de ku rojekî

em bigihêjin leza Êrîş. Ew û Andok li jor girekî bêhna xwe didan, me hêj li jêrê dest bi meşê dikir. Andok li pêşiya me berf vedikir û bi lez pêşde diçû, em hêj di dawiya rê de di şopên wî de bi cih diman, wê her li ser milê xwe de biziviriya û moral bida me. Ew herdem pêşengê meşê û em li dawî de diman.

Bi demê re şer dikirin. Dem di leza xwe de bêwate kiribûn. Xew, derengketin ji kar û dawîmayîn di meşê de ji bo wan mirin bû, ji bo wê qet rojekî bi asûdeyî çavên xwe nedane ser hev. Ti car dereng nehatin ser kar û qet dawiya meşê nemeşiyan û hêj dengê dîlana wan li ser bedena dihola di destê Delîla'yê de kerika guhê cihanê de gorme gormê dike. Milên me li milê wan dikeve;

Hê hê, Hoo hoo, Têy têy…

# Kenek bi cih maye…

Roja dawî dema me destê hev givaşt û çavên me cara dawî rondikên xatirxwestinê li ser pelên payîzê dibarand, min di xwêdana destê te de coş û heyecana te ya serkeftinê ji dil his kir. Hêj ew Germahî di destê min de bi cih maye. Û hêjî rondikên me li ser wan pelan bi cih maye, hêj gûza te di berîka min de bi cih maye ji ber ku;

Rojek ji rojên payîzê bû ji me re erzaq hatibû. Em çûn da ku erzaq bînin. Tu weke her carê li pêşde bi lez daketî xarê ji bo ku barê herî giran rakî. Weke ku te sond xaribe kes barê ji te girantir raneke. Heta em digihêştin wir me didît te barê xwe girêdaye û li benda me yî. Dîsa dengê giliyên hevalan bilind dibe; "heval Êrîş tu dîsa beriya herkesî hatî û te bar hemû rakiriye, barê te pir girane!" û hevalek bi henekî dibêje: "tu dixwazî hemiya rake û hema biçe" û hevalek din bi ken berdewam dike: "ez bi xwe gelekî westiyame û rêka me jî dûre, gelo cihê min jî li ser wan baran tineye?!" Me ev gotin dikirin lê heval Êrîş qet em guhdar nedikir, hertim digot: "hûn jî weke min bilezînin û zû werin wê barê herî giran ji we re bikeve, leza we kême heval, leza we!" êê… wallahî rast digot leza kesî nedigihişte leza wî.

Êrîş barê xwe amade kiriye û li wir rûniştiye û li benda meye. Her carê jî sebira wî nayê û wê gotinekî bêje, dîsa dev bikene, wuha dibêje: "bi rastî jî ev hevalên me nizanin bar çêbikin" û piştî vê gotinê

bi dengekî pir bilind ku êdî em fêrî bibûn, dest bi kenê kir. Her kes li ber xwe de tiştekî dibêje, lê ma kê xwe bigire piştî wê kenê bêmînak! Her kesî barê xwe çêkir û em bi rêketin. Dunya hinekî gerim bû û rêka me jî hemû hilkişandin bû. hevalê Êrîş ji bo ku alîkariya hevalê herî dawî dimîne bike, herdem bi wan barê giran li dawiyê dima. Ez û hevalek jin li dawiyê dimeşiyan. Hevalên din jî hemû li pêşde çûbûn. Me hertim dizanî Êrîş li dawiye, nekû nedikarî bimeşe, na! Ger ku bimeşiya wê pêşiya her kesî bigihêşta kampê. Bi zanebûn li dawiyê dima. Ew hevala jin hinekî ji min pêşdetir çû. Min dît heval Êrîş li pişt ve gazî min dike, got: “rewş çiye, rewş!” ez jî di bin bar de ji xwêdanê bibûm av û soro moro bibûm. Hinekî zivirîm û bi zorê gotin di devê min de derdiket, ez keniyam û min got: “rewş ber kendale!

- Bisekine ez dixwazim tiştekî bidim te!

- Çiye, ez nikarim bisekinim, çiqas bisekinim ewqasî xental dibim. Di vê navberê de êdî taqet di çokê min de jî nema û ji neçarî rûniştim ji bo ku bêhna xwe bistînim. Ew jî hat û li ser kevirekî li hember min rûnişt. Bi rastî jî barê wî pir giran bû.

- Heval Êrîş ez te rexne dikim, ev çi bare, ma hêjmara me zêdeye heval!

- Dê mijarê neguherîne, ezê tiştekî bidim te lê pêwîste tu soz bidî ku aciz nebî.

- Te dîsa çi kiriye?

Ji ber ku dawiya payîzê bû ji me re torbeyek gûz hatibû, min jî ew veşartibûn ji bo ku em zivistanê bixwun. Lê hevalê Êrîş gelekî ji gûzan hez dikir. Herdem bi henekî digot: “gelo ew gûz xirab nebûne, gelo sîvûriyan nexwarine, mişkan ji xwe re nebirine?!” min jî her digot: “na cihê wan başe, tu xem neke!” hevalê Êrîş weke ku hinekî şerim bike, mîna zarokek ku karek nebaş kiribe, destê xwe bire berîka xwe û got: “ez çûbûm erazî digeriyam, min torbê gûzan dît!”

Ez keniyam û min got: “ê! Te çi ji wan kir?”

•Min hinek ji wan rakir, niha di berîka min de jî du heb mane, min nexwest bi tenê bixwum…

•Tişt nabe ez heneka dikim, ma ev gûz jixwe hemû ji bo hevalane, herî dawî hevalê bixwun.

•Ê başe yek ji min re yek jî ji te re! Wî ya xwe hema danî ser ke-

virekî şikand û deste bi xwarina wê kir. Lê min ya xwe xiste berîka xwe.

•Çima tu ya xwe naxwû, tu aciz bûyî?

Ez keniyam û min got: “na bila bîranîn li gel min bimîne” bi dengek bilind keniya û got: “ma gûz jî dibe bîranîn?”

•Erê her tiştê destê hevaltiyê bîranîne, mezin û biçûk bûna wê tine.”

Wê rojê wî gûza xwe xwar lê min ew gûz di berîka xwe de hişt. Ew gûz dibe ku tiştek biçûke lê dema bi tena xwe ew gûz nexwar û yek da min û yek jî ji xwe re girt, ji wê demê ve ew gûz ji bo min gelekî pîroz bû. hevalê Êrîş bi dayîna wê gûzê ruhê xwe yê parvekirin û kolektîvbûyînê pir baş diyar dikir…! Û ew gûz hêjî li gel mine! Di buxçika sedan bîranînên weke wan de bi cih maye…

# Wêneyek di avê de…

Carnan di awirên we de kûr dibim, carnan di gotinek ku ji lêvên we yên bi ken diherike de kûr dibim û min dide hizrandin. Carnan bi kenê Êrîş re dilê min vedicinîqe, carnan bi dengê hêmin ê Andok xeyalên kûr min bi xwe re dibe. Carnan di kenê wan de diçim heta dema zaroktiya wan. Diçim li kêleka Andok rûdinêm li qiraxa çemê gundê Golayê rûniştiye û xeyalên xwe bi avê re berdide. Li wêneyên xwe temaşe dike. Çavên xwe yên bedew û reşbelekî di eynika avê de çiqas xweş dibîne. Bi xwe re dikene. Bi wêneya xwe re. Çi hestek bedew di dil de veşartiye.

Bi carekî destê xwe li pêlên avê dide û wêneyên xwe wenda dike. Ez jî pêre ji xeyalên wî derdikevim û bi dizîka bêyî ku ew pêbihese çavên xwe diqirpînim û berê xwe didim aliyekî din. Lê dilê min hêjî lêdide. Çiqas wêneyek xweşik bû. Nebe ku Andok ez dîtibim. Yan jî pêhesiyabe ku ez li kêleka wî bûm. Nizanim lê tenê vê dizanim xweziya ew kêlî bi dawî neba û ez her li kêlekê bimama. Min xwe bi wî bida naskirin. Min jê re bigota ku çavên te dibiriqin heval, weke ava vî çemî. Min jê re bigota ez li kêleka xeyalên zarokatiya te heta gundê we hatim lê min newêrî xwe nîşanî te bikim. Heta li tenişta te rûniştim lê min newêrî dest bidim te, belkî ew tilism bişkesta û tu li kêleka min wenda biba. Zimanê min nediziviri ji te re gotinekî bilêv bikim, tenê min lêvên te temaşe dikirin, te hestên xwe di avê de berdida, min dikir bi wan hestan re xwe li wan pêlan bidim.

Belkî ez jî bibim hestek li ser lêvên te heval. Belkî ez jî bibim ava xeyalên te û li ber te de bibihorim, belkî siya çavên te bikeve ser mijangên min û wan di çavên xwe di zevt bikim. Ger tu qayîl bî ezê jî

bibim hestek ji hestên te. Tu her di hestên min de veşartiyî. Ger tu qayîl bî ezê bibim nobedarek li ber xewna mijangên te yên weke evrîşemê. Bo ku ti pirtikek jî li ser rûnenê. Ger tu qayîl bî dixwazim bibim dilopek xwêdan li ser eniya te û tu bi mendîla xwe min bidî aliyekî piştî her westandinekî, piştî her meşekî û piştî her kenekî. Lê qet Newêrim ji te re jî bibêjim. Dibe ku hestên min têra dilê te yê weke deryayê neke û tu bêyî ku haya min jê hebe, ji hestên min xatir bixwazî û koç bikî.

Ya rast yên weke te ti caran ji dil dernakevin. Xwe li hestan venaşêrin. Lê heval tu jî dizanî hestên şermok têra wesfa heybeta şer û tekoşîna te nake.

Ger tu qayîl bî ezê te îşev bikim mêhevanê hestên feqîrokî ji te re binivîsim ji bo qehremantiya di pêçeka zarokatiya te de veşartî. Ji wê ye neyaran pûtînên bêrehmtiya xwe li darên landika sêwiyên 6 mehî dan û ew deverû kirin. Ji bo rondikên te yên zelal dinivîsim heval ku te bi dizîka li pey sedan cangoriyên li ber çavên te di xwîna xwe de xatir ji te xwestin, weke nermebaranekî dibarand. Gelek dixwazim îşev li ber deriyê hestên te bibim nobedarek. Bibim şahidê birînnên di goşeya dilê te de veşartî. Lêvên te ew êş qet bi kesî re pareve nekiribû. Lê hevalên te bêdengiya di çavên te de dîtibûn û digotin; “di çavên Andok de dunyayek negotî heye!” lê te di kêlî bi kêliyên jiyana xwe de behsa wê dunyayê dikir. Ya rast te her roj bi hevaltî û têkîliyên xwe yên gerim pir bi hostatî dunyaya xwe ya şoreşgerane ji me re vedigot. Lê ger hinekî şevên dirêj ji hestên me bar bikira belkî me di ronahiya rojê de ew şewqa çavên te baştir bidîta.

Zivistanekî xwe li rûyê te yê şevînî daye Andok!

Rêdînên te hemahenge ji erdên nîve berf re.

Te rêdîna xwe berdaye ser sûretên nazenîn heval.

Berfa spî li rûyê te jî qewimiye. Rûyê te jî belekî kiriye dilê belekîna berfê heval.

Di wêneyê zivistanek reş û spî de li dîmenên rûyê te temşe dikim heval.

Qet dil nadim dîmenên te di sînga spî berfê de bidim aliyekî û lê temaşe nekim. Tu zanî çavên te yên hingivîn bi min re diaxivin di vê wêneyê de û xwaziya min bizanîba çi ji min dixwaze.

Dikim di spî berfa rêdînên te de cihekî ji xwe re vekim. Gelo des-

tûr heye, heval? Tê bihêlî tenê kêliyekî destê xwe li wan rêdînên te bigerînim, misoger dizanim weke berfa li pişt dîmenên te dikele ji derdê sermaya xedar û bêrehim. Gelo çavên te dikin çi vebêjin heval? Çi?

Hêdîka di bin zimanê xwe de vê stranê dilorînim heval ji bo te;
li pey min negere heval,
Navê min neyîne li ber deriyê wê girtîgehê,
Li vir li pey min negere,
Stêrk ketine porên te heval,
jê newerîne heval, bê westan û çavbigirî…

Di rûyên te de du reng hene, aliyek hezîn û êşe û aliyek jî kêfxweşî û kene. Dema mirov li rûyê paqij û sade mêze dikir, mirov pir baş dikarîbû ev wêne di rûyê wî de bixwenda. Aliyê hezîn ji ber êşên di dilan de veşartî bûn. Êşên ku ta ji zarokatiya wî ve gav avêtibûn jiyana wî. Şeva li dayikbibû, dayika wî ew di xema bavê wî de anîbû dinê. Şeva li dayikbibû, bavê wî dîsa li qereqolan şikence dîtibû. Her qamçiya li canê bavê wî diket, weke ku ew jî êş bikişîne, digiriya. Û her kes pir kêfxwş ji hatina wî. Herkes dikeniya û ew digiriya!

Şeva li dayîkbûna wî, ew şev bû ku çiyayê Andok ji zilma neyaran heta sibê nobedarê partîzanê xwe bû. Ew di ziyaretgahên xwe de hewandibû. Ji bo destê kesî negihije wan. Ew huzna rûyê wî ta ji wê demê ve weke ku melek li eniya te çarenûsekî binivîsin û her kes bêje ku wê neyê guhertin. Ew zarokek heft salî bû û li ber çavên xwe şahidê ewqas bûyerên bi êş bibû. li ber çavên wî mêjiyê mirovên ku herî zêde ji wan hez dikir û ew kes ji bo wî weke melekan bûn, hatibû qelandin di taveya zilma çavsoran de! Ma kê lavaya jê bike ku çima rûyê te melûl û şikestiye?

lê li kêleka ewqas tiştan aliyekî rûyê wî jî herdem bi ken û kêfxweşe. Weke ku ji xwe re ev soz dabe ji rika şikenceyan berxwe bidim. Ji rika kujerên jiyanê, bibe afirênerê jiyana azad. Ji rik û înada bêbextan, bibe hevalê herî sozdar û girêdayî. Ji wê ye ku di rûyê xwe de ev herdû rastî li hev aniye. “êşên ku min nekuje, bila sedê salan pê re jiyan bikim”. Û êşên wî ew neşikandibû. Berovajî di wî de hestên tolhildan û tekoşînê zêdetir kiribû. Di çavên Andok de buharek hebû ku qet payîz lê bi cih û war nedibû…

# Yekîneya Nemiran A Şehîd Zîlan

Carnan dema mirov ji dûr ve bihatiya, ger Êrîş li wir ba, hema tu pê dihesiyayî. Û dil dixwest wuha jê re bêje; "Tu bikene heval bila gerdûn bi te re bikene" Ew bi dengê bilind dikeniya û Andok hertim bi dengê dilê xwe dikeniya. Andok herdem qêrîna kenê Êrîş bû. Di dengê kenê Êrîş de dilê Andok lêdida. Êrîş di bêdengiya Andok de dikeniya, ji wê bu ku dengê kenê wî ewqas bilind bû û Andok di bêdengiya dilê Êrîş de tebesûmek li ser rûçikan dihate neqişandin, ji wê bu ku ewqas aram dikeniya. Ya rast ji bo dilê hev dikeniyan. Ji bo siberojek azad kenên xwe di şevekî de bi cih dihiştin. Dengê kenê wan qêrîn bi şevê dixist û hawar dikir sibê ji bo roja dîdarê nêztir bikin. Li pey dengê kenê wan evîndarek dibeze û ew di warek pîroz de behsa gelek serpêhatiyên cangoriyên nemir dikin.

Bi hevre destpêkiribûn. Wê bi hevre derbiketana huzûra Zîlanê. Bi hevre gava destpêkê avêtibûn dergahê Zîlanê. Gelekî navê Yêkîneya Nemiran bihîstibûn. Lê herdem ji wan re rastiyeke pir dûr dihat. Ewqas ji wan re pîroz dihat ku qet newêribûn behsa wir bikin. Gelo li van çiyan cihek wusa heye, yan na? Gelo kesek li wir heye yan na? Mirovê li wir gelo çawa nin? Pirs dirêj dibûn lê hêjî meraxên wan derbas nedibû. Gelo wir cihê pêkhatina heqîqetê ye yan jî li wir miradê mirovan hasil dibe? Na wusa jî nabe, ger heqîqet li wir bidawî bibe û em bigihêjin miradê xwe êdî çi dimîne. Wê demê çima herikîn, çima ji xwe derbas bûn, çima tekoşîn?

Li cihekî ku xwestek bi dawî bibe, êdî wext radiweste, liv û tevger namîne û lêgerîna azdiyê bi dawî dibe. Di nav ewqas pirs û bersivan de bi carekî xwe li wir dîtin. Weke Sîmorxên, piştî ku ewçend newalên dijwar derbas bikin û bigihêjin heqîqetê, ango bigihêjin xwe, mat û şeyda li hev temaşe dikin. Tu û ez, em û heqîqet! Êdî bi carekî ew pirsên di serê wan de hêdî hêdî besiva xwe didîtin. Lê hêjî bersiva gelek pirsan negirtibûn. Weke pepûleya çaremîn êdî dixwestin bighêjin wateya rastîn a agir.

Şevek sar. Qeşayek bêrehim li ser dilê axê giranî dikir. Te digot qeyê wê îşev bibe destpêka hemû ebed û ezelan. Erê! ew şev bû ku dîroka nemirtî û qehremantiya bi hezaran evîndarên heqîqetê li benda berbangekî bûn da ku xwe ji ronahiya rojê re vebêjin. Û hêj negihiştibûn şefeqa pîroz, hestên Rojê li kêleka peravên giravekî xwe li şepolên tenik dida û ji peravên tênî re behsa siberojekî dikir. Behsa xwedawendekî dikir. Behsa kêliya dawiya ya jinekî dikir ku çav neqirpand û ber bi qada karzarê ve çû. Ling daydinî ser şopa bi hezaran jinên weke xwe.

Dîroka tekoşîn û berxwedaniya xwedawendan di paşila xwe de dilorand. Ew li ser şopekî û gelek kes li ser şopa wê dimeşiyan. Û dirêj bibû ev çîrok heta şeva du cêwiyan. Dilê Zîlanê di singa wan de lêdida, îşev. Şevekî bi hevre Zîlan hatibû xewna wan. Ji sermaya wêran, xwe avêtibûn ber bextê germahiya dergahê Zîlanê û heta sibê li ber çirûskên agirê finda şevê rûniştibûn. Tenê li rûyê Zîlanê temaşe kiribûn û bi vî awayî qeşayên ku dest û piyên wan qerisandibû, di şevekî de helandibûn. Heliya bûn cara destpêkê, şeva destpêkê di germahiya paşila Zîlanê de. bi hevre xew kirine li ser erdên cemidî lê qet bi xwe nehesiyane heta sibê, heta ku lêvên Zîlanê gotina destpêkê ji wan re gotibû. Tenê gotinek; “Jiyana azad!” û li pey wê gotinê bûne pervane li dor findên pîrozbahiyên ji dayîkbûna Zîlanê.

Wan jî di lêgera heqîqetê de xwe gihandibûne vê şeva watedar. Ev înzivaya şevê gelek mêhvanperwer bû. Li pişt hemû kêliyên watedar ê şoreşgerên jiyana azad ev tenêbûn û înziva hebû. Di lorîkên dayika xwe de pirî caran navê wan şoreşgeran bihîstibûn û xwe di xeyalên xwe de danîbûn cihê wan lê îro ew bixwe dibûn çîrok ji bo xewnên zarokên welatê xwe. Dema bi vê difikirîn, bêhemdê xwe gelegirî dibûn. Çi hestek bedew, qet li beramber vê dîrokê hestên biyanîbûnê

jiyan nedikirin. Di wê kêliyê de doh, îro û siberoj weke perdeya şanoyekî li pêş çavên wan vedibû. Li ser dikeya şanoya nemirtiyê leyîstikvanên xuliqkar bûn. Hemû dem li ser perdeyekî li hev dianîn…

* * *

Çilê zivistanê xwe li guliyê daran pêça bû. dibêjin sala bi xêr û bereket ji buharê ve diyare. Sala man û nemanê ji buhara wê ve diyar bû. şervanên azadiyê ji şer û operasyonan di kozikên xwe de çavên xwe nediqirpandin. Balafirên mirinê şev û roj li ezmanê welêt, berhemên hişmendiya xwe bi ser Kurdan de dibarand û navek din li lîsteya vehşeta xwe zêde kirin li Geliyê Tiyarê. Lê 36 ruhên azad, mirin di lat û zinarên gelî de veşartin û çûne pêşvaziya jiyanê. canên ciwan şerma dîroka rûreş vedibêje. Mirin di kevir û zinarên hovîtiyê de binax kirine û serkêşiya dîlana jiyan û hebûna gelekî dikşînin.

Di goşeyek vî welatî de sersala nû di kelegiriya zarokên sêwî û hejar de bi cih maye, şînê dike û reş girêdaye. Ew zarokên Roboskîne ku ji ber qetek nanê hişk, bûne tawambarê herî mezin û bombeyên terora xwe li wan barandine. Bi bihîstina vê nûçeyê sala ji dayîkbûna Êrîş dikeve bîra wî. Dayika wî bi caran jê re behsa komkujiya milê din ê sînor kiribû, ji bo wê jî qet ew roj li bîr nedikir. Gelo îro dîsa dihate dinê, çi dibû, dîsa bêhna sêvên jehrî û laşên parçebûyî dihate pozê wî. Ew bi gelek dergûşên nûhatî re digiriya.

Andok qet nedikarî li wan wêneyan temaşe bike. Qet ji bîr nekiribû kiryarên hovane, weke fîlmekî li ber çavan derbas dibû. Mijangên reş û dirêj dîsa danî ser hev û rondikên dayîkên dil biêş ên vî welatî di nav destê xwe de dihijmart, pêre nedigihêşt, çawa ku qet nedikarî hemû stêrakn bihijmêre.

Şeva gihihêştin hev, şeva tolhildanê bû. Tolhildana birînên nepêçayî. Stêrkên wan cara yekê ewqas bi şewq di ezmanan de dibiriqî. Şeva ku çavên zarokan şaş û matmayî stêrkên wan temaşe dikirin û ew nîşanî dayika xwe dikirin û dayika wan jî dibersivand ku; “ev stêrka bext û mirazê weye!”. Şeva ku hemû gerdûn bi hevre ketibûn dîlana azadiyê û dikirin di pencereya Giravê de xwe berdin xarê, bê ku pasebanên girtîgehê bi wan bihesin. Şeva ku Andok serê xwe danîbû ser bedena Zagrosê û hesretên xwe jê re vedigotin. Qet nedix-

westin ew şev bi dawî bibe. Siya xwe berdabûn ser rûyê partîzanên ku di quntara wan de nobedariya Gever û Amedê dikşandin bêminet.

Şevê navika du lawikên Geverî û Amedî di ezmanan de bi hev re girêdida. Erê zivistanek bi serma û seqem bû zivistana 2012'an, lê kê dicemidî. Kê dil dida sobên xwe pêxe û li dorê rûnê? Ya baş tu li derve bima ji bo hilma germahiya hevdîtina Êrîş û Andok te gerim bikira. Kê dil dida razê û çavên wan di mangeşevê de nebîne. Hemû gerdûn li temaşayê rûniştibûn heta berbangê. Kê dil dida lihêfa xwe li serê xwe bigerîne û dengê kenê wan nebihîze kêliya hevdîtinê.

Ew şev, şeva mirazan bû. şeva serkeftina yekemîn çalakiya gêrîllayek nû gihayî bû. şeva lihevhatinên bêhêjmar bû. Wê şevê hemû li hev hatibûn, şeva dîdarê bû. Şeva dîdara du dildaran bû. Ji wê bû ku xew nediket çavên ti evîndarî. Û roj di kozika xwe de bêdeng rûniştibû û ew şev bi heyranî temaşe dikir. Û difikirî wê çawa wan pêşvazî bike. Hatibûn bibin em û navê ezeztiyê li nav pirtûkên civaknasan de jê bibin heta hetayî. Çawan min ew li kêleka hev dît, bêhemdê min strana Îbrahîm Xeyat ya "Ême Giyanekin" kete bîra min;

Em giyanekin li nav du bedenan de, du ruh di me de bêwateye dema em têne gel hev.

Du stêrk li gel me bêşewqe ger em bigihêjin hev, şev di me de digihêje ezemeta xwe.

Em dilekin di nav du singan de lêdidin.  Em du stêrkin li nav ezmanekî de. Ti şairk me bê hev nake helbesta şevê ji bo dilê xwe.

Ger em li kêleka hev bin, xezel û qesîdeyên dirêj jî têra me nake.

Ti bilûrek nikare awaza bi hevre bûna me lêbide.

Û kes nikare me ji hev veqetîne, kes û kes!

Em zarokên yek axê û yek avê ne. ax û avekî em gihandine hev, kes nikare av û axê ji hev veqetîne, kes û kes!

Em avekin ji yek çavkaniyê diherikin, rêwiyê rêyek, felsefeyek û jiyanekî ne.

Me soz daye, me peyman girêdaye bi hemû nirxên ku em ji bo wan şer dikin, heta em li jiyanê hebin, tenê kêliyekî jî emê bê hev nebin. ken, kêfxwşî û giriyên me yek û ji bo dilekî ye. Canê me ji bo hev e, ji wê ye di hemû tengasiyan de em heyranê hev in. Canek şeydayê canekî û dilek şeydayê dilekî. Ev navê evînek pîroze. Gotina

Viyanê dikeve bîra mirov ku digot; “ez çi bikim Serokê min! Hinek evîndar dibin, destê hev digirin û diçin, ez jî bi agirê bedena xwe asta evîn û hezkirina xwe rave dikim.”

Erê! ruhekî ew di du bedenan de gihandibûn hev. ew ruhê azadî û tekoşînê bû ku ji hezarê salan ve ji rika zilm û desthilatdariyê xwe di hebûna xwe de xwedî kiribû. Dayikekî ew ruh bi çavşîna li ser landika lorîka xwe ve daliqandiye da ku dûr ji hemû çavîniyên neyaran mezin bibe û sitriya bêedaletiyan di çavsoriya wan de bike. Dike lorîn û hewara di qirika xwe de girêmayî di vê çavşînê de veşêre da pêçeka wê fêrî hestên diya xwe bibe. Hestên ku ti destên qirêj li ser negeriya ye. Hestên berxwedêr. Ji wê ye ku hemû dagirker li pey dagirkirina wan hestanin. Dixwazin dest bavêjin hestên bekir û paqij û kole bikin. Ew hestin ku qet nehêştine bibe dîrok. qet nehêştine deng jê derkeve. Lê nezanîne ku ew ruh di hestên bêdeng de veşartîne û wê misoger rojekî serî rake.

Şer, talan û kuştinan li vî welatî ew ruh nekuştiye. Berovajî di her bihosteke vî axî de li cihê ku xwîna her berxwedêreke evîndar, li ser her kevirekî, li ser pelekî, li ser gulek sor û li kêleka kaniyekî hişk bûye, ruhê azadiyê weke gulekî di sînga zinarên asê de şîn bûye.

Ew ruh bi pelên ji daran weşiyayî re, bi barana serbestiyê xusla jiyana azad digire û dîsa serê her buharekî jinûve dibişkive. Ew ruh dibe rengê gula sor. Dibe ser dilka hemû evîndarên ji bêhna axa pîroz mest bûne û di çavên xumarîn de li pey zelaliya jiyanê digerin û ew ruh bi her lêmiştekî re xwe ji nûve diafirîne û di dawiya rêya zelalbûnê de dibe kulmek ava sar li ser destê partîzanekî. Ew ruh destanek bêdawiye di hemû çîrokên şevane yên dayikên me de. Beriya ew çîrok bi dawî biba emê bi xew re biçûyana, ger me zanîba dawiya wan çîrokan, dibe ku êdî şevek din wateya wê ji me re nemaba. Ya rast ew dîrok û destanên nenivîsandî yên welatê me bûn ku dayikên zana ji me re peyv bi peyv vedigotin. Dayika me serê her êvaran dema paşa û qiralên zalim di xewek germ de bûn bi dizîka ruhê dîroka me ya hezarê salan di guhê me de dixwend û zindî dikir…

Û zaroka ku xiyanet li xeyalên zarokatiya xwe nekiriye. Yê ku ji me zêdetir bi barê berpirsyartiya dîroka xwe mezin bû. Ew ruh di wî de ewqas mezin bû ku kite bi kiteyên şîretên dayika xwe kêlî bi kêlî bi xeyalên zarokatiya xwe re mezin kiribû û ew ruh di wî de bû

mîlyon. Gelo sira vî ruhî çibû? Di ku de veşartîbû? Yên nebana parçeyek ji wê rastiyê wê qet bersiva pirsên xwe negirtiban. Navê ruhê di Êrîş û Andok de ruhê berpirsyartiyê bû. Wî ruhî ew ber bi lêgerînan ve biribû, lêgerîna heqîqet û azadiyê. Di wan de wateya Êrîş û Andok yek bibû.

Min bihîstibû êvarekî Êrîş ji Andok re gotibû; “tu gul û ez zinar! Qet tiştek ji bo te zor nîne, heta qelaştina singa min. Gul:

•Qet wusa nebêje, te dilê xwe çirand û rê da min.

•Hêza te ya bişkivînê, ez jî derbas kirim. Ma berê singa min ne qelaştî bû, te ji rika neyaran pehîn li zîkê mirinê da û te silav da jiyanê.

•Ger giraniya te li ser min neba, rika jiyanê di min de çênedibû. Ger tu nebûya, minê ti caran tama jiyanê nezanîbûya. Te ez fêrî jiyanê kirim.

•Dikim avên li ser bedena xwe bi koka te ve berdim, gelo tê bi kulmek ji ava dilê min qayîl bî?

•Wer nebêje Zinaro! Ez bi bêaviya te jî qayîl im. Tenê tu dilê xwe ji min re veke da ku em ji rik û înada mirinê, jiyanê biafirînin.

•Ya! Ez pirsekî ji te bikim.

•Bêje!!

•Çima serê te berjêre? Ma tu ji kê xeyîdiyî?

•Navê min gula Şilêre. Ji min re dibêjin gula xwînî ya Kurdistanê. Ger tovên min bibin li axa welatek din bireşînin, ez şîn nabim, ji wan dixeyîdim, qet serê xwe ranankim. Ji ber ku ev war, tenê warê mine, ev mal, tenê mala mine. Ev çiya tenê stargeha mine. Ez li malên xelkê şîn nabim! Ji ber ku derd û kulên vê axê ruh didin ber canê min. Li cihê ku ez û hevalên xwe şîn bûne, bi qasî hejmara gulbergên me, mirov di axa sar de gevizîne û em li şûna wan bi rengê sor û carnan jî zer derketine.

Gelek pûtînên zaliman di ser min de bihorîn û singa min pelçiqandin lê dîsa min bi biskê bûkên çavbigirî girt û ez rabûme ser rûyê erdê. Min xwe li ser xwe girt ji bo ku dilê wan xweş bikim, ma qet dilê min barîna hêsirê wan radikir? Rondikên li ser hinarokên wan ji min re ava zemzemê bû, min tenê dilopek jê vedixwar û bi ser xwe de dihatim.

Bûkên axê xêliya gevez avêtin ser min û ji min re gotin; “cihê me

bigire!" ez heta îro li benda wan û ji bo wan serê her buharan bejin didim. Heta ew rojekî venegerin ezê serê xwe ranekim û li rûyê ti kesî mêze nekim. Û tenê sînga te cihê baweriyê ye. Dema xwe ji dilê te hildavêjim û serî radikim, dizanim ku tuyê min di xwe de bihewînî. Ya rast ez parçeyek ji te me. Jiyana di te de herçend zore be lê ewqas jî bedewe. Dizanim ku ez ya xwe me û tu jî min ji xwe dibînî, ev tenê bese ji bo em bigihêjin wateya xwebûnê.

•Te koka xwe di canê min de çikandiye, ji wê ye ku em giyanekin. Her çiqas navê min Zinar û navê te gula Şilêr be, lê em ji yek malzarokê ji bo jiyanê serî radikin!.

Ji bo jiyanekî bûne yek û di zivistanek sar de ji bo cara dawî kenê xwe ji me re bi cih hêştin…

# Gotina Dawî, Berfa Dawî

Berfa giran nedizanî raweste. Êdî guliyên daran bi zehmetî xwe li ser piyan digirtin. Pişt qûz kiribûn di bin giraniya berfê de. Te digot qeyê êdî pîr bûne û salên dawî yê emrê wane. Lê wê paşê bi dîtina dîmenên du evîndaran bi ser xwe ve bihatana. Wê ji înada zilma reşemê ciwan û ciwantir bibûna, weke Êrîş û Andok.

Ew wan rojan rêwî bûn. Her carê dema serê xwe ji derî ve derdixistin derve û li berfa zêde temaşe dikirin, bi hevre dikeniyan û digotin; “gelo berf jî dizane emê biçin!” û piştre têra xwe henek dikirin û dikeniyan. Dixwestin beriya biçin çend wêne û dîmenên xwe jî bikşînin. Ji bo wê biryar dan hema di nava wê berfê de çi ji hundirê wan tê bibêjin. Êdî her tişt li wan dihat. Dimeşiyan, meşa wan êdî watedar bibû. Weke barîna berfê qet kenê wan jî nedizanî rawestan çiye. Weke ku bîranînên zarokatiya xwe nû bikin, çend gulokên berfê davêjin hev. Bi rastî jî dunya gelekî sare. Lê germahiya dilê wan qet sermayê nas nake. Destê wan hinekî dicemide, bi germahiya hilma xwe hewil didin hinekî germ bihêlin.

Niha pêwîste di wê sermayê de li hember kamera bisekinin û biaxivin. Ew sermaya meha sibatê bû. dixwestin beriya her tiştî vê reşemehê vegerînin buharê. Beriya ku biçin, dixwestin wêneyekî bi berfê re bikşînin û ew wêne tenê weke bîranînek xweş bimîne û her kes dema li wan mêze bike, tenê bikenin û ji hestên wan yê bedew re çepikan lê bidin. Qet nedixwestin êdî li vî welatî ti kes bîranînek wî ji sir û seqema berfê hebe. Wan reşemeh di wêneyên bîranînê de bi dawî kiribûn û diçûn ku qeşayên wê jî di buharekî de bihelînin. Ji bo wan dema herî zehmet hatibû, wê li hember kamera çend go-

tinên dawî bigotana. Kê destpê bikira? Kê?! Ez yan tu? Ma gelo êdî li cem wan ez û tu mabû? Emê biaxivin, emê biçin û emê bikin! Ji bo wê jî Êrîş bi henekî jî bibe pêşniyarekî ji Andok re dike. dibêje; “tu li pişt min bisekine, tu biaxive ezê jî levên xwe bilepitînim, bêje ku ez Êrîşim!”

•Ya ma ezê çi bibêjim, behsa çi bikim heval Êrîş?

•Hema te çi xwest bêje, ji bo me herdûyan biaxive. ji bo wan zêde negirînge kê çi bêje, girîng ewe ku yek ji wan tenê biaxive. Di dawiyê de Andok diçe pişt Êrîş xwe vedişêre, ji xwe bejna Andok ji Êrîş kintir bû ji bo wê jî fikrek baş bû, heval Andok qet xûya nedikir. Wan li wir provaya bi hevrebûnê dikirin. Ji ber ku dema cara destpêkê Andok li pişt ve diaxivî, Êrîş pêre nedigihişt ku lêvên xwe bilepitîne. Fikrek din; “tu hêdî hêdî biaxive, ji bo ez bi te re bigihêjim”, Êrîş vê yekê dibêje û li bendê dimîne ku Andok biaxive. Andok jî dibêje: “başe lê pêwîste dengê te dernekeve ji bo ku dengê min bê.

Û dest pêdike; “heval navê min Êrîşe, demeke dirêje em di kar û xebatên partiyê de cih digrin. Rastî jî me pir biriya malbata xwe kiriye!” ev tenê henekek bû û herdû weke ku ji xwe re mîna zarokekî dileyîzin, dikenin û ew dîmenên wan li ber çavên me her dimîne. Ew wêneyên herî şênber ê hevaltî û yekbûna wan a ruhiye. Ew dîmen îfadeya herî ber biçav a ruhê fedayî ê Rêber APO ye ku di wan de wate digire. Piştî vê heneka watedar êdî herdû disekinin û ji kamera re çend gotinan dibêjin ku mirov behs neke wê kêmahiyek be.

Andok: “heval weke ekîbekî ez û heval Êrîş ji bo karekî hatine erkdar kirin, min heval Êrîş berê nas nedikir, tenê me navê hev bihîstibû! Baweriya min bi heval heye. Ez ne bawerim di warê bi hevre yekbûnê de jî ti pirsgirêk derbikeve.” Û bi henek wuha berdewam dike:“derveyî pirsgirêka bejnê wê ti pirsgirêk dernekeve, ji xwe min jî kesekî li gor bejna xwe jî nedît!” û dîsa hinekî disekine û dibêje: “demeke em bi hevre ne, dan û standinên me çêbûn, me li ser kar û çawaniya çalakiyê bi hevre nîqaş kir. Me hevdû baş nas kir. Di rêhevaltiya me de tenê di mekanekî de bihevre jiyan kirin, nayê wê wateyê ku tu bi hevre hevaltiya rast dikî. Ger mirov ruhê fedayî di kûrahiya dilê xwe de jiyan bike, qet pêwîst nake mirov li gel hev jî bibe, dibe ku mirov dûrî hev be jî lê mirov hevûdû his dike û heman

tiştan difikire. Bêguman hevaltiya me hevaltiyeke pir bi wateye û wê bi serkeftî jî derbas bibe."

Andok dîsa bi henekî: "ez ji Amedê me û ew jî ji Geverê ye, du paytext êdî ez nizanim wê çawa çêbibe! heval Êrîş pirsgirêka dernaxe, ew jî ji Amedê bawer dike." di vê navberê de hertim li çavên hev mêze dikin û rûyê wan weke ku her kêliyê nû hatine gel hev û hevûdû dibînin, geş dibe. di vir de êdî Andok bûye Amed û Êrîş jî bûye Gever. Û ew jî di vê zanebûnê de ne. Ji wê ye ku Andok dibêje; "heval Êrîş ji Amedê bawer dike!" ango ji min bawer dike. ew baş dizane ku rastî û parçeyek ji Amedê ye. Ew di Amedê de û Amed di wî de veşartiye. Ev di heman demê girêdana wan ya ji axê re jî pir eşkere radixîne ber çavan.

Di rêzikên gotinên wan de girêdana bi Rêbertî, partî, hevalan û axê bi qasî ku hunermendek, helbestvanek nekaribe bi qasî wan bi hostatî bîne ber hev û yek bike, veşartiye. Di awirên çavên wan de kêliyên ewqas bedew tên jiyan kirin û jiyan dikin ku ti resamek nikare sira di awirên wan de kişif bike, perde jê veke û bineqişîne. Ew awir tenê di wêneyê wan de maye û bes. Ya ji temaşevanên wan wêneyan tê ewe ku tenê li wan temaşe bikin û li pey kêliyên bêmînak bigerin. Ew dîmen weke hemû dîmenên vê şoreşê ya destpêkê û ya dawiye ku tê de dubare tineye. Ew kêlî dubare nabin, tenê em dikarin dubare dubare temaşe bikin û bîranînên wan zindî bihêlin.

Andok di dawiya gotina xwe de Amedê di hundirê xwe de jiyan dike, lê behsa Geverê dike. Ewqas dilnizime ku ji bo dilê Êrîş behsa Geverê dike ne Amedê û wuha berdewan dike; "dibe ku ez ji Amedê bim lê Gever pir cudaye, hem ji bo gel û hem jî ji bo gêrîlla xwedî ciheke taybete, cihê serhildanane!". Vê gotinê dibêje û bi ken berdewam dike: "em ekîbek başin."

Gotina Andok, hez û evîna şehîd Derwêş ji Gevrê re dixe bîra mirovan, çawa ku digot; "dema ez di nav bajarê Gevrê de derbas bûm, min xwe di dilê Kurdistanê de his kir!" Êrîş di wê kêliyê de, serê xwe bilind dike û li ezmanan temaşe dike, tu dibêjî qeyê deryayek spî li jor heye. Di vê deryayê de wêneyê kenê Derwêş dibîne. Di dilê wî de ev tişt derbas dibe; "dema tu di bajarê min de bihorî, weke ku leşkerên evîna mezin di ber dilê min de bihorîn di wê kêliyê de heval!" Andok Berfa di bin lingê xwe de hêdîka ditepisîne û serê

xwe radike û li Êrîş mêze dike. dîsa ken di rûyê herdûyan de şewqa xwe dide ser berfa spî.

Êrîş herdû destên xwe gihandine hev û pir bi hûrmet li hember Andok sekiniye û wî guhdar dike. xwe ditewîne û hinek berf ji erdê radike û di destê xwe de dibe û tîne. Ji destên wî ê sor ve diyare ku gelekî cemidîne lê qet bi xwe nahese. Weke ku di destê wî de ne berf, xweliyek germ heye ku pê dileyîze. dema gotina Andok bi dawî dibe, Êrîş destpêdike çend gotinan bêje;

"Hestên me herdûya weke hevûdûye." Ew jî weke Andok heman hestan jiyan dike û wuha dibêje: "me berê hevûdû nas nedikir, hevalan wezîfeyek danîne pêşiya me, ez ji heval bawerim ku bi hest û xwerêxistiniyeke bilind beşdarî vê wezîfeyê bibe." Di van gotinan de ruhê berpirsyartiya li hember wezîfeyan gelek baş diyar dibe. Di van demên kurt de baweriya wan ya li hember hev ewqas zêde bûye ku êdî pir bi hêsanî dikarin ji hev bawer bikin. Gelo sira vê baweriyê çiye ku ew ewqasî nêzî hev bûne. Ji xwe Êrîş bersiva vê pirsa me hema dide. Wan di hestên xwe de yek hêvî û bawerî afirandine. Di hestan de bûne yek û paşê di rêxistiniyeke herî jor de nav li serkeftina xwe ya demê kirine.

Û Êrîş gotina dilê xwe gelekî bi nazenînî vedibêje; dîsa bi rûkeniyeke watedar dibêje: "heval Andok hinek tişt ji bo Geverê got lê" û destê xwe daydine ser dilê xwe û berdewam dike: "dilê min Gevere lê Amed paytexte!" qet nikarim vê gotinê şîrove bikim. Paytexta dilan li ku û çi dibe bila bibe, xwediyê wî dilî bi xwe dizane, emê sînorên wê paytextê ji bo wî dilî serbas nekin. Piştî vê gotinê herdû ewqas ji dil dikenin, weke ku êdî ji me re bibêjin; "em paytexa dilê hevin li hemû welatê evîndaran!" Êrîş dîsa bi henekî dizivire û li Andok mêze dike û dibêje: "dibe ku heval kesek li gorî bejna xwe nedît lê bejna me yeke!" ger bejna wan wek hev nebe jî lê ew gotin hema wan li ber çavên me dike yek. Qet em di wê kêliyê de nafikirin yek kurt û yek jî dirêje. Di vê navberê de Êrîş dîsa soza xwe nû dike: "tiştê ji destê me bê emê ji hêza xwe zêdetir bikin". Ev gotin, gotina Zîlanê dixe bîra mirov ku; "ger tiştek ji canê min zêdetir hebûya, minê ew jî feda bikira!"

Û dibêje: "emê serbixin!" Andok hema dikeve navberê û bi henek weke ku pir bê sebir be: "ger rê vebe emê zû biçin." Lê Êrîş qet di

henekan de kêm nayne û dibêje: “lê hinek pirsgirêkên heval Andok hene, ez dixwazim li pêş kamera jî bibêjim!” Andok baş dizane ku ew dîsa henekan dike û bi henekî dibêje: “başe bêje!” herdû dîsa bi dengekî bilind dikenin û Êrîş bi destê Andok digre û wî radike, ji ber ku ji ber kenê zêde hema Andok dikeve nava berfê.

Êrîş berdewam dike: “ez henekan dikim, em li kuderê bibin, emê hevaltiya Rojê bidin jiyan kirin, heya ji destê me were jî emê ji kêmahiyan birevin. Ger heval Andok weke rêxistin bi min re be, wê ji min re wusa were weke ku ez li cem hemû hevalan im û hemû hevalan di dilê xwe de jiyan dikim.”

Di dawî de soza xwe ya ji bo pêkanîna erkên li pêşiya xwe nû dikin û bi gotina “SERKEFTİN” bi hevre dirûşmeya “BİJÎ SEROK APO” qîr dikin. Dengê dirûşmeya wan bêdengiya berfê dişkîne. Ji nişkave hemû ruhber ji xewa giran diveciniqin. Axa di bin berfê de nixumandî, wê biriya dengê dirûşmeya wan bike. Xweziya xwe bi berfa di bin lingê wan de tîne û ji xwe re dibêje: “xwaziya ez li şûna te bama, minê ew qedemên pîroz li ser singa xwe ji bo cara dawî ramûsanda. Minê ji bo cara dawî şûnpêyên wan li ser singa xwe bineqişanda, bila biba dîrok, bila biba rastî û bila biba neqşên yadigar li ser hemû parzemînan. Minê li cihê ku ew herdû rawestane û çend gotinên xwe bi rehê min ve berdane, mêhvandariya du darên spîndarê bikira. Gotinên wan ruh daye hebûna min. Kenê wan dilê min serxweş dike. Herçend di navbera min û wan de qeşayên berfa reşemehê Bekoyê Ewane lê em her ew Mem û Zînin.

Em her evîndarin, ma kê me ji hev veqetîne. Ew evîndarê axê û ez evîndarê wan şoreşgeran. Ew ez û ez ew! Em bi hevre dibin rastiyek ku jê re dibêjin rastiya Kurd û Kurdistanê. Rastiya me xareke di çavên neyarên Kurdistanê de diçe.”

“Ez, ez! darên li dor wan, we ez ji bîr kirime. Ez jî wê rojê bûme şahidê evîna wan. Xweziya we halê min yê wê demê bidîta. Xwaziya we bizaniya min di bin barê berfa giran de çiqas biriya pelên şîn ê dilê wan dikir. Min çiqasî biriya keskahiya dilê wan dikir. Ew bi perdeya ji berfê ya li ser rûyê min hesiyabûn. Ew pêhesiyabûn ez jî di hesreta dîtina buhara sîmayên wan de rojên xwe dijmêrim. Wê kengê bibe buhar û ez jî rengê xwe nîşanî wan bikim?

Ez jî bibêjim ez heme. Ax… sed heyf û mixabin! Wê zû biçin û

wê nebînin ka ezê çawa di buhara hêviyên wan de şîn bibim û gul vekim ji bo hemû bedewiyên di nepeniya rûçikên wan ê narîn de. lê li gel hemû berfa li ser pişta min dîsa jî ew keskahiya evîna min li hemberî xwe dibînin. Ji ber ku berf û zivistan ti caran li welatê dilê wan warê xwe daneniye."

"Û ez roj! Dibe ku di wê kêliyê de ez di wêneyên wan de xûya nakim lê nehesibînin ku ez ne bi wan re bûme. Leşkerên tîrêjên min li pişt ewrên reş û tarî senger girtine, wê nehêlin ti bayek bêbext xemên xwe li ser kenê lêvên wan dayne. Û ez ew rojim, ez bi wan re li welat hilhatim û bi wan re jî çûme ava. Min ew berbangekî kirin mêhvanê kozika partîzaniya dilê xwe û em şevekî çûne mêracê, ezmanê heftan!

Em bi hevre li pey Giravekî digeriyan. Em bi hevre li pey heqîqetekî digeriyan. Ax… xwaziya we halê wan yê wê demê bidîta. Ew diçûn Rêber APO bibînin. Ji xwe çûbûn. Em bi hevre bibûn mêhvanê Îmraliyê di berbangekî de. ew bibûn tîrêjek sotîner di derza dîwarên ku neyaran navê hêz û ferdiyetparêziya xwe lêkiribûn û qaşo wê pirtikek jî jê derbas nebûya, ji ber çavên wan ê beloqî û xêrnexwaz ramûsanek li xeyalên pîroz dabûn. Ma kîjan dîwar wê evîna wan li pişt xwe bihîşta? Ma kîjan dîwarê veqetînê dikarîbû di navbera wan û Rêbertî de bibe Beko?!"

# Jina Dayîk

Li pey serpêhatiyekî hatibûn. Di şûnpêya gelek jinên xama û berxwedêr, jinên ku di cewherê berxwedaniya wan de welatekî li ber xwe dabû de berê xwe dabûne çiyan. Di himbêza çanda jina dayik de mezin bibûn. Jina pîroz ji mêjve şîrê xwe li wan helal kiribû û tasek ji ava keramet û zanayiya xwe bi şûn wan de li ser erdê reşandibû. Hêj nema ava destê wan zaneyên veşartî ji rûyê erdê zuha nebibû. Vegeriyabûn û bi caran di nav çavên wan de li dîrokek wenda geriyabûn. Weke ku her ji xwe bipirsin; ev dîrok li ku bi cih maye? Qet bersiva pirsa xwe negirtibûn.

Dema şîr ji singê dayika xwe dimêjandin, dîsa li nav çavên dayika xwe dinihêrîn. Çima ewqas melûle ev çav dayê?! Û dayik bêdeng bûye, gelek sal li ser bêbersivmayîna van pirsan ve bihoriye. Tenê dema tama rondikên dayika xwe bi şîr re ditemijandin, weke rastiyeke bi êş dadiqurtandin kul û keserên dayika xwe. Ew jî di wê emrê xwe yê gelekî biçûk de.

Soz dabûn jina dayik ku di roja 8'ê Adarê de ji wan re bibin çalakiya herî bi girseyî. Soz dabûn ew jî bibin bedena ji agir di fabrîkayên Şîkagoyê de. Soz dabûn di wê rojê de bibin serhildana wan ya desepêkê. Ji ber ku dema xwedawendan nefesa dawî dikşandin, di malzaroka bi şûnde mayî de hêdî hêdî ruh li ber wan diket. Hêj cenînek sê rojkî bûn, tama bi jehir a şikestina yekem bi dayika xwe re temijandibûn.

Ti carî tama devê wan şêrîn nedibû. Ji bo wê dema her êvaran li çavên westiyayî ên dayika xwe dinihêrîn, şopên vê şikestinê gelekî baş di wan de dixwendin. Her ku di awirê çavên wan de kûr dibûn, ew rastî baştir fam dikirin. Ji wê bû ku Êrîş di çavên dayika xwe de

şewqa xwedawendên Zagrosan dîtibû û qet jê têr nedibû. Di bejna dayika xwe de heybeta wan peyda kiribû û eşqa dayikê ew ber bi Zagrosan ve anîbû.

Hatibû ji kevirên Govendê bibipirse bê ka heybeta dayika min?
Hatibû ji spî berfa Çarçêla bipirse bê ka rengê dayika min?
Hatibû ji şînahiya Gola Satê bipirse bê ka bêdawî bûna dayika min?
Û hatibû tola vê şikestinê ji qiralên bêmaske bigire.

Ji wê bû ku Andok di hestên dayika xwe de ber bi çiyan ve gav avêt. Û herî dawî ev gotin li ser lêvan herikîbû, ji bo bermahiya xwedawendan a çavşîn:
Ey jina Kurd! Tu qet stuxwar nebûyî li hember zaliman. Te her li ber xwe da. Dibe di destê te de çek û bombeyên îro nebû lê te bi evîn, çand û zimanê xwe şer kir, jina ku ji xweliya xwe, peyda bû û vejîn da. Tu her tu bûyî, ya xwe bûyî. Te êşên herî mezin di singa xwe de mezin kir lê tu bi wan têk neçûyî, tu neketî.
Tu bûyî evîndarek lê tu xapandin bi derewan tu kirin metayek û dest avêtin bedena te! Dayika min! Tu her bi min re bûyî, di hemû kêliyên şerê min de û ez di hundirê te de şer dikim, ji bo te şer dikim. Tu hestekî ji hestên hemû dayikan. Ya rast ez hinekî jî çalakiya te me!”

Gelekî dixwestin di vê rojê de bibin qêrîna jinan. Ji ber ku wan di çalakiya evîna ji jiyanê re xwe nas kiribûn. Di dirûşmeyên azadiyê de li pey wendahiyekî digeriyan. Pir caran dema bê xem di ber de bihorîbûn, jiyan bêwate dîtibûn. Jina ku li jiyanê xeyîdîbû li çiyan ji wan re bibûn çavkaniya jiyanê. Şerê bê eman ê dayika wan li van çiyan wate digirt û ew jî dildarek vê şer û tekoşînê bûn. Ango dildarek şerê dayika xwe.
Di guliyên her jinek gêrîlla de rêya jiyanê dinasîn û xwe pêre berdidan. Di her dilopek xwêdana wan de berxwedana hezarê salan didîtin. Êdî carekî serî danibûn ser rêya heqîqetê û dest bi meşa hezarê salan kiribûn bi jina dayik re, êdî wê ne di rojek Adarê de, hemû demsalan de diherikîn di koka dara azadiyê de. Û jina dayik bibû hemû demsalên wan.

# Nîsan

Êrîş û Andok ji meha Sibatê ve ji cihê xwe derketibûn. Li bendê bûn ku biçin. Herdû bi tena serê xwe li cihekî dimînin. Qet ji kesî re jî nabêjin ka wê bi kuve biçin. Êdî Sibat û Adar li ser wan de bihorî bû û ketibûn Nîsanê. Rojeke Nîsanê bû. te digot qeyê hemû ruhber ji nûve divelidin. Te newêrîbû bimeşî. Erdê di bin lingê me de jî hêj di pêçeka sêwîtiyê de hêdî hêdî çavên xwe li jiyanê vedikir. Tu digihîştî çi û kîjan ruhberî navê xwe li ber guhê te dixwend. Ew deng lihev hatibûn û bibûn rîtmek ku mirov hema dixwest bê rawestan li ber dîlanekî bigerîne, heta ku şev ji me re bêje bese.

Ew roj ji bo Êrîş û Andok jî gelekî taybet bû. êdî hêdî hêdî berf diheliya. Ev mizginiya vebûna rê û çûyîna wan bû. Te digot qeyê ew jî di wê rojê de hatine dinê. Weke ku nû ji malzaroka dayika xwe xuliqîbin, şaş û maşo li derdora xwe mêze dikin û heta ji wan tê, ji bo hesreta dîtina axê, lingê xwe li singa erdê didin. Axxx… gelekî biriya vê axê kiribûn. Weke her salê di wê rojê de pêwîst bû ji bo Roja xwe daran biçînin. Ji ber ku ji wê rojê şûnve, fêrî ked û hezkirina xwezayê bibûn. Ji wê rojê şûnve fêr bibûn, bi hemû berfînan re bikenin, bê ku piyê xwe daynin ser, li kêlekê ve bi nazenînî derbas bibin. Ji wê rojê şûnve, bîranînên xwe yên zarokatiyê carek din dianîn ber çavên xwe. dema ku ax dixwarin lê ji ber ku nedizanîn dora devê xwe baş paqij bikin, dayika wan fam dikir ku ax xwarine û li wan dida. Lê roja din hema ji bîr dikirin û dîsa diçûn û ax dixwarin, gelo çi tamek di vî axî de hebû? Gelo li deverên din ê dunyayê jî zarok axê dixwun yan tenê zarokên gundê me wusa dikirin. Ji xwe re behsa wan bîranînên xwe dikirin û têra xwe dikeniyan.

Dema dikeniya ev jî kete bîra wan ku ger ev roj neba, wê qet nehatana gel hev û wê hevûdû nas nekirina. Wê qet îro ewqas nekeniyana. Bi carekî xemek li ser rûyê herdûyan rûnişt, bi hevre axînek ji kûrve kişandin û serê xwe xistine ber xwe. Ji hev re negotin lê di dilê wan de ev yek derbas bû. kesê ev roj ji me re xelat kir, gelo îro çi dike? gelo ew jî weke me çûye heta rojên zarokatiya xwe. Weke ku bersiva xwe girtibin, herdû bi hevre serê xwe radikin û li hev mêze dikin û bi nîv kenekî awirên wan di rûbareke biçûk ku di ber wan de derbas dibe, dialiqe. Ew niha di zaroktiya xwe de, zaroktiya me hemiyan jiyan dike. Û em îro ji bo hemû xeyalên wî yên bedew ku qet qirêj nebûne, daran diçînin.

Di vê navberê de hevalek tê û bêr û guling li ser milê wî, bi ken nêz dibe û dibêje; “rojbaş hevalno, hûn çi dikin?” dema wan ew heval dîtin, hema xeyalên xwe di goşeyek dilê xwe de hiştin û bi hevre rabûn ser xwe. Ew heval ji ber ku hinekî dereng hatiye, lêborîna xwe ji wan dixwaze. Lê ew dikenin û bi hev re dibêjin; “baştir bû!”. Êrîş hema xwe digihîne wî hevalî û guling ji destan digire û dest bi kolandina cihê daran dike. Andok jî bi lez bêrê ji erdê radike û dixwaze axa ku Êrîş kolaye, bavêje aliyekî.

Beriya ku biçin, dixwazin ew jî darekî ji dara azadiyê zêde bikin. Ji bo wê gelekî bi heyecanin. Ger şitil heba wê li hemû cihan dar biçandana. Ji wan re du şitil hatibû. Herdû şitil jî weke hev bûn. biryar girtibûn herdû şitlan jî li kêleka wê rûbarê biçînin ku li hemberî hev bisekinin û li hev mêze bikin û wusa jî kirin. Û piştî ew ji wir çûbûn, dara wan mezin bibû û pel dabû. Dara Andok kurt bû û dara Êrîş jî dirêj bibû! Weke wan bejin dabû. Gelo wan daran jî dizanîbûn ji bo kê şîn dibin û pel vedikin.

Giyanê wan di wan daran de bi cih mabû û wan ev baş dizanîbûn, di dema ku me qet nedizanî di rehê her darekî de bi hezaran giyanê mirovahiyê veşartiye. Piştî ku darên xwe çandin, çaydana xwe ya reş danîn ser agir û li dora agir li benda çayê man. Di wê navberê de nemnema baranê li ser û rûyê wan da. Qet li cihê xwe neliviyan. Baranek ewqas bi hêz nebû ku ji ber birevin. Her dilopek baranê li ser rûyê wan diket û ew bi xwe re dibirin. Bê ku ji hev re bibêjin ev yek di dilê wan de derbas dibû;

Êrîş: “Ez helbest û tu baranî.
Piçkên te dipekin ser çirûskên agir û ez diveciniqim,
Serê xwe radikim, dibînim bûme helbestek li ber çip çipa dengê te.
Tu ji ewrên avisî dibî dilopek ji hezkirin û di ser min de dibarî,
ji wê ye ku dibim peyvek hestiyar li ser lêvên bi ken.
Dibêjin rengê baranê, rengê helbestê jî diguherîne.
Tu baran û ber bi min ve têyî
Û ez bi boneya hatina te dibim êvare şêirek li ser mangeşevê.
Dibim gotinek li ser mûmên şeva mizginya te, pêxistî.
Hemû şair di bin baranê de, dibin şair.
Çawa ku şair dibêje;

“sîwanên xwe bigirin û bê wê biçine bin baranê,
Di bin baranê de çavên xwe bişon, ji xem û xumarînan
Di bin baranê de evîndar bin û bûseyekî ji xwenavê bitemijînin,
Sîwanên xwe bigirin û bê wê biçine bin baranê,
Di bin baranê de hez bikin, bê minet…”

Tu dibarî li ser deftera dilê min
Û ji bêhan dilopên te dibim helbstek şevê li ser lênûsa evîndarekî heval.
Ji bêhna xwenavên te sermest dibim û di qirika bilbilan de dibim melûdiya evînê,
Derdikevim serê her sibehan.
Dibêjin baran gelekî nêzî rastiyane, nêzî heqîqetê ye.
Ji ber piştî her dildagirtiyekî, dibe rondikek ji bêhnfirehiyê li ser rûçikên diltengî û tenhayî yê.
Piştî her qêrîn û hawarekî, dibe awazek aram li ser dil rûdinê.
Piştî her mij û moranan, diçilvilin gul û nergisên stûxwar.
Tu baran û ez helbestek heval!”

Û Andok weke ku giliyan bike: “Na na… yê ku min li pey xwe dibe û dike baran tûyî.
Ji ber tu hez dikî û ez dibarim, tu ferman didî û ez pêk tînim.
Tu baranê dikî baran, ger tu neba qet kesî ewqas bi bedewî wesfa min nedikir.

Yê bigotana “aveke ji jor ve tê xwarê û bereketa xwedêye.”

Lê te ez danîme kêleka xwe, ez di hestên te de dibim ez.

Te wer kiriye ku evîndar ji bo bibin parçeyek ji te, ji min hez dikin.

Ji bo di bin nemnema min de şil bibin, di ber ziraviya dilê te de dibihorin.

Û ez baran û tu helbestî…

Ger deftera dilê te nebe,ezê xwe li ser çi bizelînim û bibim peyv?!

Ger şeva te nebe, ezê çawa li ser lênûsa evîndarekî birûnêm û bibim tu!

Ger êş û sermestiya te nebe, ezê çawa bibim xwenav li ser gulxunçeyan.

Ger awaza te nebe, ezê çawa bibim dengê bilbilan.

Û heta tu dilteng nebî, ezê çawa fêrî bêhnfirehiyê bibim.

Heta tu tenê nemînî, ezê çawa bibim rondik.

Heta qêrîna te nebe, ezê çawa fêrî bêdengiyê bibim.

Heta tu nelivî di rehên kulîlkan de, ezê çawa bibim keskesor heval?

Ez baran û tu helbestî heval!”

# Dunyayek Azad

Ger di dunyaya me de kes bi peyva azadiyê re aşina nebe, wê demê mirovahiyê her di çolên rût û tazî de li pey xwe bigere. Ji ber ku êdî ew dibe serabek bêdawî li pêşya wê. Mixabin îro dema mirovahiyê xwe dît, qet xeyal nake ku ew “ez” ew bixwe ye. “Ez” di ferdiyetparêziyeke herî rezîlane de bi dawî bûye û ji xwe derketiye. Êdî mirov bi xwe jî nizanin, ayîdî kîjan”Ezî” ne. Nizane lê her li pey digere. Tenê li pêşiya xwe serabekî dibîne ku her digihêjê û bi tenê dimîne. Ev dunyaya me ye ku qet rojekî me bawer nedikir, hemû hestên me bibin siyek ji hestên me yên heqîqî. Lê hêj hene kesên ku ne li pey siya xwe û şebehanin belkû li pey hestên rastîn û heqîqîne.

Axxx… xweziya hemû gelên li ser bedena parzemînan tenê carekî bi hevre his bikirina ku ji bo hev jiyankirin çiqas hestek xweşik û bedewe. Xweziya carekî herkesî çavên xwe bigirta ku bi hev fikiriyaban. Xweziya me hemiyan bawer bikira ku em hemû em in. Wê wextê meyê hemû “Ezeztî’yên xwe daba bayekî bihêz bila ji gerdûna me dûr bixista. Bila di dunyaya me de zarokan qet xwe fêrî alfebeya ferdiyetparêziyê nekirana. Xweziya di dersên matematîkên me de ti caran du di du de nebûya çar. Xweziya di dersên dîrokê de em qet fêrî sînor, şer, desthilatdarî û înkar û tinekirinan nebûna. Xweziya di dersên wêjeyê de em fêrî du beytiyên Baba Tahir û Xezelên Ehmedê Xanî bibana. Xweziya di dersa coxrafya de me li ser lênûsa xwe sînorên Bakûr û Başûr xêz nekira. Xweziya di dersa civaknasiyê de em fêrî cinsiyetparêzî û koletiyê nebana.

Û xweziya em ya xwe bana. Xweziya me ne tenê ji bo xwe, me ji bo mirovatiyê li ser texteya reş wêne bineqişanda. Xweziya em

bibûna wênekêşê hemû sîmayan. Meyê hemû bedewiyên di mirovan de keşif bikira û bi nazenînî birijanda ser tabloyên wêneyan. Meyê pêşengehek ji wan tabloyan vekira û li ser deriyê wê binivîsanda "buhaya van tabloyan bi qasî kenê li ser lêva weye!" Wê demê herkesê biba xwedî bedewiyekî û kes ji ya din xweşiktir û zêdetir nedibû.

Resimandina tabloya dunyayek bi vî rengî ti caran ne xewnek bûye. Lêgerên jiyanek wusa di berdêla wê de canê xwe jî dane. Ger evîna vê jiyanê neba Hz. Eyûb bi salan birînên xwe ji însafa kurman re nedihîşt û emê jî îro fêrî dersa sebirê nebûna. Ger hezkirina mirovahiyê neba Hz. Îsa nediçû çarmixê. Ger hesreta baxçeyê ronahiyê nebûya, Manî ewqas êş ji canê xwe re rewa nedidît.

Ger evîna jina zane ji zanist û felsefeya jiyanê neba, Hîpatyayê singê xwe li hember kevirên nezanî û koletiyê rast nedikir û bi wêrekî ber bi mirinê ve nediçû. Û ger ruhê berpirsyartiya dîrokê nebûya, Kemal Pîran canê ciwan ji mirinê re ranedizandin û bi dilê xwe şerbeta şehadetê di berdêla jiyana azad de nedikşandin serê xwe. Ger ruhê berxwedaniya gelekî bindest di dilê xwe de nehewanda, Mezlûm Doxanan bi agirê sê niftikan dîlana roja nû nedigerandin, ji bo buharek zûwext dawî li şevên sar û dirêj bîne. Ger hêrs û kîna li hember xiyanetê nebûya, Bêrîtanan li kêleka zinaran li ser perê qasidan ber bi azadiyê ve nedifiriyan.

Ger evîna jiyana azad neba, Zîlanan bedena xwe parçe parçe nedikirin.

Erê Zîlan, keça Dêrsimê! Dema navê te tê bîra min dikim qêrîna di qirika xwe de ji dengê bayê azadiyê re berdim û heta ji min tê qîr bikim û qîr bikim. Ax! lawikên Amedî û Geverî bibûn dengê ku di qirika min de asê mabû û dernediket. Gava min kir biqîrim, dengê kenê wan di guhê min de zinge zing dikir.

Zîlan li ser axa ku mirin tê de razaye, derdikeve rêwîtiya jiyana ebedî. Xwedawenda ku serwera jiyanê ye. Dibêjin hestên şoreşgeran wek heve. Ji ber ku wateya jiyanê li gel wan heman tişte, gotinên li ser lêvên wan dirijin jî yek û dengê di qirika wan de bi yek rîtmê sirûda azadiyê qîr dike. Gelekî balkêşe! Ew hemû jî behsa jiyaneke azad û watedar dikin. Ew jiyan di ku de veşrtiye? Yan jî ew jiyan di ku de bi cih maye? Kê û li ku li pey wê jiyanê digerin? Gelo her ji-

yanek di wateya xwe ya rastîn de tê jiyankirin?

Û me behsa xweziyên jiyanê kiribû, we dît çiqas xwezî di dilê me de mane û gelo kê bersiva van xweziyan daye? Carnan hinek ji hinekan re dibêjin; “xweziya jiyana te, tu çiqas bextewerî!” û bi lez bersiv tê; “kê? Ez? bexteweriya çi? xweziya filan kesê!” niha di vir de herkes li pey jiyaneke herî xweş û bi şadkamî digere. Lêgera jiyana bedew herdem di mirovan de bûye weke rêgezeke sereke a jiyanê. Werin îcar pirs bikin û bibînin ku ji bo vê jiyanê çend evîndaran xwe di agirê heza jiyanê de şewitandin.

Tê bîra min dema em zarok bûn, em di leyîstokên xwe yên zarokanî de jî li pey ya herî baş digeriyan. Wey xwedêyo! ji bo ku malmalokên me yên biçûk ji hevdû xweşiktir bibe me çi dikir û çi nedikir. Hêşta di wê demê de em di pêşbirkeke mezin a avakirina jiyana herî bedew de bûn. Di van pêşbirkan de ku hinekî jî dişibiya pêşbirka çetîn a jiyanê, me ti caran dilê hevûdû nedihîşt. Ji ber ku me dizanî, herkes ji bo ya herî bedew şer dike. Û xweziya em ewqas mezin nebûna û şerê me jî ji me mezintir nebûya. Her ku em mezin bûn, me dilê di singa xwe de biçûktir kir û bi carekî me dît, êdî ew jî ji mêjveye ku ji me xeyîdiye û pişta xwe daye me.

Dilê me ji me xeyîdiye! Hema em bibêjin jiyan ji me xeyîdiye, baştir û rastire. Jiyana rast û pak di wan malmalokên me yên biçûk û ji herriyê çêkirî de bi cih ma. Û em hêjî dibêjin; xweziya wê jiyanê! Û dengê kenê Êrîş û Andok li ber guhê me wateya jiyana azad qîr dikin. Jiyana azad di rûyê Êrîş û Andok de diteyîse û şewq dide. Dema mirov li rûyê wan temaşe dikir, di hemû qermiçokên rûyê wan de rêyek ji bo gihiştina azad misoger heye. Qet di rûyê wan de bêhêvîtî tine û nabe jî.

# Gulan

Gulan, meha gul û nergizan, beybûn û rihanan. Serî rake, pûtînên zaliman li ser bedewiya xwe bide aliyekî û xwe li dilê kevir ê dagirkeran bide û şîn be! Rengê te dixemilîne bejna partîzanan, ew xwe li keskahiya hestên te didin û ber bi cenga pîroz ve gav davêjin. Diçin bibin nifşê xwedawendên serdema nû. Gulan, meha şilêrên serbejêrên welatê min, dibihorin refên cengaweran li ber tenhayiya dilê te ve. Gulan, tu meha rengê gula sorî, tu rengê xwîna bi hezaran pakrevanayî. Rengê te wek sirên kifşnebûyî li dawiya her buharekî rûpelek nû li dîroka şoreşê zêde dike. Tu ew mehî hemû evîndaran ji zivisanek dirêj û sar ve xwe li benda hatina te ragirtine. Di salnameya şoreşê de berê hemû evîndaran li ser te bûye. Hemû demsal xibteya te dixwen û dibêjin; “xweziya em li şûna te bana.” Ez jî xweziya xwe bi te tînim, Gulanê.

Tu zanî tu serdilka hemû demsalanî li gel şoreşgeran. Ji bo bigihêjin te, bêsebir in. Dema çûne ber sêdareyê, navê te anîne herî dawî, meha pîroz! Ji bêhna gulên te sermest bûne û qet neketiye bîra wan li ber sêdareyê ne.

Tu ew baxçeyê di bin mencenîqa agirê kuştina Hz. Îbrahîmî ji wan re. Ji wê ye ku bê tirs serê xwe dibin ber kinifa neyaran. Rûçikên xwe ji nesîma te re vedikin, dizanin ew nesîm ji rêkek dûr ji wan re tê û tije gotine ji wan re. Tu destê qelişî û pînekirî ê karker û cotkaranî, qet rojekî ji halê xwe gazincan nakî.

Tu bejna Denîzî qet li te nayê serî bitewînî, destê te di kelpçeya milîtarîzmê de hilnayê, serbilind û azadî. Tu xala li ser eniya Şêrînî,

qet jê naçî, bîranîna jina dayîkî. Tu wêneya çavên masûm ê Elî yî li ser bedena Bîstûnê, weke Ferhad qet nawestî. Tu dilê Ferzadî di nav dilê hezaran zarokan de hildavêjî, kêliyekî nasekinî. Tu dilê Ferhadê bavî, ji bîr nakî sê pepûleyên li goşeya bexçeyê xwe. Tu dengê şîva û resena Mizgînî, hêjî wek xwe yî. Tu tenha roja li ezmanê Semayî, qet zagona xwezayê binpê nekirî. Tu biryardariya Heqî yî di destpêka rêyek çetîn de.

Tu pepûleya emrê Zîlana ciwanî li ser kela Dimdimê. Tu gorên bênavî, li her bihosteke vî axî. Û hêj tê bibî gelek serpêhatî. Hêj tê binivîsî gelek destanan li ser pelên xwe. Kes ya dilê te nizane, tenê kesên ku dil dane te. Kes nikare birînên te bipêçin, tenê yên ku tu derman bûyî ji wan re. Lê tenê du kes ber bi te ve hatibûn. Te derdên xwe ji wan re vegotibû, wan xwe di te de dîtibûn, ji wê bû ku di nav hemû demsalan de ji te hez kiribûn. Ger te negota êşên xwe, xem nebû, wan ji rûyên te xwendibûn serpêhatiya te. Ji xwe ji bo xemên te ber bi te ve hatibûn. Hatibûn êşên te sivik bikin.

Hatibûn dîroka nêvîmayî ji te bipirsin, dizanîbûn ji xeynî te kes wê ji wan re rastiyê nebêje. Li te mêze dikirin û xwe didîtin. Tu awêneya rastiya wan bûyî. Xwe di te de lêpirsîn dikirin. Çîroka stêrkên xwe tenê bi te re parve kiribûn. Tenê ji te re gotibûn ka wê ber bi kuve biçin. Wê di şîverêyên çûyîna xwe de bibûna yadigarek ji te Gulanê. Wê li ser darên vejîna te bibûna meyveyek ji emrê te Gulanê. Wê li ser kaniya jiyanê, bibûna dilopek li ser lêvên te yê tênî Gulanê. Ji te pirsîbûn şevekî; “ka Gulanê tûyê me di kîjan roja salnameya xwe de bi cih bikî?” û tu bêdeng mabûyî, paşê te ji wan re gotibû; “hûn dizanin, salnameya min sala emrê ciwaniya we ye, bila bi dilê we be.” Te dilê xwe ji wan re vekiribû û ew di salnameya te de li pey rojekî digeriyan û digeriyan. Gelekî bi lez bûn. soz dabûn bigihêjin rendewiya serkeftinê!

Bîr neke ji te hez dikim,
Gelek biriya te dikim,
Canê xwe gorî çavên te dikim,
Rojê di awirên xwe de veşêre û bîne,
Bibe heyv û stêrk ji bo min,
Rendewiya me ji bîr neke, dereng nemîne, Gulanê…

# Rêwîtî

Pişta xwe dide barê li pişta xwe û li ser girekî bilind rûdinê. Mendîla di berîka xwe de derdixe û xwêdana li ser eniya xwe paqij dike. Bayek narîn xwe li rûyê wî dide û pêre kenek li ser lêvan dineqişin. Di ber xwe de dibêje; “gelo di jiyanê de ji vê kêliyê xweştir heye?” û piştre bi xwe bersiva vê pirsa xwe dide: “misoger tineye, ji ber ku her dilopek ji xwêdanê birînek min derman dike.”

Bi vezîna bayê re pepûleyek ji dûr ve ber bi wî ve tê û li ser destan rûdinê. Gotina destpêkê ku ji devê wî derdikeve: “ji min re mizginiyek anî.” Hinekî di rengê baskên wê de diponije û bi heyecan dibêje: “hemû rengên gerdûnê di te de veşartiye bedewa 7 rojkî! Emrê te gelekî kurte lê te emrê hemû gerdûnê di pirrengiya baskên xwe de hewandiye, êdî dinya ya te ye, wate ya te ye û jiyan ya te ye perperîkê!”

Bi van gotinan pepûle radibe û li dor wî digere weke ku sipasiya xwe jê re bêje. Dîsa tê û vê carê li ser kefiya reş a ku Êrîş li dor serê xwe gerandiye rûdinê û qet dil nade biçe. Êrîş serê xwe radike û ji jêr ve li baskên wî mêze dike. wer jê re tê ku baskên wî hemû firehiya ezmanê li ser serê wî dagirtiye. Dîsan di vê dîmenê de dixeniqe;

“Êdî min jî çîroka çar pepûleyan bawer kir. Pepûleya dawî ji bo “wê kêliyê” nemir bike, dikeve ser rê. Her ku nêz dibe, wate mezin dibe û gotinê rêhevalên wê dibe rastî. Pêşde diçe û diçe. Êdî ji bo wê agir ronahiye, germaye û sotînere.

Digihêje sira agir û bi çirûskên agire re dîlanê digerîne. Baskên xwe ji agir re berdide, bila bişewite can ji bo pêtên te yên geş ey agirê pîroz! Ma ji bo gihiştina heqîqetê ev can bişewite, wê çi bibe. Min di agir de ew dît, mirovê mezin, heqîqet! Li pêşberî min û min dawetî heqîqetê dike. "wê kêliyê" bijî û nemir bike.

Dixwazim bi bask bibim, di vê çalakiya agir de bibim çirûskek. Êdî ew min rave dike, ew min bi bîr tîne, ew min jiyan dike û dide jiyan kirin. êdî ew min his dike û pêk tîne. Êdî her wateyek nû min dike çalakvanek û ez çalakvanê rengê te perperokê!"

Bi carekî dengekî ew ji kûrahiya fikran derxist û serê xwe rakir. Andok hilme hilma nefesa wî û li jêr ve ber bi wî ve tê. Xwêdanek li ser eniyê dihate xarê û çavên wî bi lêvan re wer di nava ahengiyekî de dikeniyan, te digot qeyê wênekêşekî bi dilê xwe rûyê wî neqişandiye. Çanteyê wî li piştê, hat û li kêleka Êrîş rûnişt. Nefesa xwe nû kir û hinekî jî matmayî jê re got; "tu li ser çi difikirî, tu zanî ez ji kengê ve gazî te dikim!" Êrîş keniya û bi destê xwe pepûleya ku hêj li ser kefiya wî rûniştibû, nîşanî wî kir; "ez bi vê xaliqa bedew re mijûl bûm! Û piştre li Andok temaşe kir "rêya me di neqşên perên wê de veşartiye!" Andok dikene û bi henekî dibêje; "îjar te niha neqşeya çûyîna me li ser perên wê derxist?"

•Dibe ew jî bizane ku em rêwî ne û dixwaze cara dawî li kêleka me bimîne, ji ber Ku jiyana me û ya wê nêzî hevin. Andok desmala xwe ya şil li ser eniya xwe ve bir û anî. Di wê kêliyê de xemgîniyekî rûyê wî pêça û zivirî ji Êrîş re got; "em gelekî dereng mane, pêwîste em zû biçin ji bo ku bigihêjin" Êrîş çeka xwe li ser çoka xwe rakir û danî kêleka xwe û bersivand; "erê niha herkes li benda me ye, milê din ê sînor jî hevalek heye ku niha bi rojane li benda me maye."

•Çi bibe jî pêwîste em di vê mehê de bigihêjin rendewiyê. Hinek bêhna xwe fireh kir û got; "tişt nabe ger em baş bimeşin, misoger emê bigihêjin." Êrîş serê xwe hejand û li çiyayê li hember xwe mêze kir; "dema mirov ji hevalan vediqete çiqas zore, ne wusa?"

•Em bi salane li van çiyan, ewqas pêve hatine girêdan ku dema mirov kêliyekî jê dûr bikeve, hema dilê mirov digire.

•Ew jî niha diltenge lê van çiyan em fêr kirin ku ji bo gihiştina bi armancê çi pêwîst bike, mirovê bike, heta dûriyek bêdilê me.

Andok hema rabû û xwe ji bo çûyînê amade kir. Êrîş jî li pey re

çantê xwe sererast kir û li pey Andok gavên xwe li gor gavên wî davêje û ji wir dûr dikevin. Rêyek dûr û dirêj li pêşiya wane. Dema herdû li pey hev li ser şîverêyan dimeşiyan, te digot qeyê bi sedan gêrîlla li ser wan şîverêyan bi wan re dimeşin. Carnan Andok pêşengê meşê bû, carnan Êrîş.

Û carnan jî bi hev re û li kêleka hev dimeşiyan. Mijara pepûleyê her di serê Êrîş de mabû. dema carekî li bin dareke berûyê navber dan, ji Andok re dibêje; "rastî tu cara destpêkê çawa bi peyva fedayîtiyê re aşina bûyî?" hinek sekinî, serê xwe bilind kir, çavên wî bi mirov re dikeniya: "cara destpêkê dema min çalakiya hevala Viyan bihîst ez gelekî pê bandor bûm. Di çavên wê de agirek her dadayî bû û qet pêtek jê kêm nedibû. Çavên Viyanê mirov bi xwe re dibir, gelekî sade û zelale. Çalakiya wê ez ber bi van çiyan ve anîm. Di çavên wê de serhildana jinên Başûrê Kurdistanê hebû. Min berê qet ew parçê Kurdistanê jî baş nas nedikir, lê bi Viyanê re hez û meraxa min jî ji wir re zêde bû…"

* * *

Êdî ber bi êvarê ye, bayek nazik xwe li rûyê wan dide. Gihêştine ser girekî bilind, ku bi hêsanî dikarin dema roj diçe ava, temaşe bikin. Şewqa bermahiyên rojê, rûyê wan di rengê sor de dixemilîne. Roj gelekî nêzî wan bûye. Hema dixwazin dest bavêjinê û xwe pê bigirin. Zarokatiya wan tê bîra wan, herdem xeyalên wan ew bû ku rojekî biçin ser çiyayê li pêşberî gund û rojê bi destê xwe bigirin. Dema herdûyan ji hevre behsa wê demê dikirin, bi wan xeyalên xwe yên paqij ê zarokatiyê bi sietan dikeniyan û gelekî ji wan re balkêş dihat ku herdûya heman hest jiyan kirine.

Ken, kêfxweşî û heyecan, bedena wan ditevizand û mûyê laşê wan bîz bîzî dibû. Belkî jî hesteke herî bedewe ku tu bizanî hevalê li kêleka te heman hestê jiyan dike, bi carekî ew heval ewqas nêzî te dibe ku tu ti caran xwe di vê dinyayê de bi tenê nebînî. Ewqas di nav xeyalan de kûr bibûn ku qet haya wan ji sermayê nebûye, bayê Gulanê canê bi xwêdan diricifand û bi carekî wer fikirîn ku aveke sar û cemidî bi ser wan de berdidin. Laş rût û tazî, êdî li wan lûtkeyan cilên moderníteya derewîn li ser wan giranî nedikir. Li wan bilindahiyan

kirasê nezanî, tirs û bêwateyiya jiyanê didane bayê. Sivik bal bibûn, dixwestin li ser baskên qasidokan birûnên û bifirin. Û hêj bayek sar laş ditevizand…

Pê hesiyan, gelekî cemidîne. Neçar man hema bêrawestan bimeşin û xwe di taldeya zinarekî de ji bayê biparêzin. Herdûyan jî serê xwe bi kefiya xwe pêçabûn. Kefiya li serê Andok keskê tarî û ya li serê Êrîş jî reş bû. Ew kefî jî bîranînên hevalan bû. Rîşikên dora kefiyê gelekî bi hostatî hûnandibûn. Ji ber ku ew kefî xelatek bû ji rêhevalên wan, gelekî pîroz bû. Ne tenê kefî, ji wan re lihêf bû, ew ji serma û germayê diparast. Carnan barê xwe pê girêdidan û didane pişta xwe.

Hinek tiştên amade li gel wan hebû, vekirin û danîn ber xwe û dest bi xwarinê kirin. dinya hêdî hêdî di kirasê tarîtiyê de aram digirt. Ji bilî dengê cîrcîrekan ti deng nedihate guhê wan. Ji bo ku vê bêdengiyê bişkînin her carê tiştek dihate bîra wan û qet di dilê xwe de nedihiştin û ji hev re digotin.

Dema xwarina wan xilas bû, hemû tiştên ku ji çenteyên xwe derxistibûn û yê ku li ber wan mabû, parve kirin û herkesî tiştê ku ji çantê xwe derxistiye, dîsa di çante de bi cih kir. Gelekî bi baldarî ev kar dimeşandin ku li pey xwe ti şopekî nehêlin.

Wê şevê heyecanek nediyar dilê wan dagir kiribû, qet bi xwe jî sedemên wê nedizanîn. Ji ber ku zêde rê nas nedikirin, qet nedifikirîn dema bibe sibê wê çi li pêşiya wan derbikeve. Vê yekê coş û heyecana wan zêdetir dikir. Ya herî baş zûtir birazan, ji bo ku bi derbas bûna demê nehesin…

Êrîş carekî dema bi xwe dihese, tîrêjên rojê hêdî hêdî ji hêlîna xwe derdikeve û ji wan re destê xwe dihejîne. Şaş dimîne, hema radibe li derdora xwe dinêre û li sieta li ser destê xwe mêze dike. siet 5:46 dq nîşan dide; "em çawa heta vê sietê razane?" dizivire li Andok mêze dike ku kefiya xwe li serê xwe gerandiye û xur xur dike. Qet dil nade şiyar bike, lê neçare ji ber ku derenge pêwîste rê bikevin. Ji Andok re rojbaşê dikşîne û diçe ku hinek qirşik kom bike, ji bo ku ji xwe re çayê daynin ser agir.

Heta ku ew ji daran tê Andok rabûye û cihek ji bo kuçik çêkiriye, di berîka êlekê xwe de li fendekê digere. Agirê xwe pê dixin û çaydaneke biçûk ku li ser çantê xwe girêdane, tije av dikin û darekî ji

herdû aliyan ve derbas dikin û li benda kelandina avê di agirê hezar rengî ê wê berbangê de kûr dibin. Agir ji bo wan gelekî pîroz bû. Weke ku li hember keda mirovên destpêkê ku agir keşif kirine, bi hurmet bin, serê xwe tewandibûn û li pêtên har û serkêş mêze dikirin. Dilê agir ewqas zelal û paqij bû ku her tiştê di dilan de veşartî bi wan dida gotin. Bê ku bi xwe bihesin, bi carekî hemû derdên xwe bi çirûskên agir re parve kirine. Agir dema li rûyê mirov dide, gotin qet newêre xwe di qirikê de asê bihêle, dixwaze demek ji ya din zûtir derbikeve û ew jî bibe hevalê pîrozbûna agir.

Gelek evîndaran ji bo evînek rast û pîroz xwe avêtin ber bextê agir û tê de heliyan, wenda bûn û bûne xwelî. Ji xweliya agirê xwe, xwe ji nûve afirandin. Tenhayiya sibê xwe bi bedewiya agirê wan re gihandibû û weke wan heyran û bi kelecan lê mêze dikirin. Ya rast evîna ji agir re mirovahî xistibû ser rêya lêgerîna heqîqetê, ew jî du mirovên sozdarê dîroka mirovahiyê bûn ku dizanîn ji bo agirê pîroz derketine rê. Qirçe qirça şewata darên li ser agir, ji wan re melûdiyek bêhempa bû, qet nedixwestin bêdeng bibe. Ew deng dişibiya dengê lorîna dayika wan di zivistanên sar û dirêj de. Û germahiya agir, çîrokên şevan ên dayika wan, li ber çavan zindî dikir.

Di dilê sotîner ê agir de, li wateya jiyanê digeriyan. Li dîroka xwe ya wendabûyî digeriyan di her pêtên ku radibûn û li ber çavên wan xwe digihande erşê xwedê. Li teyîsîna stêrka gelawêjê digeriyan, ji bo tama sira payîzê beriya herkesî bitemijînin. Û tê de xwe didîtin, ber bi çarenûsekî ve dimeşiyan… herdû bi kelîna çaydanê ji xeyalan derketin û bi kêfxweşî li ser agir danîn, av bi ser dema ku xistibûn avxorek plastîk de kirin û taştêyek sade xwarin. Ti caran di jiyana xwe de taştêyek ewqas xweş nexwaribûn. Hinek penêr, zeytûn, qetek nan û çaya gerim, sufreya herî dewlemend a dinyayê pêk dianî.

Wan rastiya gelê xwe yê hejar di wê sufreyê de gelekî baş didîtin, rastiya gel di wê sufreya wan de veşartî bû. ji bo wî gelî şer dikirin, ji bo wî gelî derketibûn rê, ji wê bû ku ew sufreya ji kevir ji wan re watedar bû, qet gazinc nedikirin ji vê rewşê. Hêj ji dema zarokatiya xwe de weke her zarokeke Kurdistanê fêr bibûn nanê tisî bixwun û di dawî de jî avekî bi ser de berdin û rabine ser xwe. Gelo ji vê xweştir çi hebû?!...

# Axa Dayîkê

Dema xwe ji jor ve berdan jêr, şaş û ecêbmayî li derdora xwe mêze dikirin. Çawa di demeke ewqas kurt de gihêştine vir. Erê çavên wan şaş nedidît, gihêştibûn sînorê Bakûrê Kurdistanê. Herdû bi carekî di cihê xwe de cemidîn û li hevûdû mêze kirin. ji kêfxweşiyan gotinên xwe ji bîr kiribûn. Qet rojekî nedifikirîn careke din lingê xwe daynin ser vê axa pîroz. Weke zarokan beziyan, weke ku di nava pêşbirkekî de ne. Andok dest bi bezê kir û bi lez got; "kê berê destê xwe li kevirê kêlê bide?" bi wê gotinê re Êrîş jî bi gavên xwe yên dirêj baz da, te digot qeyê dizanibû wê bikevin vê pêşbirkê. Herdû bi hevre ber bi kevirê sînor ve dibeziyan. Di wê beza wan de hesreta salan a dûriya ji vê axê hebû.

Ew ber bi hezaran hêviyên xwe ve dibeziyan. Ber bi giravekî ve dibeziyan. Ber bi mîlyonan gelên serhildêr ve dibeziyan. Ber bi Zagros û Andok ve dibeziyan. Weke ku ji wan re bibêjin; "Ey hemû hezkiriyên me, himbêza xwe ji me re vekin û bihêlin em kêliyekî di paşila we de aram bigirin. Milê xwe ji me re vekin, bila em şevekî, tenê şevekî serê xwe daynin ser milê we û xewek şêrîn bikin mêhvanê çavên xwe yên bendewar…"

Bi hevre gihêştin kêl û destê xwe bi hevre lê dan. Ew di wê pêşbirkê de serkeftî bûn. ew serkeftin destpêka hemû serkeftinên wan bû. Êdî wê di ti pêşbirkên jiyanê de bin neketana, bi hevre û wê li kêleka hev di hemû pêşbirkan de cih bigirtana. Çawa gihêştin wir, êdî nefes di wan de nemabû. Hema li ser kevirê ku destê xwe lê dabûn, rûniştin û bêhna xwe stendin. Bi carekî Êrîş xwe li ser kevir

avête xarê û ji Andok re got; “min ev kêlî carekî berê jiyan kiriye, ez dibêjim qeyê dîrok xwe dubare dike.” Andok cihê xwe li ser kevir xweş kir, destê xwe li ser kevir ve bir û anî; “gelek balkêşe! Min jî berê ev kêlî jiyan kiriye.” Erê wan bi caran di salên gêrîlatiya xwe de li ser kêlên sînor navber dabûnê û her carê jî henekê xwe bi aqilê dagirkerên vê axê kiribûn. Axa di bin sola xwe de ji milê din ê sînor ber bi milê din ve anîbûn, ji bo wê jî êdî wateya wan sînoran nemabû. Ji xwe bi şêwazeke herî ji rêzê, axa li herdû aliyan kiribûn yek.

Gelo kê pêşiya bayê bigirta ku; qedexeye, axê ji wî milî raneke û neyîne vî milî! Ma kê ji şahînan û qulingan re bigota; ji wî alî nefire û neyê vî alî. Ma kê ji hestan re bigota; bisekine, ev der herêmên qedexekirîne? Di dinyaya hestan de peyva qedexe bêreng û bêwate bû. Gelo kê ji Êrîş û Andok re bigota; rawestin, nasnameya xwe nîşan bidin, paseporta xwe derxin, Na! Em nahêlin hûn biçin. Wê ti sînor ew nedana rawestandin.

Nasnameya çi looo leşkero! Ma ne di xêz kirina van xetên derewîn de me nasnameya xwe wenda kir. Ez vê kaxeza derewîn û sexte di destê te de têxim bin lingê xwe û ser re derbas bibim. Oxir be ji te re, li bendê be dîsa em têne serdana te…!

Piştî bêhn stendinê dest bi meşê kirin. çawa xwe gihandine qirikekî, deşteke gelekî mezin û kesk li pêşiya wan derket. Pêwîst bû ew deşt derbas bikirina, bê ku kes wan bibîne. Xwe berdane jêrtir û li berwarekî xwe di nava darên berû de veşartin. Demeke li wir rûniştin û keşfa derdor kirin. Ji dûr ve dengê şivanekî dihat ku li pey keriyên pezên xwe direviya. Ji ber ku dar gelekî bi ser hevde bûn, zêde derdora xwe baş nedidîtin. Hinekî li bendê man û piştre ber bi şivan ve çûn.

Şivan li ser kevirkî rûniştibû û li koma pezên xwe mêze dikir. Tîrêjên bêrehim ê tavê, heta ku tu bixwazî bi dilê xwe rûyê wî şewitandibû. Wî jî ev yek ji xwe re nekiribû derd û bêxem rûyê xwe ji tîrêjên sotîner re berdida. Li ber germahiya tavê, gelek caran ji bîr dikir ku tiştek bi navê siya darê jî heye. Êdî fêrî wê rewşê bibû. Di fikir û xeyalan de xeniqîbû, çavên şikestî dikir kîjan serpêhatiyê vebêje, qet mirov nedizanî. Wek sirekî tenê di çavên wî de hêlîn çêkiribû. Ji nişkave bi dengê fîtikek nizim ji derya xeyalan hilpekiya, hema rabû ser xwe û bi lez li derdora xwe mêze kir. Bi carekî çavên

wî bi du kesên xerîb ket. destpêkê fam nekir ka ew kenê. Ji bo wê hema bi dengekî bilind gazî kir; “ew kêne li wir?” Andok tam xwe ji nav daran derxist û destê xwe da ser lêvên xwe û ji şivan re got; “sûûûûûsssss! Emin, heval, dengê xwe kêm bike!” bi vê gotinê re herdû ber bi şivan ve çûn û şivan jî bi lez li ser kevir hate xare, di nav tirs û heyecanê de destê herdû hevalan givaşt û bixêr hatina wan kir. Andok bi şivan re dest bi sohbetê kir. Bi awayekî nixumandî ji şivan pirsa rewşa derdor, rêyên hatin û çûyînê kir. Şivan jî dest pêkir ta bi derziyê re kir. Di nav gotinên xwe de behsa hespên xwe jî kir.

Di vê navberê de Êrîş fikrek di serê wî de biriqî, gelo em nikarin jê du hespan bixwazin? Ew bawer bû ku niha Andok jî heman tiştî difikire, ji bo wê jî gelekî bi rihetî ji şivan pirsa wan hespan kir. Şivan di bersivê de got; ”wallahî heval hemû ne yên min in, pirek ji wan hema wusa di vê deştê de berdane.” Andok bi ken dibêje; “ê başe, em bibin xwediyê wan!” hêşta şivan xwe amade dikir ku ji wan re xwarinê bîne, herdûyan bi çav bi hevûdû dane fam kirin ku pêwîste bi lez ji wir biçin. Dema şivan dibîne ku ew rabûn, bi îsrar ji wan dixwaze ku hinek nan û penêr bi xwe re bibin. Heval jî şivan naşkînin û ji destan digirin. Herdû siwarî du hespan bûn û hêdî hêdî ji wir dûr ketin. Dixwestin heta cihekî biçin û xwe veşêrin, dema bû şev bi rê bikevin.

Nêzî sietekî ji şivan dûr ketin û li cihekî di nav daran de hespên xwe tewil dan û bi xwe jî hinek ji hespan dûrtir, li nêzî rûbarek biçûk ku ji zeviyên jor ve diherikî, sekinîn. Bi rastî jî gelekî westiyayî bûn. Nedikarîn agir jî pêxin ji bo ji xwe re çayekî daynin ser. Lê hebûna avê li wir jî ji bo wan rewşeke lûks bû. Zêde nedikarîn bi dengê bilind biaxivin, ji bo wê bi hêdîka behsa vê yekê ku şivan çawa tirsiyaye, veciniqiye û li cihê xwe rabûye, dikirin û pîq pîqa wan bû. Andok fêrî vê rewşê bibû, ji ber ku bi dengê nizim jî bikeniya pirsgirêk nebû lê ji ber ku Êrîş nedikarî bi dengê bilind bikene, bêsebrane li bendê bû ku zû bibe şev û ew ji wir biçin da ku li cihekî tenha têra xwe bi dengê bilind bikene. Her di ber xwe de ev tişt difikirî; em zarokên vî axîne, li ser axa xwe jî mafê me nîne bi dengê bilind bikenin!

Herdûyan kefiya xwe avêtin ser rûyê xwe û hema bi xewê ketin. Xewa Êrîş gelekî sivik bû, carnan dema dengek biçûk jî bihata, ke-

fiya xwe dida aliyekî û li derdora xwe mêze dikir û dîsa bi xew re diçû. Erdê li bin wan şerim dikir ji hişkbûna xwe, xweziya xwe ji xaliqê xwe re dibir ku wê kêliyê biba du doşekên nerim ji canê wan re. Hemû pelên bi darên berûyê li hev kiribûn ku nehêlin ti tavek li rûyê wan bide û xewa wan biherime û tîrêjên rojê şerê pelên daran dikir, ji bo ku tenê maçekî li ser rûyê nazenîn bide. Mirov dikir heta hetayî birûnê û li xewa wan temaşe bike.

Xwe ji axa xwe re berdabûn, gelo çend kes weke wan li wir, hema cihê ku wan xwe dirêj kiribûn, morîkên xewê bi çavên xwe ve kirine. Gelo çend xwînên zelal hema li şûna wan herikiye ku ewqas aram û asûde serê xwe danîne ser singa wan û bi xew ketine? Dil digot biçe û kefiya li ser rûyê wan bide aliyekî û heta ku ew hebin, heta ku xew, wan gîro bike, li rûçikên bedew temaşe bike û gelo mirovê herî dawî têr biba ji dîtina wan? Û dil digot biçe destê wan dayne ser dilê xwe bila ji gupe gupa dilê te şiyar bibin, Na! Dayika wan jî qet rojekî dil nedabû wan ji wê xewa şêrîn rabike, bila bi xwe rabin.

Ber bi danê êvarê bû, êdî roj di kozika xwe de xatir ji mijangên wan dixwest. Ji nişkave bi dengê xiş xişekî herdû bi hev re ji xew rabûn û dest birin çeka xwe û çavên xwe ber bi cihê ku deng dihat ve tengtir kirin. Kesek ber bi wan ve dihat. Bi îşaret herdû hinekî ji hev dûr ketin û senger girtin. Dengê dilê xwe dibihîstin. Destê xwe hêdîka birin ser tetîkê û li bendê man. Ew deng her nêz dibû. Ji ber ku Andok hinekî li pêş bû, zûtir dikaîbû, kesê ku tê bibîne. Bi carekî pîqiniyek bi Andok ket. Bi dengê kenê wî re beraz bi wan hesiya û hema bi lez û bi teperepeke zêde di ber wan de bihorî. Ewqas bi xwe û bûyera ku çêbibû keniyan ku êdî taqet di wan de nemabû rabin û biçin. Ji bo dereng nemînin, çantê xwe komî ser hev kirin û rextê xwe şidandin û çeka xwe avêtin milê xwe û bi rêketin.

Ber bi hespan ve çûn, herdû hesp jî rengê wan spî bû, hema di tarîtiyê de jî xûya dikirin. Li hespê xwe siwar bûn û heta ji wan dihat, ew hesp di nav wê deştê de dibezandin. Tava heyvê weke ciwaniya emrê wan, nû gihabû. Hespên spî bozî har û serxweş sînga deştê diqelişand û pêş de diçû. Dema di nav komên gezgezkan de derbas dibûn, hespên wan ji bo ku ji êşa lingê xwe rizgar bibin, heta ji wan dihat lez dikirin û xwe davêtin ber bextê ax yan jî avekî, ji bo birî-

nên xwe derman bikin. Êşa gezgezkê dabûne ber çavên xwe, dema ew herdû siwariyên xerîb dikirin mêhvanê eyvana bi xeml û xêz. Bayê mêrga şîn, porê siwariyan şeh dikir, dixemiland û ew dikir evîndarên axê.

Rîşika kefiya li stûyê wan xwe ji bayê re berdabû, dihejiyan û dihejiyan. Ew bibûn du Derwêş di mêrgeşînê de, ber bi Edûlê ve. Xeyalên Rojê zindî dikirin, bi carekî xwe di deşta Musilê de didîtin û li pey wan bi hezaran siwarî. Dema çavên wan di çiyayê Şengalê de eliqî, wêneyê Rojê di lûtkeya wê de, ew ber bi xwe ve dibir. Nêz dibûn, diçûn weke keştiya Nuhilnebî, ji bo xwe ji pêlên hevaltiya kêm rizgar bikin, li kêleka Rojê daynin. Gelek biriyê kiribûn, 13 salên dûriya ji wî, ew bê hedar kiribû. Diçûn dawî li wê dûriyê bînin. Ew kêliya ku Derwêş birîndar bibû, wan jî xwe birîndar dîtin lê her rêya xwe berdewam kirin. dengê lorîna Edûlê dihate guhê wan;

Delal ay delal, Derwêşo lawo birîndarim, mal wêranim, hêlîna derdame

Rabe delalo, mêhvanê dilê min rebenê,
Siwar be li hespê boz,
Min li pişt xwe siwar ke
Bibe bajar bi bajar
Bigerîne ciya bi çiya…

Ezê tembûrekî ji darê bejna te çêkim
Bi sêzdeh perdeyan û şeş têlan
Ezê daynim li ser çoka xwe,
Destê xwe lê bigerînim,
binazînim weke dergûşa xwe
bigerim mal bi mal, çiya bi çiya
bilorînim egîtiya delalê xwe
bineqişînim besteyekî
bireşînim di vê deştê de mîna rojê,
bilorînim te di hestan de,
bipêçim derdê delalê xwe, evîna wî
di bêdawîtiya ezmanan de delalo…

Xwîna zelal deşta Mûsilê avdanî dikir, deşta bê ruh û can. Diçûn

û li ber Zagros û Andokan ve dibihorîn, xwedawendan li jor ve gulên nemirtiyê bi ser serê wan de dibarandin. Û li ber xwe de wuha digotin; “kurên min hûn her hebin, hûn her bijîn!” Edûleyan xêliyên xwe bi darên li ser rêka wan de daliqandibû, rojekî. Dema di ber de dibihorîn xêliya gevez xwe li sola di lingê wan dialand û bi wan re li gel bayê dans dikir.

Wê şevê dayika Êrîş siya hespê kurê xwe li ser bejna Zagrosan ve dîtibû û qet xew neketibû çavan. Her çav rê mabû wê şevê. Dema Andok di quntarên Andokan de bihorî bû, dayika wî dengê lingê hespê bihîstibû û li pey beziyabû. paşê dema dayikên wan berê berbangê ji mal derketin û çûn da ku gulek sor ji bo wan biqetînin, xwenava eniya wan li ser gulê dîtibûn, tiştek ji dilê wan qetiyabû. Bêhn kiribûn û paşê ew bi ser çavên xwe de berdabûn.

Dengê Rojê di guhê siwariyan de ev gotin ji wan re digot; “Mirin ji ku, û çawa tê bila bê êdî xeman nexwe,

Kurdîtî û jiyana azad a misogerbûyî rastiyên ebedî ne.”

Bi vê gotinê bi xwe hesiyan û ji nav xeyalan derketin. Êdî deşt derbas kirine. Bi sietan li ser pişta hespê beziyane lê bi xwe nehesiyane. Xwedan ji laşê herdû hespan weke kaniyê diherike. Ber bi sibê ye, dinya hêdî hêdî ronahî dibe. Pêwîste hespên xwe li wir ser avekî bi cihe bihêlin û biçin. Wusa jî kirin û bi lez, beriya ku dinya ronahî bibe, xwe gihandin ser girekî. Li wir jî wê li benda hevalekî bimana ku bê wan bi xwe re bibe. Gelekî westiya bûn, hema dixwestin hinekî çavên xwe gerim bikin û westandina şevê ji canê xwe bavêjin. Lê ew der cihek wusa bû, qet mirov nedikarî lê bisekine, di warê ewlekarî de jî ji bo wan baş nedibû. Ji xwe mijara ewlekariyê û xwe parastinê ji bo wan sereke bû. Herdû jî di vê mijarê de gelekî bi baldarî tevdigeriyan.

# Ocaxa PKK'ê bi we re be!

Li ser avekî dest û rûyê xwe şûştin û rûniştin da ku bêhna xwe bistînin. Hêj demek dirêj derbas nebû ku dengê fîte fîtekî ji wan re hat. Gelo şaş bihîstine. Na, herdûyan jî heman deng bihîstibûn. Li bendê man ku ew deng hinek nêz bibe, piştre bersiv bidin. Wan texmîn nedikirin ku hevalê ku were pêşiya wan ewqas zû hatibe. Ji bo wê jî bi sedan pirs di serê wan de çêbû. Ji dûr ve kesek dîtin ku ber bi wan ve tê. Baş ew şopandin, kesek çekdare. Her ku nêztir bû, fam kirin ku ew hevale. Pir kêfxweş bûn, bi fîtikê bersiv dan. Wî hevalî jî dema bersiva wan bihîst, gavê xwe zûtir avêt da ku bigihêje wan. Ew jî ji dîtina hevalan ecêbmayî bû. Destê hevûdû givaştin û xwe avêtin ber singê hev.

Êrîş û Andok demeke dirêj bû ku heval nedîtibûn. Ji bo wê jî ew heval ji bo wan weke hemû hevalan dihat. Piştî silav û halpirsiyan, di cihê xwe de rûniştin. Ew heval hema xwe bi wan dide nasîn:

•Navê min Egîde, ez çend roje li benda we me, min ew nota ku we bi rêkiribû jî girt. Hetanî min xwest bersiva we bidim, ji xwe hûn bi xwe hatin, pir başe.

Êrîş ku gelekî bêsebirî dikşand, bi ken got:

•Em jî xwe bi we bidin naskirin, ez Êrîş û ev heval jî Andoke! Egîd li herdûyan mêze kir;

- Hevalan gelekî behsa we kiribûn, min jî merax dikir we bibînim. Andok weke her Carê bi henekên xwe yên bi qalîte dibêje;

- Êê! Çawa bû te em ecibandin, xeyalên te di avê de neçûn? Di wê kêliyê de gelek tişt di sere hevalê Egîd de derbas dibû. Dixwest pir gotinan ji wan re bêje. Gelek caran heval derbas kiribû, anîbû û biribû lê ew herdû li gel wî gelekî cuda bûn. Şaş û matmayî ji xwe re li ken û henekên wan temaşe dikir. Gelek caran bê ku ew pê bizanin serê xwe radikir û li wan temaşe dikir. Her carê jî ev dihate bîra wî; "gelo ev cêwîne!" pir caran xwestibû ji wan vê pirse bike; "hûn digihêjin hev, hûn ne mirovên hevin?" paşê bêdeng dima û di ber xwe de bi wan pirsên xwe dikeniya. Erê ma ew jî wan nû dibîne, nas dike lê çima ewqasî jê re nêz tên. Çima ewqasî xwîna wî bi wan dikele. Bi carekî bi xwe hesiya ku Êrîş û Andok li benda bersiva wî ne, axînek berda hinavê xwe û bi ken got:

- Ne wallah heval, hûn ji xeyalên min pêşdetirin. Û her sê bi hev re dest bi kenê kirin. hevalê Egîd bi salan di wan rêyan de li ser sînor, heval derbas kiriye. Bi caran birîndar bûye lê her carê jî xelas bûye. Hevalek rûken û esmer û temenê wî 30 yan 31 bû. Di emrekî gelekî ciwan de tevlî bibû û bi dîtina wan hevalan hêj ciwantir û zindî dibû. Ji ber ku di xebatên bajaran de dima, demeke dirêj bû heval nedîtibû û hevalên din jî weke wî bûn. Ji bo wê çiqasî rûniştana ji çiya û hevalan bigotana têr nedibûn. Êrîş û Andok bi heyecaneke mezin behsa rêwîtiya xwe dikirin. Hema çi jiyan kiribûn bi hevalê Egîd re parve dikirin.

Hevalê Egîd ji wan re plansaziya wê rojê got. Wê rêya du sietan bi meş biçûyana. Hêjî di serê hevalê Egîd de mabû ku ew çawa ewqas bi lez hatine. Herdû keniyan û li hev mêze kirin. Andok çavek ji Êrîş re lêda û got;

•Em firiyan! piştre hinekî sekinî û berdewam kir; "ya rast tu bixwazî em bi hespan hatin. Hevalê Egîd çawa navê hespan bihîst şaş ma;

•Hesp! Hespê çi, we ji kê stend? Êrîş ku êdî dikarî hinekî bilind bikene, got;

•Me ji şivanekî xwest, wî jî got hema bila ji were be. Hevalê Egîd li derûdora xwe nihêrî, weke ku li wan hespan bigere;

•We çi ji wan kir, ka li kuderê ne?

•Me ew serbest berdan, gelek hespê xweşik bûn! Êrîş ev gotin got û çeka xwe da aliyê çepê û bi wan re meşa xwe berdewam kir. Barê

wan gelekî giran bû, hemû cebilxaneyên xwe bi pişta xwe dibirin. Lê qet bi wê barê giran nedihesiyan. Xwêdan li ser û rûyê wan weke avê dihate xarê. Hevalê Egîd ji wê enerjiya wan ecêbmayî dima. Wan barê li ser pişta xwe ji bîr kiribûn û hêdîka bi hevre diaxivîn.

Dixwest di wê demê de dem bisekine û ew têra xwe li meşa wan temaşe bike. Dem bicemide û ew destê xwe bike kaseyek dayne bin herikîna xwêdana wan, ew xwêdana kedeke pîroz û bêhesab bû. Dixwest di wê kêliyê de biba wênekêşek û ew wêne mayînde bikira. Gelek dixwest çavê xwe bigire û veke, bi carekî ew jî bibe parçeyek ji wan û li kêleka wan be. Carnan Zîlan bi porên xwe yên reş û xelek li pêş wan de dimeşiya, direviya xwe bigihînê lê hema ji xeyalan derdiket.

•Rastî hûn çend roje di rê de ne? hevalê Egîd zivirî û ji herdûyan pirsî. Andok ku li pêşiyê dimeşiya, zivirî û got;

•Nêzî mehekiye, em di rêdene. Em li milê din gelekî li benda bersivê man, ji bo wê em gîro bûn.

•Ma hûn li kuderê diman?

Andok dîsa mijangên xwe yên dirêj li rûçikên xwe da û got:

•Em li mala wê dayîkê bûn. Gelekî dayîkek hêja bû. Dema me xatirê xwe jê xwest û em hatin bi sietan destê me girt û giriya. Dema Andok ev digotin, Êrîş serê xwe daxisitbû û bi ken difikirî. Serê xwe rakir, birûyên reş û qalind dîsa qerçimand û bi dengek hêdî got:

•Destê me herdûya di nav destê xwe de girt û got: herin kurê min, oxira we ya xêrê be, bila ocaxa PKK'ê bi we re be! Hevalê Egîd serê xwe hejand û got:

•Bi rastî jî malbatekî gelekî welatparêzin, min ji hevalan bihîstibû ku gelekî kêfa wan ji we re hatiye. Bi taybet zarokên wan gelekî ji we hez kiriye. Dikene û berdewam dike:

•Dê zû bêjin we çi bi wan zarokan kiriye ku ewqas bi we ve hatine girêdan. Salane ez diçime wê malê qet zarokan ewqasî behsa min ji kesî re nekirine!

Her sê bi hevre têra xwe keniyan û Êrîş û Andok weke ku dilê wan pir rihet be, li hev temaşe kirin û dîsa têra xwe berdane kenê…

Hevalê Egîd di cihê xwe de sekinî û li pişt xwe nihêrî, ji herdû hevalan pirsî:

•Ma îro çendê mehê ye?  Êrîş li sieta xwe nihêrî û bi lez got;
•23’ê hevalê Egîd!
•Hiiim! Başe ji xwe hertişt amade ye. Êdî ji vir û şûnve hûnê bi serê xwe bimînin. Ezê heta cihekî bi we re bêm… axînekî dikşîne û berdewam dike:
•Dil dixwest heta dawiya rê bi we re bibim. Li kêleka we hemû xweşî û nexweşiyan parve bikim. Mirov pêwîste gelekî bi şans be ku bibe hevrêyê we!

Ev gotin ji bo Êrîş û Andok bi qasî hemû cihanê bû. Ji kêfxweşiyan di çermê xwe de bi cih nedibûn. Herdû li gel hev bûn, lê hestek pir ecêb li hember hevûdû jiyan dikirin, li gel hev biriya hev dikirin. Li gel hev bûn lê her veqetîn dikete aqilê wan. Ji hev têr nedibûn. Ji bo wê jî hertim li hevûdû mêze dikirin. Andok ti caran Êrîş bi tenê nedihîşt, ew li Êrîş mezintir bû ji bo wê her xwe li hember wî berpirsyar didît. Carnan Êrîş aciz dibû lê Andok her carê hewil dida wî aram bike. Êdî her biryarek bigirtana bi çavan bi hev didane fam kirin ku dipejirînin. Dema astengî yan jî pirsgirêkek derbiketa, herdûyan ji bo çareseriyê ewqas xwe berpirsyar didîtin ku qet nedizanîn çawa çareser kirine.
Di dirêjahiya rê de li ser planên xwe bi sietan nîqaş dikirin, heta ku negihêştana encamekî jê venedigeriyan. Li ser erdê bi dehan carî nexşeya hedefên xwe xêz dikirin û jê dibirin. Çawa ku di provaya hevaltiyê de gelekî serkeftî bûn dixwestin di provaya çalakiyê de jî ewçend serkeftî bibin. Di dema hevaltiya xwe de çalakî ji bîr nedikirin û di dema çalakiyê de jî hevaltî ji bîr nedikirin. Di 3-4 mehên ku bi hevre bûn, qet dilê hev nehêştibûn. Herçend bi rojan li benda çûyînê man û aciz bibûn, lê ti tiştekî têkîliyên wan sar nekir û nedibû. Bi qasî hemû salên xwe yên di nava tevgera azadiyê de ew çend mehên bi hevre, watedar û tije derbas bibû. Soz dabûn hevaltiya Rojê ku vê hevaltiyê di kesayeta xwe de bi awayekî herî baş û rast bi cih bînin. Dibêjin; “gula bê eyb xwedê ye!” gelo tu di hevaltiya wan de bigeriya, teyê eybek bidîta?

# Qeyserî

Ber bi êvarê gihêştin ser cedeyek ax û li wir li maşînekî siwar bûn û çûn. Gihêştin gundekî ser sînorê Kurdistan û Tirkiyê. Hem kêfxwş bûn û hem jî xemgîn. Kêfxweş bûn ji ber ku nêzî hedefa xwe dibûn û xemgîn bûn ji ber ku êdî lingê wan li ser axa wan radibû

Biryar dabûn wê ber bi Anadola Navîn ve biçin. Ber bi Qeyseriyê ve biçin. Cihê ku hemû rê di wir de derbas dibûn. Kîjan rêwî tê, qet nebe di berde derbas dibin. Heta qulingên rêwî jî tên û li ser çiyayên Erciyês daydinin û paşê rêya xwe berdewam dikin. Carnan hinek rêwî di rê û gundê wê de bi cih mane. Hinekan şopên xwe li ser axa wê bi cih hiştine û çûne. Hinek jî li wir mane, mirine û gora wan li wir çêkirine.

Cîrane bi Kurdistanê re ji bo wê kesên ku ji şer, mirin û koçberiyê ber bi wê ve hatine, bi hestên nîvcomayî hewil dane jiyana nîvco berdewam bikin. Ji xwe li gundê ku lê diman, çiyayê Erciyês baş ji wan ve xûya dikir. Ji mêjeve bû ku ji vê bajarê xeyîdî bûn. Ew bajar bû ku qet resm û kevneşopiya cîrantiyê bi cih neanîbû. Wê jî gelek êş bi Kurdan dabû kişandin, rojekî bê ku bizane, bê ku bizane mirina ku nayê ji bîr kirin, veqetîna ji axê ye û êdî gelek zarok fêrî vê mirinê bibûn bê ku rojekî pê bihesin.

Êrîş û Andok dema di maşînê de li ber çiyayê Erciyês ve derbas dibûn, destanên bi sedan komkujiyan dihate bîra wan. Serpêhatiya Kurdên Qizilbaş ku çawa ji Dêrsimê û Mereşê bi darê zorê koçî vir

dikirin. Di wan rêkan de hêj şopa wê tirajêdiyê didîtin û hestên tolhildanê di wan de bihêztir dibû.

Erê! Mirovê Kurd, çawa ku tu gihayekî ji rehê wê jêbikî û hişk bibe, ew jî li ser axa xwe veqetiyabûn û li çolên xwe bê ruh û can bi tenê hiştibûn. Weke keriyên pezan bibûn koçberê çol û çiyan, bê ku bizanin sedemên vê yekê. Bê ku bi sûcê xwe bihesin û Qeyserî bibû cihê Kurdên koçber. Lêgerîna ji bo heqîqetê a Pîrên Qizilbaşan weke meylên protestantî bi nav kirin û xwestin li pêşiya wan bigirin. Yek ji wan li kêleka hemû êş û derdê koçberî, kuştin û tevkujiyan wuha dilorîne;

Dostê saxî tim ref hev e
Hemî ro ye hemî şev e
Kar û zirar birayê hev e
Var git dilo doste yara
Yar alisen doste yara
Dost derdine bulur çare
Her suyun geçidi var e
Sakın sele gitme dostum
Riya dostan rêka pan e
Em çi dibên dost dizane
Dil bi dostê xwe dizane
Şeş cihete lamekan e
Var git dilo dostê yare
Dosttan olur derde çare
Rêka dostan rêka duz e
Em çi dibên dost dibihîze
Derdê dosta seyîd ezîz e
Var git dilo dosta yar e…

Ev helbest di dinyaya heqîqetê de gelekî bi ziravî yekbûna ruhî û wateyê diherikîne. Û hêjî ev helbeset nehatiye kuştin û careke din hozanê nemir ê Kurd Nesîmî Çîmen ew vegotiye. Ev helbest sadebûna Kurdistanê radixîne ber çavan. Bi dengê hevaltî û heqîqetê hatiye xemilandin. Qeyserî ew bajare ku xwestin tê de Kurdan bikine Tirk. Gelekî bedew bû ev bajar, lê me qet rojekî bedewiya wê nedît. Ne ku em bê hest bûn û çavê me yê dîtina xweşikbûnê nebû, Na! qi-

rêjiya mirovên zalim perdeya reş avêtibû ser rengê vê bajarê jî, di hafiza me ya dîrokî de gelek qirêjî kolandibûn.

Erê! Êrîş û Andok diçûn tola ewqas sal hilînin. Hevalê Egîd ji wan pirsî;

•Niha planên we çiye, em çawa bikin?

Êrîş destê xwe danî ber çena xwe û hinîşka xwe jî siparte çokê xwe, hinek fikirî û piştre got:

•Heval me wer biryar girtiye ku ez maşînê bajom. Me hemû çekên xwe jî amade kirine, hevalê Andok jî piranî bi karên sabotajê re mijûl bû.

Andok bi destê xwe hêdîka rûyê xwe xwerand û gotina Êrîş temam kir:

•Tiştek cuda nemaye, planên me di serê me de heye û kar jî me li gor wê beş kiriye.

Hevalê Egîd êdî tiştek negot û hewil dida mijarên ku bikeve bîra wî, bi bîr bîne û ji wan re bêje.

Hevalê Êgîd cara dawî hişyariyên pêwîst ji wan re got û xatirê xwe ji wan xwest. Ji bo wî gelekî zehmet bû ev xatirxwestin. Bi salan tama dûrî û qutbûna ji hevalan temijandibû. Bi caran hevalên li kêleka wî bê xatirxwestin çûbûn û paşê qet ew careke din nedîtibû. Lê ti caran bi qasî îro nebibû. Di aliyekî de gelekî pişta wî bi wan hevalan gerim bû, bi wan bawer dikir û rihet bû. Lê di aliyekî de jî tiştên nebaş dikete bîra wî. Ditirsiya hinekî. Gelo wê bikaribin bê astengî karê xwe bi serkeftî pêk bînin?

Di rê de astengiyek li pêşiya wan dernekeve. Yan jî nekaribin di demê de xwe bigihênin hedefê. Êrîş û Andok ev nerihetî di rûyê hevalê Egîde de xwendibûn. Her carê jî bi henek dixwestin ku hevalê Egîd dilasûde be û qet xema wan jî nexwe. Heta kêliya dawî jî ku xatir ji wan dixwest heta ku dikete bîrê behsa astengî û xetereyên îhtimalî dikir. Ya rast kenê wan îfadeya hemû serkeftinan bû. Destê wan di nav destê xwe de qehîm şidand û li nav çavên herdûyan temaşke kir. Qet ji temaşekirina wan têr nedibû. Bi deqeyan hevûdû himbêz kirin. Bêhna hemû hevalan ji Êrîş û Andok dihat. Weke ku hevalên ku bi salan himbêz nekiriye û di dilan de hesret maye, li ber singê xwe digivişîne.

Êdî kelegirî bibû lê hewil dida ji wan veşêre. Bi rê ket û ji wan dûr ket. Bi caran ziviri û li pişt xwe ve li wan temşe kir. Destê wî ji wan nediqetiya. Êrîş û Andok devbiken jê re dest dihejandin. Di wê kêliyê de dixwest yan dem bisekine û ew qet şahidê vê xatirxwestinê nebe yan jî bi lez dem bibihore û ew her carê nezivire kenê wan temaşe neke û agir bi dilan nekeve.

Heta ku di nava daristanê de wenda dibe, Êrîş û Andok bi kenê xwe wî bi rêdikin. Êdî amadekariyên wan bi dawî bibû. Şeva 24 mehê piraniya dema xwe di rê de derbas kirin. bombeyên xwe di maşînê de bi cih kiribûn, ji bo tedbîr kilêş û tebance jî li gel xwe ragirtibûn.

# Pinarbaşî

Sibeha roja 25'ê Gulanê. Şeva bihorî li gel ku ewqas rê jî hatibûn, lê qet nekarîn birazên. Herdûyan li ser hev ji hevûdû re digotin, pêwîste em serbikevin. Di hemû demên ku bi hevre bûn bi caran di guhê hev de sirûda serkeftinê xwendibûn. Her carê dixistin bîra hevûdû ku hemû heval li benda me ne. Ti behaneyeke me ya ji bo binkeftinê tineye û wê nebe jî. Hêj qeşayên bêruh li ser singa vî welatî neheliyabûn û te newêribû dest bidî vê cemedê, weke nexweşiyek bêderman tuyê jî pêbiketa. Wê laş biteviziya û rojekî teyê bidîta ku êdî navnîşanek ji hebûna te nemaye.

Ger tu dereng bima, tuyê biba peykerek ji qeşayê di muzeyan de û xelkê sibeha zû li pişt camên xemilî kenê xwe bi te bikirana. Wê zarokên biçûk rûyê xwe bi camê re bipelixandana û zimanê xwe ji te re derxistana. Ji xwe di berê de welatek di wir de cemidandibûn, dilê wan hênik nebibû hêj, diviyabû pêkenokek din ji qeşayê ji zarokên xwe re çêbikin. Lê qet vê carê çîroka me nedişibiya ya doh. Êdî Zagros û Andokan dema pêçekên xwe di landikan de bi xewê dixistin, di her kêlandina dergûşa wan de peyvek ji serkeftinê di bin guhê wan de xwendibûn. Ji wê bû ku ew sondxwariyê serkeftinê bûn. Buhar hatibû û hemû cîranan tevna serkeftinê bi destê keçên xwe lidarxistibûn.

Buhar hatibû û dengê bilûra azadiyê êdî xwarina her ruhekî bû. êdî ne qeşayên wêran, her dilek di ber dengê nalîna destê keçên Mezopotamiya de diheliya. Êrîş û Andok dikirin destê qelişî ên

van keçan bi gihayên nemirtiyê derman û pîne bikin. dixwestin bibin dengek ji dengê wê bilûrê. Dengê newaya bilûra azadî û serkeftinê şeva wan dagir kiribû. Ji wê dengê heta berbangê xew nektibû çavên wan. Gelo ev dengê bilûra şivanê gundê wan bû û ew di wê şevê de hezar carî çûbûn dema zarokatiya xwe û xeyalên xwe di dengê bilûrê de gihandibûn rastiyê. Vê rastiyê eniya wan dibiriqand û bêhna azadiyê dihate pozê wan. Êdî azadî bibû gup gupa dilê wan, beriya berbangê…

# Diçûn tevafa Zîlanê!

Sibehek zû, tîrêjên rojê ramûsanekî dineqişîne ser bedena xwenavekî. Qêrîn bi bilbilek evîndar dikeve. Gulsosin diveciniqin di singa axê de. Bi wan re du rêwiyên evîndar bi xwe dihesin, çavê xwe vedikin û silavekî didin Roja pîroz. Dibe ku du sietan tenê xew kiribin lê ji wan re wer tê ku bi salane serê xwe danîne erdê û bi xewa Eshabulkehf ketine. Bê ku sedema wê bizanin, dengê gupe gupa dilê xwe dibihîzin. Tu dibêjî qeyê nû bi xwe hesiyane ku janek dilê wan diazirîne. Li hev temaşe dikin. Nizanin di wê kêliyê de bikenin yan bigirîn.

Ji hev re Rojbaşê dibêjin û bi lez radibin betaniya ku şevê din bi niyeta ku necemdin avêtibûne ser xwe, didine hev. Halê wan dişibiya halê zarokên ku şevê li mala cîranan xew dikin û sibê şaş û matmayî difikirin ka li kune. Pirsa em li kuderê ne, zinginî bi mêjî dixist. Û herdû weke ku bersivê didin vê pirsê, ji çavên hevre dibêjin; “Em li cihekî gelekî dûrin!” dema zanîn li kuderê ne, êdî xewnên xwe ji bîr kirin û vegeriyan ji rêwîtiya şevê.

Lêvên wan dikeniya lê dil dikir ji heyecanê ji singê derbikeve. Te digot qeyê wê serê sibê hemû hestên gerdûnê di wan de wate bigire. Car dikeniyan, car kelegirî dibûn. Ger kêfxweş û bêxem dibûn, ger dilteng û bêtaqet dibûn.

Di rûyê wan de hemû şahkarên edebî dest bi nivîsan dikir. Çav carnan wer dibiriqî te digot hemû stêrk di awirên xwe de li hev ci-

vandine. Carnan heman çav wer masûm û bêdeng dibû te digot qeyê hemû findên kêfxweşiyan di wan de tefandine. Û bi carekî wer dilteng dibûn, bi xwe jî ji wê halê xwe şaş diman. Diltengê kê û çibûn, nedizanîn. Di wê kêliyê de ne resim bû ji dil bipirsin. Ew bi halê xwe hiştibûn. Ew tenê şervanê vî dilê fermandar bûn. Ew tenê nobedarên stêrkên xwe bûn, nebe bêwext bişemite û ew hêj li wir! Milê wan di bin barê berpirsyartiya dîrokî de dikir serê wan biçelmîne lê her carê nefesek kûr dikşandin cergê xwe û serbilind li hember Rojê radibûne silavê.

Beriya bi rê bikevin, çûbûn hemamê, rêdînên xwe kur kiribûn, cilên herî paqij li xwe kiribûn. Wê sibê diçûn bibin evîndarekî ji hezaran evîndarên welatê xwe. Dema xwe li pêş eynikê dixemilandin, bûkên axê bi xêliyên sor li piştê ve ji xwe re li bedewiya wan temaşe dikirin. Her ev gotina Rêberê wan di guhê wan de deng vedida; "Tişta bi wan pêk hat, belkî jî bi wan eşqa welatê ji destçûyî û nasnameya civakî ya wendabûyî ji nû ve bi awayekî azad hat bidestxistin. Ji xwe ev jî eşqeke gelekî hêja, mezin û heqîqî bû.

Eşqeke welê bû ku xayîn û durûyên wê gelek bûn û bi vî awayî min jî bîranîna Mem û Zînê hem zindî kir û hem jî pêk anî."

Nûr ji rûyê wan dibariya. Pak û temîz diçûne tevafa Zîlanê. Dizanîbûn Zîlan her kesî nake mêhvanê dergahê xwe, ji wê bû, tayek sar bi canê wan ketibû û xwêdan ji eniya wan weke kaniyê dihate xarê. Gelo wê xwedawenda pîroz me efû bike, piştî dîrokek ewçend rezîl û xwînxwar!

Diçûne mêhvandariya Zîlanê piştî ewqas salên dirêj, pişta mêrê desthilat li erdê didan. Di dibistana Apoyî de gelekî li gel vê rastiyê gureş kiribûn û îro êdî roj dihêjmartin ji bo pişta mêrê bihêz û hîlebaz li erdê bidin. Kenê li ser lêvên xwe qet kêliyekî kêm nedikirin û ji bîr nedikirin ku car û bar vegerin û li hev mêze bikin û stêrka di çavên xwe de veşartî nemir bikin, bila di vî welatî de êdî zarok şahidê şemitîna ewqas stêrkan nebin. êdî pehnahiya ezmanê me jî tije be ji stêrkên kêfxweş. Nemir dikirin ji bo ti stêrk bêwext pişta xwe nede koma hevalên xwe û neçe. Ji bo êdî dayik ji tirsa li ezmanan nemêzînin û dilê wan neqete.

Qet ji bîr nedikirin her kêliyê destê xwe bidin hev û coş û heyecana

xwe bikin pirek di navbera herdû canan de. Di wê demê de te qet dil nedida li wan mêze bikî. Leza wan ji ber wê bû ku beriya dem derbas bibe û xelkê bajêr serê sibê zû di kolanan de bin, çalakiya xwe bikin. Ji ber ku nedixwestin tenê tiliya mirovekî sivîl jî xwîn bibe.

Êrîş çû li pişt dîreksiyonê rûnişt û Andok jî dema amadekarî hemû dawî bû, gelekî bi dil asûdeyî hat û li kêleka Êrîş rûnişt. Beriya ku rêbikevin, carekî li hev mêze kirin ka bizanin tiştek ji bîr kirine yan na? Piştî vê yekê, Êrîş starta gaza maşînê da û maşîn di cihê xwe de rakir. Bi rêketin, ber bi navçeya Qeyserî, pinarbaşiyê ve çûn. Êrîş wer bilez diçû, te digot qeyê wê niha maşîna wan bask derbixîne û bifirire. Di wê lezê de hemû dîroka helandina Kurdan dipelçiqandin û bi ser re derbas dibûn.

Piştî demekî tabelaya mezin a ku li ser nivîsî bû; “Pınarbaşı’na hoş geldiniz!” li pêşiya wan derket. bi dîtina navê Pinarbaşiyê, herdûyan li hev mêze kirin û keniyan. Di milekî de jî diçûn li heman cihê ku Cemal Gürsel gotibû; “yê ku ji were dibêjin Kurd, tûyê rûyê wî bikin!” û ev gotin hema li vir gotibû rojekî. Ew jî diçûn tûyî rûyê kesên weke Cemal Gürsel bikin û dawî li vê şerma dîrokê bînin. Êrîş û Andok ew zarok bûn ku qet ev gotin ji bîr nekiribûn û gelekî xwe bi şans didîtin ku gotina dilê gelê xwe di dawiya dawî de ji wan re digotin. Li nav çavê wan didan. Vê gotinê birînek gelek xedar di dilê Kurdan de vekiribû û şopek kûr hiştibû. Kurdan ji mêjve zanîbûn ku xwedê miriye, hêj sedan sal berê. Dema ku hişmendiya qirkirinê ji Kurdan re wuha digot;

“Hûnê ewqasî xwe înkar bikin ku hûn bi xwe jî newêribin, xwe têxine bîra xwe. Bi qasî ku hûn newêribin bînin bîra xwe û xwe ji bîr bikin, ewqasî jî hûnê bitirsin ku xwe têxin bîra xwe. Hûnê xiyaneta xwe ji bîr kirinê di mêjiyê xwe de bikolin û hûnê bi şerma vê xiyanetê, newêrek bibin û her wusa jiyan bikin. Hûn tenê ew Kurdin ku her yek ji we weke leşekî mehkûmî jiyanê ne. Kurdên bê ruh û giyan… bi qasî ku hûn bibin çavkanî û xizmetê bikin, hene û bi vî awayî tenê bibin leşek. Wê hemû hewildanên we yên jiyanê jî ev be.”

Û diçûn tifî rûyê qirêj ê jiyana bi şerm û rezîlane bikin. Diçûn tifî hişmendiya ku ji şerma giran kêm mabû mirovahiyê bike leşek, bikin. Diçûn tifî rûyên ku bedewî û xweşikî di qirêjiya xwe de kuş-

tibûn, bikin. Diçûn di mêjiyê mirinê de biteqin û dawî li çarenûsa nivîsandî li ser eniya gelek hejar bînin. Navê wê çarenûsê mirinek li ser piyan bû. Wê binax biba ev çarenûs di wê rojê de.

Dema ku di rê de diçûn, bi carekî polêsên rê pêşiya wan girt. Hewil dan ku xwe rihet nîşan bidin û xwe serve nebin. Êrîş leza xwe kêm kir. Andok hêdîka jê re got: “bi guman li me temaşe dikin, hişyar be!” polêsan bi destê xwe îşaret da wan ku xwe bidin aliyekî cadê. Êdî firsend gelekî kêm bû, pêwîst bû tiştekî bikin. Êrîş di eynika pêş de li pişt xwe mêze kir, derveyî wan ti maşînek di cadê de xûya nedikir. Nefesek riht kişand û li Andok mêze kir. Andok destê xwe biribû tebanceya di bin kotê xwe de. Êrîş fam kir ku divê çi bike. Polêsan ji wan xwestin ku dakevin xarê. Herdûyan bi hevre tebanceya xwe derxistin û li herdû polêsan reşandin. Çend polêsên ku di kulûbeyek kêleka rê de rûniştibûn, bi carekî bi dengê guleyan bi xwe hesiyan û bi lez firiyan derve. Heta ew ji kulûbê derketin, Êrîş pêlî gazê kir û bi lez ji wir dûr ketin…

Polêsan nekarîn plakaya maşîna wan jî bibînin. sê polês bi lez li maşînekî siwar bûn û di nava tirs û panîkê de li pey wan ketin. Lê ew gelekî ji wir dûr ketibûn…

Cenazeyên wan li erdê mabû, ji panîka zêdê ji bîr kiribûn ku bi ser wan cenazeyan de biçin. Kê êdî pêşiya Êrîş û Andok bigirta? Ji ber ku êdî deşîfre bibûn, pêwîst bû bi lez xwe bigihandan cihê çalakiyê. Ya rast gelek hedef di serê wan de hebû. Lê ji bo wan ya girîng ew bû ku li Pinarbaşiyê bikin. Êrîş rêya çend sietan 45 deqeyan de ajot. Ew meseleya kuştina herdû polêsan ew hesastir kiribû. Piştî ew xeter derbas kiribûn, dilê wan rihet bibû.

Êdî dengê dilê xwe nedibihîstin. Hema bê rawestan û bê ku tiştek cuda li pêşiya wan derbikeve, xwe bi ser hev de anîn û rêya xwe berdewam kirin. Êdî dikarîbûn baştir li ser hedefa xwe bifikirin û dizanîbûn li hember rewşek awarte çawa tedbîran bistînin. Herdem dixistin bîra hev ku pêwîste aram û rihet bin. Êrîş ji bo Andok û Andok jî ji bo Êrîş dilaramiyek mezin bû. Êdî hisê wan ewqasî xurt bibû ku her tehlûke dikete dilê wan û ji rêyên cuda digeriyan. Di wê rewşê de mirov şaş dima ku qet ken û henek kêm nedikirin.

Moral, heyecan, tirs, diltengî, kêfxweşî, ken û girî di wê kêliyê de li ser dil, ruh û giyanê wan giranî dikir. Mirovek çawa dikare ewçend

hestan bi hevre jiyan bike? Ew dil çiqas mezine ku dikare van hemû hestan di xwe de bihewîne. Û ya herî balkêş du dil bêdengin lê ew awirên bi wate, çavên bi şewq û eniya ku ji xwedanê dibiriqe di bin tîrêjên tava serê sibê de, behsa gelek tiştan dike.

Êdî deqeya sieta wan nêzî 9'an dibe. Andok çeka xwe amade kiriye û daniye ser çoka xwe. Her carê dema tiştek bihata bîra wî ji Êrîş re dibêje, ji bo ku ti şaştiyekî nekin. Andok bi herdû destan çeka xwe di himbêza xwe de givaştibû û ji Êrîş re dibêje;

•Haydê Êrîş! Niha herkes li benda me ye, Serokatî li benda meye, heval di kozikan de li benda me ne. Êrîş ku bi sureta dawî diçû, cihê xwe hinekî xweş kir û got;

•Tu merax neke, emê bigihêjinê, ji xwe kêm maye, her tiştên te amade ne? Di wê anê de gelek gotin di dilê wan de hebû lê qet nedizanîn çi ji hevre bibêjin. Êrîş bibû Andok û Andok jî bibû Êrîş.

Dikirin di wê kêliyê de serê xwe daynin ser çokên hev û careke din ew ruhê nazik ê di navbera xwe de bi nav bikin. Êdî hestên wan nedihate binav kirin. hemû qulingên koçber li ser çiyayê Erciyês ji rêwîtiyê sekinîbûn û li wan temaşe dikirin. Ref bi ref berê xwe zivirandibûn û ber bi Kurdistanê ve diçûn, da ku mizginiya dîlana mezin ji welatê wan re bibêjin. Da ku ji rêhevalên wan ê di kozikan de mizginiya buhara azadiyê bibin.

Hemû gerdûn li hember qehremantiya wan bi hurmet sekinîbû. Ji cesaret û wêrekiya wan berfînan singa erdê diqelişandin û silav didane rojê. Zarokên ku nû ji malzaroka diya xwe derdiketin, êdî bi wêrekî qîr dikirin û silav didane jiyanê û evîndaran bi wêrekî li nav çavên hev temşe dikirin. Rojê lihêfa şevê dida aliyekî û bê xem serê xwe radikir. Serê tifingên gêrîllayan bi wêrekî ji sengeran derdiket û xofa dijmin gulebaran dikir.

Ew dem bû ku tûka nezanan di qirika wan de hişk bibû. Çi berbangek bû, çi dîlan û semayek bû li welatê me. Armanca wan serkeftin bû û bes! Lê çavê wan ji dil re ev gotin bilêv kiribû; “çi dibe bila bibe, ger em şehîd bikevin, emê bi hevre şehîd bikevin, ger em sax bin jî emê bi hevre sax bin!” ketin kolana ku diçû Muduriyeta polêsan, ango cihê çalakiya wan.

Du nobedar li ber deriyê hewşê sekinîbûn, Andok bi lez serê xwe ji maşînê derxist û bi keleşa xwe guleya destpêkê li wan nobedaran

da, Êrîş jî li pey re, hem şofêrtî dikir û hem jî gule direşand. Armanca wan ew bû ku beriya teqîn çêbibe, bi dengê çekan kesên sivîl ji wir dûr bikevin ji bo ku gel ti zirarekî nebînin. Ev ji bo wan rêgeza herî bingehîn bû. Û diviyabû di wê kêliyê de karê xwe bi serkeftî biqedînin ji ber ku dijmin bi wan hesiya bû, li pey wan bû ji bo ku bi dest bigirin yan jî wan tine bikin.

Wê neketana dest, ev ji bo wan mirin bû û beriya ku darbeyekî li dijmin nedin, mirina bi erzanî nedipejirandin. Di van mijaran de ewqas zelal û eşkere bûn ku di kêliyên herî teng û zor de jî êdî bibû refleksek xwezayî ku di wan de xwe dida der. Armanc zelal bû bi qasî hemû zelaliyên gerdûnê.

Kesên derdor hema belav bûn, serê sibê bû û xelk zêde di kolanan de nebûn, ji xwe wan jî ev yek dizanîbûn û bi zanebûn ev dem hilbijartibûn. Dema nobedar ketin xarê, gelek bi hêsanî karîn bi maşînê ji derî ve bikevin hewşê.

Dengê qirçiniya deriyê hesin ku Êrîş maşîn lêdabû, guhê mirovan ker dikir. Hêj polêsên di hewşê de di şokê de bûn û nedizanîn çi bikin. Ya rast gelekî rihet bûn. ji ber ku fêr bibûn herdem li Kurdistanê şer hebe, ji xwe welatê wan qaşo di nav aramiyê de ye. Û pişta xwe bi kelehên bilind û deriyên hesin gerim kiribûn. Ma kê dikarî deriyê heybeta Padişahên Osmaniyan ji derezingê ve rake! Di van xeyalan de lingê xwe danîbûn ser hev û li ser textên bê ling û paye, şeraba xwîna Kurdan vedixwarin. Heqdestiya xwe jî ji wê werdigirtin û weke kûçikan li ber deriyê qaşo demokrasiya Ewrûpayê parsegtî dikirin û zikê xwe dikirin meşk. Çawa qet rojekî di hişê Dehakê zilimkar de derbas nedibû ku kesek bê û şûrê xwe dayne ser stûyê wî, wan jî bawer nedirkin ku rojekî hinek bên û bi çek û bombeyên xwe tifî rûyê wan bikin!

Û dîsa gotina Ehmedê Xanî dikete bîra mirovan;

Kesên ku mîna Beko xirabkar
Kirinên wan tev neqenc in yekcar

Yên ku mîna Tacedîn sozdar in
Şervan, dilawer û cegerdar in

Ji bo wan her tişt gul u gulistan bû, ji xwe Kurdistan kiribûn goristan. Dibêjin; “ev dinya ne bi zorê, bi dorê ye!” û dora wan hatibû ew gulistan biba goristan. Bi sedan polês di hewşê de bûn, hêj nedizanîn çi li wan qewimiye. Ji bo wê jî gelekî bi derengî bersiv dan.

Hêj ew bi ser xwe de nehatibûn ku Andok herî dawî bi destê Êrîş girt û jê re got; “ez diçim!” ev gotina Andok dilê Êrîş êşand, parçeyek ji wî diçe. Nedixwest destê wî berde, di germahiya destê wan de evînek bê sînor hebû. Yekem car ewqas nêzî hev dibûn û ewqas ji hev dûr diketin, qet dilê wan fêrî ewçend dûriyê nebibû. Ji bo wê jî çawa Andok ji maşînê xwe avêt, Êrîş jî bi dengek bilind got; “temam, ezê jî li kêleka te ve bêm.” Andok dengê dirûşmeya “BİJÎ SEROK APO” li pişt xwe dibihîst, Êrîş bi dirûşmeyan ew bi rê dikir.

Di wê kêliyê de hemû heval, Serokatî û Gel bi wî re bûn. hemiyan ew bi çepik û tilîliyan bi rêdikirin. Ew ji maşînê daketibû, bi çeka xwe şer dikir û pêş de diçû. Êrîş jî hem şofêrtî dikir û hem jî çeka xwe ji pencerê ve derxistibû û şer dikir. Polêsên li wir nû fam dikirin ku çi bûye, ji bo wê wan jî senger girtibûn.

Êrîş û Andok bi wan re sînge sîng şer dikirin. Weke ku ji wan re bibêjin, dê werin ev jî meydan. Wêrekiya we tenê ewe ku hûn tên û ji dûr ve bombeyan di ser me de dibarînin. Ew roj hate bîra wan ku dijmin bi caran bi balafirên xwe dihatin û bi rojan bombe bi ser wan de dibarandin. Gelek hevalên wan di van êrîşên bombeyî de jiyana xwe ji dest dabûn, li ser canên parçebûyî yên bi dehan hevalên xwe soza tolhildanê dabûn. Bi caran ew bi xwe jî bibûn şahidê vê bê edaletiyê. Di zagonên şer de ev bêedaletiyeke mezine û qet ne exlaqiye. Ger hûn wêrekin, xwe veneşêrin werin em li hember hev şer bikin. Werin em di vê karzarê de hesab ji hev bipirsin. Ka kê zilm kê kir, ka kê xwîna kê xwar. Ka kê tifî rûyê kê dike?! Ka kê dagirkere, kê mêtîngertiyê dike?

Êdî Andok jî dirûşme davêtin. Çend gule li canê wî ketibûn lê hêjî pêş de diçû. Êşa guleyên di canê xwe de his nedikir. Rustemê Zal bû, gihayê nemirtiyê danîbû ser çavên xwe, heta çavên wî tenê bima, wê şer bikira û neketa xarê. Û kesî sirra vê nemirtiyê nedizanî. Ji pêsîra Zîlanê şîrê nemirtiyê mêtibû, beriya bigihêje vê rendewiyê. Êrîş dît ku Andok kete xarê. Li ser hemû hestên tolhildanê, tola Andok jî zêde kir û bi lez maşîna xwe bire pêş nav komên polêsan

de. Her çavên wî li Andok bû ku ketibû xarê, lê çavên wî vekirîbû, bi heyranî li Êrîş mêze dikir. Her carê destê xwe radikir ji bo ku dîsa alîkariya Êrîş bike lê êdî destê wî nedigirt ku çeka xwe rake. Taqet tê de nemabû, ji ber ku birînên wî xedar bûn û gelek xwîn ji canê wî çûbû. Ruhê wî li gel Êrîş û yê Êrîş li gel wî bû. heta ruh di Êrîş de heba, Andok çavên xwe nedigirt û asûde ranediza. Ji ber ku soz dabûn, bi hevre bijîn!

Êrîş hêj dirûşme davêtin, heta ku maşîna wî rê bida diçû. Andok hêjî dengê dirûşmeya Êrîş dibihîst û birînên xwe ji bîr kiribû. Cara dawî dîsa zivirî û li Andok mêze kir, destê xwe danî ser bombeyê û teqand…

Awirên wan di hev de asê mabû. Maşîna Êrîş parçe parçe bû û dikir bifire û Êrîş jî bi xwe re heta erşê xwedê bibe.

Û Andok jî bû şahidê wê kêliyê. Kêliya ku pepûleya li ser dilê Êrîş ber bi agir ve çû û pêre direqisî. Ruhê Êrîş hatibû û di wî de kon vedabû. Ev gotina Ehmedê Xanî kete bîra wan, ji bo cara dawî;

Eger bilbil î gul amade ye
Nîlûferî rojê çav li te ye

Ger perwaneyî mûm bo te sotî
Eger nexweşî, Mesîh va hatî
Û;
Eger ku laşê me tên veşartin
Dê giyanê me hevûdû bibînin

Bûne ruhek û rabûn, bûne stêrkek û çûne ezmanan. Stêrkek nemir, bûne du dildar û çûne dîdara Zîlanê…

* * *

Cihê xwe li ser banê malê çêkirine. Dema xewê ye û herkes razaye lê ev herdû cêwî xew nakin. Ji xwe re li ser doşekê dilîzin. Dayika wan dibêje; “Êrîş, Andok, werin xew bikin, derenge kurên min!” hilme hilma wan û bi hevre dibêjin; “na em ji xwe re dixwazin bilîzin dayê!” ji nişkave çavê wan bi ezmana dikeve û bi hevre qîr dikin û nîşanî dayika xwe didin.

•Dayê dayê, mêzeke ew herdû stêrk têne gel hev, nêzî hev dibin. Dayika wan axînek kûr ji dil kişand û got;

•Kurên min! Îşev şeva 25'ê Gulanê ye. Salvegera şehadeta heval Êrîş û Andok. Her sal di vê wextê de stêrak wan tê û dibe yek. Dayik zarokên xwe dixe bin lihêfê û wuha dilorîne;

Wey lawiko min go,
Îşev şeve şev leyllane
Wey delalo mingo,
Îşev şeve şev gulane
Wey lawiko min go,
stêrk civiyan li ezmane
wey delalo min go,
Germe Germa van şerane
Wey lawiko min go,
Êrîş, Andok li me mêhvane…

**Dawî**
**Gelawêj Ewrîn**
**01.03.2014**

# ALBUM



**Ramazan Yılmaz (Andok Farqin)**




**Cengiz Özek (Eriş Avent Didar)**























